



K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê
Enstituya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

**TÎPOLOJİYA LEHENGÊ KURD LI ÇARÇOVEYA
NÊRÎNÊN JOSEPH CAMPBELL -Bi Mînakên
Rustemê Zal û Memê Alan-**

Sami ÇELİKTAŞ

14711026

Şêwirmend

Doç. Alk. Shahab VALÎ

Mêrdîn – 2018

K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê
Enstituya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

**TÎPOLOJIYA LEHENGÊ KURD LI ÇARÇOVEYA
NÊRÎNÊN JOSEPH CAMPBELL -Bi Mînakên
Rustemê Zal û Memê Alan-**

Sami ÇELİKTAŞ

14711026

Şêwirmend

Doç. Alk. Shahab VALÎ

Mêrdîn – 2018

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE'DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “TİPOLOJİYA LEHENGÊ KURD LI ÇARÇOVEYA NÊRÎNÊN JOSEPH CAMPBELL -Bi Mînakên Rustemê Zal Û Memê Alan-” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin/projemin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin/Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim/Projemin sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- Tezimin/Projemin ... yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

12/02/2018

Sami ÇELİKTAŞ

KABUL VE ONAY

Sami Çelikleş tarafından hazırlanan TİPOLOJİYA LEHENGÊ KURD LI ÇARÇOVEYA NÊRÎNÊN JOSEPH CAMPBELL -Bi Mînakên Rustemê Zal Ê Memê Alan-” adındaki çalıřma, tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Anabilim Dalı, Bilim Dalında **YÜKSEK LİSANS TEZİ**/ olarak oybirlięi / oyçokluęu ile kabul edilmiřtir.

[İ m z a]

[Unvanı, Adı ve Soyadı] (Bařkan)

PÊŞGOTIN Û SPASÎ

Textê leheng ji serdemên qedîm ta roja îro tim li navenda vegotinê bûye. Nirxên ku mirovahiyê timî heja kirine bi hebûna lehengan teşe girtine. Lewma jî leheng wek têgeh bi dorfirehiya wateya xwe bûye babeta gelek teoriyên nûjen û bala ramangeran kişandiya. Di vê xebatê de me hewl da ku ji bergeha fikrên nûjen ên dorhêla têgeha leheng diyar kirine, em li taybetmendiyan lehengên nav destanên kurdî binêrin û bi rêya sepandina teoriyên nûjen ên li mînakên xwemalî hin encamên objektîf derxînin holê.

Bi boneya vê xebata tezê fersendek ji min re çêbû ku ez careke din destanên kurdî bixwînim û pêrgî lehengê wan bêm, bes vê carê bi çavekî dahûrînî, bi bergeheke berawirdî û bê guman li çarçoveya teoriyên mît û folklorê yên cihêreng. Di dawiya vê serpêhatiya xwe ya lêkolîna zanistî de ez gihîştim hin encaman ku hêvîdar im di beşa xwe de bikarin valahiyekê tijî bikin.

Seranserê vê xebatê alîkariya gelek kesan gihîşte min. Di serî de spasiya şêwirmendê xwe Doç. Alk. Shahab Vali dikim. Me bi hev re xebatek bi dilxweşî pêk anî, rexne û nêrînên wî pir sûdewer bûn, bi taybetî jî alîkariya cenabê wî ya di peydekirina çavkaniyan de gelek biqîmet bû.

Her wiha keda mamostê hêja Nezîr Ocek ku xebatên xwe yên neçapkirî da min û şîroveyan xwe bi min re parve kirin, û tevkariya dostên min ên hêja, Lal Laleş, M. Ronî Yavuzer, Kadîr Sonmez ku ji min re berhemên çapa wan qediyayî dabîn kirin tev hêjayî bibîranînê ne.

Sami Çeliktaş

Mêrdîn 12/02/2018

KURTE

TÎPOLOJIYA LEHENGÊ KURD LI ÇARÇOVEYA NÊRÎNÊN JOSEPH CAMPBELL -Bi Mînakên Rustemê Zal Û Memê Alan-

SAMI ÇELIKTAŞ

Di vê xebatê de, li ser bingeha nêrînên Joseph Campbell ên derbarê leheng du lehengên nav vegotinên kurdî –Rustemê Zal û Memê Alan– hatine analîzkirin. Teoriya Campbell a bi navê *monomît* û formulasyona wî ya bi navê *rêwîtiya leheng* li gel hevdeh qonaxên wê hatine ravekirin û bi her du mînakên navborî ve hatine sepandin. Ji bilî teoriya monomîtê, ku bingeha vê xebatê ye, teoriya Otto Rank a ku wek *mîta jidayîkbûna leheng* tê zanîn, û teoriya *lehengê kevneşopiyê* ya Lord Raglan jî bi gelemperî hatine danasîn. Her wiha leheng wek *arketîp* hatiye nirxandin û arketîpên sereke ên têkildarî serpêhatiya leheng hatine şîrovekirin. Babeta ku leheng bi têkiliya li gel têgeha arketîp dinirxîne bi referansên C. G. Jung û Joseph Campbell di vê xebatê de cih digire. Ev xebat ji berawirdkirina nêzîkbûnên teorîk bêtir, pêşekiyê dide pênasekirina wan û bi rêya avakirina peywendeke navbera teorî û mînakên xwemalî tîpolojiya lehengê kurd rayêdixîne pêş çavan.

Peyvên Sereke: Arketîp, Lehengê Kevneşopiyê, Rêwîtiya Leheng, Mîta Jidayîkbûna Leheng, Monomît,

ÖZET

JOSEPH CAMPBELL'İN FİKİRLERİ ÇERÇEVESİNDE KÜRT KAHRAMANI TİPOLOJİSİ -Rustemê Zal Ve Memê Alan Örnekleriyle-

SAMİ ÇELİKTAŞ

Bu çalışmada, Joseph Campbell'in kahramana dair fikirleri esas alınarak kürt anlatılarında yer alan iki kahramanın –Rustemê Zal û Memê Alan– analizi yapılmaktadır. Campbell'in *monomî*t olarak bilinen teorisi ve *kahramanın yolculuğu* şeklinde formülize ettiği tespitleri yolculuğun başlıca onyedü duraktan oluşun izleđi ile birlikte ele alınmakta ve sözkonusu iki kahraman örneđine uygulanmaktadır. Monomit teorisinin yanısıra, Otto Rank'ın *kahraman'ın doğuş miti* ile Lord Raglan'ın *geleneđin kahramanı* teorilerinden genel olarak söz edilmektedir. Bunun birlikte, kahraman kavramı bir *arketip* olarak da irdelenmekte ve kahramanın serüveniyle ilintili başlıca arketipler ele alınmaktadır. Kahramanın arketip kavramıyla ilişkili olarak irdelendiđi bölüm C. G. Jung ve Joseph Campbell'dan alınan referanslar ile birlikte sunulmaktadır. Bu çalışma teorik yaklaşımları karşılaştırma tutumundan ziyade, önceliđi bahsi geçen fikirleri tanıtmaya vermekte ve teori ile özgün örnekler arasında ortak bir bağlam kurup kürt kahramı tipolojisini gözler önüne sermektedir.

Anahtar Kelimeler: Arketip, Geleneđin Kahramanı, Kahraman'ın Doğuş Miti, Kahramanın Yolculuđu, Monomit

ABSTRACT

TYPOLOGY OF THE KURDISH HERO WITHIN THE FRAMEWORK OF JOSEPH CAMPBELL'S IDEAS -With Samples Of Rustemê Zal And Memê Alan-

SAMI ÇELIKTAŞ

In this study, on the ground of Joseph Campbell's ideas about the hero conception, two heroes from Kurdish narration –Rustemê Zal and Memê Alan– were analysed. Campbell's hero theory which is known as *monomyth*, and his notable formulation called *hero's journey*, together with its seventeen stages, were revealed and applied to the samples of both heroes. Along with Campbell's monomyth theory, Otto Rank's hero theory called *the myth of the birth of hero*, and Lord Raglan's *the hero of tradition* were introduced in general. Additionally, the conception of hero was discussed as an *archetype*, and basic archetypes which are in relation with the hero conception were addressed. In the section which the hero conception was dealt together with archetypes, the ideas of C. G. Jung and Joseph Campbell were taken as main references. The study gave a priority to the description of theoretical approaches mentioned above, rather than comparing them, and through building a correlation between the theory and local examples it depicted the typology of kurdish hero.

Key Terms: Archetype, Hero of Tradition, Hero's Journey, Monomyth, The Myth Of The Birth Of Hero

NAVEROK

PÊŞGOTIN Û SPASÎ	I
KURTE	II
ÖZET	III
ABSTRACT	IV
NAVEROK	V
KURTEBÊJE	VIII
DESTPÊK	1
BEŞA YEKEM	4
MIJAR, ARMANC Û RÊBAZ	4
1.1. Mijara Lêkolînê.....	4
1.2. Armanc û Girîngî.....	5
1.3. Rêbaza Lêkolînê.....	6
1.4. Kêşeyên Lêkolînê.....	8
BEŞA DUYEM	11
LEHENG	11
2.1. Pênaseya Leheng.....	11
2.2. Leheng Wek Arketîp (Kevnemînak).....	12
2.3. Teoriyên Li Ser Têgeha Leheng.....	18
2.4. Joseph Campbell û Teoriya Monomîtê.....	25
2.5. Rêwîtiya Leheng Û Hevdeh Qonaxên Wê.....	28

BEŞA SÊYEM	37
LEHENGÊ KURD	37
3.1. Rustemê Zal	38
3.1.1. Di Çarçoveya Qonaxên Joseph Campbell De Serpêhatiya Rustemê Zal	46
3.1.2. Karakterên Arketîp Di Rustemê Zal De:	58
3.2. Memê Alan	60
3.2.1. Di Çarçoveya Qonaxên Joseph Campbell De Serpêhatiya Memê Alan	67
3.2.2. Karakterên Arketîp Di Memê Alan De	76
ENCAM	79
ÇAVKANÎ	83

KURTEBÊJE

<i>bnr.</i>	Binêre
<i>çev.</i>	Çeviren
<i>ghr.</i>	Guharto
<i>h.</i>	Heman
<i>h.b.</i>	Heman berhem
<i>h.g.</i>	Heman gotar
<i>h.r.</i>	Heman rûpel
<i>hwd.</i>	Her wekî din
<i>r.</i>	Rûpel
<i>wer.</i>	Werger

DESTPÊK

Di vê xebata tezê de em ê teoriya Joseph Campbell a bi navê monomît û formulasyona wê ya ku ji hevdeh qonaxên rêwîtiya leheng pêk tê bidin nasîn, û bi wan du mînakên lehengên ji nav vegotina kurdî hatine bijartin –Rustemê Zal û Memê Alan– analîz bikin. Em ê têgeha leheng pênase bikin, têkiliya leheng û têgeha arketîp bidin xuyakirin û arketîpên sereke yê têkildarî serpêhatiya leheng şîrove bikin, û bi awayekî gelemperî jî behsa teoriyên heyî yê derbarê leheng bidin nasîn. Armanca vê tezê ew e ku bi sepandina teoriya Campbell a bi du nimûneyên xwemalî tîpolojîya lehengê kurd û serpêhatiya wî diyar bike.

Di beşa yekem de em ê rêbaza ku di vê xebatê de hatiye şopandin diyar bikin. Ev beş qala mijara lêkolînê dike, sînor û bergeha xebatê ya teorîk dide kifşê, armanc û girîngiya vê xebatê ya li nav xebatên têkildarî çand û zimanê kurdî tîne ziman, rêbaza lêkolînê diyar dike û kêşeyên vê lêkolînê rayêdixîne pêş çavan.

Beşa duyem a vê tezê li ser têgeha leheng, taybetmendiya leheng a wek arketîp, û bîrokeyên (teorî) leheng disekine û şîroveyên wan ên derbarê leheng dide xuyakirin. Teoriya Campbell, *monomît*, û qonaxên rêwîtiya leheng bi awayekî bi hûrgilî tîne danasîn. Ji hêla din ve jî teoriya Otto Rank a bi navê *teoriya jidayîkbûna leheng* û teoriya Lord Raglan a bi navê *lehengê kevneşopîyê* bi awayekî giştî hatine pêşkêşkirin da ku mijar bi berfirehiya lîteratura heyî bê ragihandin.

Destpêkê em ê bala xwe bidin ser pênaseyên têgeha leheng. Ji çavkaniyên wek ferheng, ansîklopediyên mîtolojî û sembolan pênaseyên hatine kirin diyar bikin. Di nav wan terîfan de em ê bi awayekî taybet li ser pênaseya Campbell bisekinin. Di pey re em ê li arketîpa leheng hûr bin. Bi referansên kesên wek Jung, Campbell û Eliade em ê arketîpa leheng şîrove bikin û taybetmendiyan wê destnîşan bikin. Ji bilî hûrgiliyên arketîpa leheng, arketîpên sereke yê ku têkildarî serboriya leheng in dê bîne ravekirin.

Di teoriya Campbell de çawa ku leheng seranserê serpêhatiya xwe bi tena serê xwe nebe, bi heman awayî jî terîfa leheng jî bi serê xwe nîne, an ku ev terîf bi têgeha arketîp hatiye destegkirin û lewma jî ji hêla wateyê ve zengîntir bûye. Campbell gava ku qonaxên serpêhatiya leheng dest nîşan dike, di her yek qonaxê de qala arketîpek şexsî jî dike û bi vê yekê jî hem pêvajoya serpêhatiyê hem jî dirûvê leheng ji me re hîn zelatir dike.

Di pey re em ê qala teoriya monomît a Joseph Campbell bikin û bi vê peywendê jî cih bidin rêwîtiya leheng a ku wî tê de serpêhatiya lehengê nav mîtê bi awayekî bazneyî formulîze kiriye. Derbarê têgeha leheng de yek ji nêrînên herî zêde balê dikişîne ser xwe *rêwîtiya leheng* a Joseph Campbell e. Ev şîroveya leheng beşa sereke ya teoriya wî ya bi navê *monomîtê* pêk tîne. Di çarçoveya teoriya xwe ya bi navê monomît de Campbell analîzeke berfireh a lehengên ji hin mîtên cîhanê dike û ji wan analîzan jî serpêhatiya lehengan a hevpar bi navê *rêwîtiya leheng* destnîşan dike.

Wek rêgez, li şûna berawirdkirina pênase û ravekirinên cur bi cur ên têkildarî têgeha leheng, em ê rasterast pênase û referansên wan pêşkêş bikin. An ku xebata me di beşa duyem de pêşekiyê bêtir dide danasînê, ne ku giraniya xwe bide berawirdkirina manendî û cîyawaziyên navbera teoriyên leheng. Bi heman awayî têgeha arketîp û arketîpên sereke yên têkildarî konseptên leheng jî dê bîn ravekirin. Li beşa ku danasîna teoriya Campbell tê kirin em ê behsê bînin ser nêrînên derheqê monomîtê yên cuda jî.

Di beşa sêyem de em ê li ser du lehengên nav vegotinên kurdî –Rustemê Zal û Memê Alan– bisekinin û li gor teoriya Campbell dahûrîna wan bikin. Li gor hevdeh qonaxên rêwîtiya leheng serboriyên wan her du lehengan ê bîn destnîşankirin û bi jêgirtinên ji deqên wan berheman bîn şîrovekirin. Her wiha em ê ji bergeha arketîpên sereke li her du lehengan û kesên bi serpêhatiya wan re eleqedar binêrin, û tevger û motîvasyona wan li gor naveroka wan arketîpan dahûrînin.

Bijartina me ya wan her du lehengan ji ber çend sedeman çêbû. Berî her tiştî Rustemê Zal û Memê Alan di nav çanda kurdî de xwedî temsîleke berbelav a dîrokî û erdnîgarî ne, an ku ji heyamên dûr ve û li erdnîgariyeke berfireh binas in. Sedemeke din

jî ji ber cihêrengiya temsîldariya wan e. Her du jî bi taybetmendiyan xwe yê pirhêl û bi serpêhatiyên xwe yê tijî hûrgilî ji bo nirxandinên cîyawaz derfetên guncav dikarin bidin lêkolîneran. Têkalaviya kesayeta her du lehengan û ya çîroka wan bi têra xwe tekûz e ku bi teoriyekê ve bi şikleke yekgirtî bê sepandin.

BEŞA YEKEM

MIJAR, ARMANC Û RÊBAZ

1.1. Mijara Lêkolînê

Mijara vê xebata tezê lehengê mîtê û tîpolojiya lehengê nav vegotinên kurdî ye. Bingeha vê xebatê ya teorîk li ser teoriya leheng a Joseph Campbell a bi navê monomît û formulasyona wî ya rêwîtiya leheng ava dibe. Ji bo diyarkirina tîpolojiya lehengê kurd a bi vê çarçoveyê, teoriya navborî bi mînakên du lehengan –Rustemê Zal û Memê Alan– hatiye sepandin. Ev her du mînak di çarçoveya fikrên Campbell ên derbarê têgeha leheng de, bi referansên arketîpan hatine şîrovekirin.

Di teza me de teoriyên sereke yê leheng bi awayekî gelemper tên qalkirin. Ji bilî *monomîta* J. Campbell, her wiha qala teoriya *mîta jidayîkbûna leheng* a Otto Rank û teoriya *lehengê kevneşopiyê* ya Lord Raglan tê kirin. Têgeha arketîp û tîkiliya wê ya bi têgeha leheng jî wek beşeke mijarê di vê xebatê de cih digire. Nêrînên kesên wek C. G. Jung, Joseph Campbell û Mircea Eliade yê derbarê arketîpa leheng hatine diyarkirin.

Bi mebesta analîzkirinê du destanên kurdî –Rustemê Zal û Memê Alan– ji bo dahûrînê hatine bijartin. Lehengên sereke yê wan destanên navborî û hin karakterên girîng ên ku ji leheng(an) re dibin alîkar û rolên berbiçav werdigirin tên nirxandin û serpêhatiya wan li gor çarçoveya teorîk a tezê û bi alîkariya referansên lêkolînerên rojhilat tê dahûrandin.

Vegotinên gelêrî li gor peywend û rêbazên xweser dikarin bibin mijarên lêkolînên zanistî yê cur bi cur. Di vê xebatê de ev vegotin bi lehengên tê de, an ku bi

xasyet û erkên wan lehengan bûne mijar. Leheng bi xasyetên takekesî, fonksiyon û tevkariyên xwe yên cihê, bi erk û kartêkeriyên xwe yên di nav çîroksaziyê de hatine nirxandin, û her wekî li gor çarçoveya teorîk a tezê jî encam jê hatine dariştin.

Lêkolîna me lehengên nav destanên kurdî ji xwe re wek babet bijartiye, lewre di vê xebata tezê de mebesta me bi leheng karakterên sereke yên nav çîrokên qedîm in. Lehengên gelêrî yên ku di nav cureyên din ên edebî de derbas dibin li derveyê bergeha xebata me dimînin. Her wiha lehengên hemdem ku piranî di berhemên pevbestî yên wek roman û çîrokên nûjen de cih digirin jî nehatine daxilkirin.

1.2. Armanç û Girîngî

Armanca vê tezê ya sereke ew e ku, li çarçoveya nêrînên Joseph Campbell ên derbarê mît û folklorê, tîpolojiya lehengê nav vegotinên kurdî –bi sepandina li ser Rustemê Zal û Memê Alan– diyar bike; û bi teorî û formulasyonên têkildarî têgeha leheng, bi taybetî jî têgeha arketîp, û bi rêya dahûrîna du lehengên kurdî encamên zanistî bi dest bixe. Ji bo pêkanîna vê armançê fikr û ramanên derbarê têgeha leheng û arketîpên têkildar tên danasîn û pê re jî li mînakên xwemalî tên sepandin.

Ev xebat armanç dike ku ji bilî danasîna nêrînên mîtolog û antropologên rojavayî yên derbarê têgaha leheng, her wiha cih bide nêrînên lêkolînerên ji cîhana rojhilat ku bêtir nêzikî çand û paşxaneyê çîrokên mîfîk in. Bi vê yekê jî cihêrengiya fikr û ramanan hatiye armanckirin da ku ev tez bi tenê nebe berawirdkirina teoriyên rojavayî û mînakên rojhilatî, berovajî vê, me hewl da ku di sepandina teoriyên rojava ya bi mînakên rojhilat de fikrên lêkolînerên rojhilat wek referansên navîncî û hêsankar rol wergirin.

Her cure vegotin, bi taybetî jî vegotinên gelêrî ku bi cureyên cuda derdikevin pêş me, ji bo pênasedayînen çand, ziman û nasnameya gelan derfetên giranbuha pêşkêşî lêkolîneran dikin. Di nav wan vegotinan de jî leheng bi girîngiya xwe ya nav çîroksaziyê, bi dewlemendiya potansiyela xwe ya temsîldariyê û wek sembolen xurt ên dîrokî û civakî xwedî ciheke navendî ne. Bi vê boneyê ev xebat bi lêkolînen li ser

lehengên gel, an ku bi kirpandinên li ser leheng û serpêhatiya wî, hewl dide ku derfetên pênamedayîna nasnameyî û taybetmendiyên gelerî fireh bike.

Xebatên têkildarî mît û leheng yên bi zimanê kurdî her wekî xebatên gelek qadên din ên zanistî hîn jî pir kêr in. Di gel ku li wan salên dawî li ser mijarên folklorê û bi taybetî jî derbarê destanan xebatên berbiçav pêkhatibin jî, teoriyên derbarê lehengê mîtê, û bi taybetî jî dahûrînên mîtologan ên derbarê berhemên mîtîk û derbarê lehengên wan berhemên, zêde nehatine nirxandin. Pirtûkxaneya kurdî di qada mîtolojiyê û dîsîplînên din ên têkildar de, yekser jî ji hêla berhemên lêkolînî ve, xwedî kêmasî ye. Yek ji armancên vê tezê tevkarîyeke zanistî ye ji bo vê qada navborî.

Ji hêla din ve, ji nû ve dahûrandina hêmanên gelêrî ya bi helwest û nêzikbûna înter-dîsîplîner bê guman dê bandorê li ser nerîn û aşopên derbarê çanda kurdî bike. Li roja îro, her ku sînorên navbera qadên zanistî civakî êdî şêlû bûne, ne mimkun e ku mijareke lêkolînê di nav sînoreke teng de bigihîje encamên tekûz. Di vê xebatê de nêrîn û nêzikbûnên qadên wek mîtoloji, folklor, dîrok, derûnnasî, civaknasî û wêjeyê li ber çavan hatine girtin da ku mijar bi lêkdana lîteraturên wan qadên navborî bi awayekî berfireh bê şîrovekirin.

Li gor çavdêriyên me, berhemên vegotina gelêrî piranî di nav sînorên herêmî de, bi referansên lokal, bi zanyariyên dîrok û erdnîgariya niştecihî û dîsa bi bawerî û kodên heman gelê hatine şîrovekirin. Lê rastiyeke wek çanda gerdûnî jî heye ku hêmanên çandî yên lokal bi awayekî girêdayî ve çanda gerdûnî ne û di hemûyan de hêmanên hevpar hene. Helbet paşxaneya vê hevpariyê bi hezaran sal paş de diçe û xwedî rehên kûr e. Di vê xebatê de me hewl da ku em bi çavekî gelemper, bi hêmanên gerdûnî û bi qalibên domdar ên hevpar li çîrokên lokal binêrin û sînorê şîroveya xwe ji niştecihiyê wêdetir bikin.

1.3. Rêbaza Lêkolînê

Ev xebata tezê destpêkê cih dide fikr, nêzikbûn û têgehên sereke yên derbarê mijarê. Bi rêya lêkolîneke berfireh teoriyên heyî hatine destnîşankirin û bi awayekî

gelemper hatine danasîn. Ji ber berfirehî û cihêrengiya referansên teorîk, ji bo çêkirina fokûseke hevpar lêkdana teoriyên cihê yên derbarê heman mijarê hatiye kirin û li ser xalên hevpar hatiye sekinandin. Lêkolîna lîteraturê zêdetir ji çavkaniyên wek berhemên çapkirî û yên rasterast hatiye pêkanîn. Ragihandinên referansên teorîk bi helwestên hişmendî yên wek pênasedayîn, dahûrandin, berawirdkirin û şîrovekariyê hatine kirin.

Referansên analîzên me yên wek destan –piranî çapkirî û çendek jî yên li ber çapê û yên li nav hawirdoreke dijîtal– metn in ku berhevkarên wan taybetmendiyan wan ên devkî parastine. Şîroveyan derbarê lehengan li gor xasyetên wan ên nav metnan hatiye kirin. Berhemên ku wek referans hatine bikaranîn ji çavkaniyên ku di esase xwe de devkî bes ji hêla berhevkarên wek metn hatine çapkirin pêk tên. Ev berhem ji deverên cuda yên ku kurd tê de niştecih in hatine bijartin, an jî bi gotineke din, ji referansên têkildarî cihê bûyeran tê derxistin ku ew xwedî paşxaneyê berbiçav a erdnîgarî û dîrokî ne.

Ew her du destan hem bi lehengên xwe û hem jî bi çîroksaziyên bi hevdeh qonaxên sereke yên rêwîtiya leheng a Campbell û bi arketîpên destnîşankirî yên derbarê leheng ve hatine berawirdkirin. Di pileya yekem de agahiyên gelemper derbarê lehengên sereke hatine dayîn. Di vê asta nirxandinê de hem destan û hem jî xebatên din ên lêkolîneran hatine bikaranîn. Di pileya duyem de leheng, bi alîkariya jêgirtinên rasterast ên ji destanan, bi formulasyonên Campbell ve hatine rûberîhevkirin. Rêz û jimareyan wan formulasyonan bi awayê wan ê resen hatine parastin û sepandin.

Di vê xebatê de leheng hem bi xasyetên xwe yên nav metnê û hem jî bi referansên derveyê metnên destanê, ku ji hêla lêkolînerên cihê ve hatine destnîşankirin, tên nirxandin. Lehengên sereke yên wan her sê destanan destpêkê bi referansên derveyê hatine terîfkirin, piştî jî li gor peywenda metnê ew bi girêdayî teoriyên lehengan ve hatine analîzkirin. Di şayesandinên giştî de taybetmendiyan lehengan bêtir bi peywendeke civakî û derveyê metnê hatine derpêşkirin.

Di vê xebatê de, me xwendina xwe ya beşa duyem bi helwesta ve-derbirînê (restatement) pêk anî da ku mijarên teorîk bi armanca danasînê bîr pêşkêşkirin. Di beşa

sêyem de jî xwendina guhartoyên destanan bi helwesteke şîroveyî (interpretation) pêk hat. Di vê şêweya xwendinê de xwîner/lêkolîner li gor pêwîstî û armanca xwendina xwe çarçoveya şîroveya metnê diyar dike û metnê ji nû ve dişixulîne. Vêca me jî her du destanên kurdî û xasyetên lehengên wan li gor pêşekî û kirpandinên teoriyên me bijartî ji nû ve şixuland û zîqa xwendina xwe bi wan nêrîn û formulasyonan eyar kir. Bê guman analîzên bi vî rengî hêsantir tûşî xetereya subjektîvîzmê tên. Ji ber vê çendê lêkolîner divê şîroveyên xwe di nav sînorên metnê de pêk bîne û zoreke bê serûber nede metnê da ku encamên xwestî derxîne holê.

Encamên ku ji dahûrandina lehengên her du destanan derketine holê di beşa dawî de hatine pêşkêşkirin. Li vê beşê encamên ku ji berawirdkirina lehengên xwemalî ya bi qonaxên rêwîtiya leheng dariştine, cih digirin. Encam rasterast ji dahûrînên lehengên nav metnan hatine bidestxistin, û ew dahûrandin jî teqez bi girêdana çarçoveya fikrî ya bi teoriya navborî pêk hatiye.

1.4. Kêşeyên Lêkolînê

Şîrovekariya berhemên mîfîk bi giştî bi du awayan, wek *şîroveya gotinkî* û *şîroveya sembolîk*, dabeş dibin.¹ Ev dabeşkirin mijarê ji hêla teorîk ve çareser bike jî, di pratîkê de rewş cudatir dibe. Lewre di berhema ku tê nirxandin de ji ber navheviya gotin û sembolê veqetandinek wek *gotinkî* û *sembolîk* nabe şixuleke hêsan. Gelek caran teorî berhemekê rave dike bes di ya din de neçar dimîne, an jî ji bo beşekê bi kêr tê bes di beşên din de kartêker nabe.

Her wiha xebatên ji bo sepandina teoriyên disîplînên çandî ya bi nimûneyên berhemên çandî gelek arîşeyên pêşbînîkirî û yên nepêşbînîkirî derdixînin holê. Wek tê zanîn teorî hin binyad û motîfên dubarebar pêşkêş dikin û wan wek nîşaneyên pêwîstî û arîşeyên mirovan ên kûr dihesibînin. Di vê niqteyê de têkildarkirina binyad û motîfên kifşe bi nimûneyên namzet pir girîng dibe. Lê pirî caran –mimkun e ku di vê xebata me de jî pêk hatibin– dibe ku ji bo binyad û motîfê namzeta xelet hatibe bijartin û dawiya

¹ Dundes Alan, **The Meaning of Folklore**, Utah State University Press, Utah, 2007. r. 70

wê hevşibandînê jî encamên xelet hatibin dariştin. Di vî warî de tecribeya sepandin û berawirdkirinê roleke girîng dileyize û her wisa nimûneyên pêşîn jî pir sûdewer in. Mixabin ji bo xebatên bi zimanê kurdî û têkildarî çanda kurdî mirov nikare hîn jî qala bi têrê tecrîbe û xebatan bike.

Ji hêla din ve jî karekî dijwar e ku lêkolîner fokûseke hevpar ava bike dema ku bixwaze teorî û lîteraturên heyî tev bi hev re binirxîne. Ji ber ku her yek teorî û nêzîkbûna fikrî ji pêvajoyeke dîrokî derbas bûye, mijar li gor xwe terîf kiriye, pêşekî daye hêlekê û gihîştîye encamên xweserê xwe. Lewma di vê xebatê de li şûna ku em berawirdkirina wan teoriyên têvel bikin, me bêtir xwe bi nasandina wan a bi gelemperî bi sînor kir û me hewl da ku têkiliya wan a li gel berhemên bijartî rasterast bidin nîşandan.

Ji bo xebatên ku tê de teoriyeke giştî li mînakên xwemalî tê sepandin bijartina berhemên guncav yek ji kêşeyên herî girîng e. Teorî çiqas dorfireh, tekûz û ji bo berawirdkirinê kêrhatî be jî, dîsa jî ne gengaz e ku bikare mînaka xwemalî bi her awayî rave bike. Rast e ku xudanên teoriyan, piranî, piştî lêkolînên berfireh ên berhemên lokal digihîjin encamên gelemper. Lê ev encamên gelemper teqez wek rêzîknameya xwendina wan berhemên gelêrî nabe bînan bikaranîn. Her tim dibetîya valahî û şêlûbûnên wateyî li pêş lêkolîner e. Ji ber vê çendê, ji bo timamkirina valahiyên bi vî rengî û zelalkirina mijarê rola xebat, lêkolîn û ceribandîna lêkolînerên niştecihî pir girîng dibe.

Di vî warî de divê bê gotin ku her çiqas lêkolînên li ser lehengên destanên kurdî hebin jî, mixabin xebatên ku berawirdkirina teoriyên gelemper bi mînakên xwemalî wek rêbaz danîne pêş xwe pir kêr in û ev kêmbûn jî kêşeyeke sereke bû ji bo vê xebatê. Referansên lokal ên heyî bêtir bala xwe didin xasyetên giştî yên lehengan û wan bi leheng û çavkaniyên gelên cîran didin berhev.

Di vê xebatê de me baldariyeke taybet da vê gengaziya lihevnehatina teorî û berhemên xwemalî. Di wan her du destanan de me da dû şop û diyardeyên teoriyên navborî, me guhartoyên li ber destan bi awayekî baldar li hev xist û li gor reh û gewdeyên resen ên çîrokî me hewl da ku em têkiliyekê bi referansên teorîk daynin. Di

encamê de jî, wextê ku em baş pê qanih bûn, hîngê me peywendiyek navberê danî. Dîsa jî mimkun e ku hin encamên hatine dariştin li ber çavên xwînerên vê tezê wek hewldanên zorlêker xuya bin.

Vegotinên gelêrî bi şikl û naverokên xwe û bi nirxên nav-metnê ve kodên wisa pêşkêş dikin ku ji yên heyama lêkolîner tê de dijî cîyawaz in. Ew hêmanên metnê yên qalkirî di demeke dîrokî de teşe girtine û bi domana demê re jî bûne kodên sergirtî. Ji ber vê çendê xetereya ku lêkolîner di bergeha nêrîna xwe de bi nirxên nûjen li metafor, simbol û baweriyên nav vegotinên gelêrî binêre her tim li holê ye. Di analîzên metnên bi vî rengî de xetereya anakronîzmê her tim li pêş lêkolîner e.

Ji bo xebatên ku metnan wek bingeha lêkolînê bi kar tînin teqezbûna metnan pir girîng e. Vegotinên destanî ji ber taybetiyên xwe yên devkî her timî tûşî têkilhevbûn, xirabûn û herimandinê dibin. Di hin guhartoyan de motîfên derveyî peyde dibin û hin caran jî karakterên tê de bi awayekî diguherin. Lê di gel wan tevan jî rehê bingeîn ê çîrokê wek xwe dimîne. Vêca ji bo ku şîroveyên di cih de bînin kirin, divê bala lêkolîner timî li ser rehê bingeîn a çîrokê be û analîzên xwe li gor vî yekê bike.

Di hin guhartoyên destanên ku me dahûrandin de ji ber têkilhevbûna hêmanên derveyî destnîşankirina rehê bingeîn ê çîrokê bi şikleke zehmet pêk hat. Dîsa jî zêdebûna guhartoyan karê me bi awayekî berbiçav hêsan kir. Bi berawirdkirina guhartoyên ku hejmara wan zêde me karî ku em xalên hevpar ên di serpêhatiya lehengan de destnîşan bikin û motîfên ku lehengan dinimînin bidin xuyakirin.

BEŞA DUYEM

LEHENG

2.1. Pênaseya Leheng

Peyva *hero* (*leheng*)² di ferhenga Wêjeyê ya Oxford'ê de wek “ew kesê xwedî wesfên sermirovî û ji nifşê nîv-îlahî tê, bi taybetî jî kesê ku qehremaniyên wî/ê mijarên mîtên grekî bûn” tê pênasekirin. Ji bilî vê pênaseya ferhengî, têgeha leheng li gor dîsîplînên civakî û her wisa li gor helwest û nêzikbûnên teorîk bi şêweyên ji hev cihê hatiye şîrovekirin.

Cirlot di *ferhenga sembolan* de têgeha leheng li çarçoveya pêwîstiya mirov a ji bo nixrên lehengiyê şîrove dike. “Perestîşa (cult) leheng ne tenê ji ber mecburiyeta şer, lê di heman demê de ji ber nixrên navxweyi yê lehengiyê bûye tişteke pêwîst. Ev nixr ji demên qedîm û pê de li ba mirov timî berdest bûne û hejayî pesndayîne, kirpandinê û tomarkirinê hatine dîtin.”³

Leheng di gelek cureyên vegotinên çandî de xuya dibin, û di mîtolojî û folklorê de fîgurên herî binas û berbelav in. Ew kaosê û azweriyên hêzên tarî û xirab tîk dibin, lewma jî di gelek çîrokên mîtîk de wek rojê, an ku wek çavkaniya ronahiyê tîk şayesandin.⁴

Rosenberg lehengan wek modelên civakî pênase dike: Ji bo civakê leheng wek modelên tevgerên mirovî ne. Bi kirinên xwe yê hêja, bi tecribeyên xwe ku pê bûne

² bnr. <http://www.oxforddictionaries.com>

³ **Dictionary of Symbols**, r. 147

⁴ Charlie T. McCormick And Kim Kennedy, **Folklore, An Encyclopedia of Beliefs, Customs, Tales And Art**, ABC-CLIO, Oxford, 2011, r. 650

mirovên zana û hestiyar payeya lehengiyê bi dest xistine. Lehengan di nav rewşên aloz de hewl dane ku rêya xwe peyde bikin û lewma jî berawirdî tercîhên dijwar bûne. Ew bê qusûr nîn in. Lawaziyên wan jî bi qasî taybetiyên wan ên erênî fêrker in. Qusûrên lehengan nakokiyên mirovan ên derûnî dinimînin, ji ber vê yekê jî mirovên ji rêzê xwe di wan de dibînin.⁵

Campbell leheng wek ‘mirovê ku xwe bi xwe radestî îtaetê kiriye’ pênase dike, û dipirse: “Îtaeta bi çi? Ev pirsê esasî ye ku divê îro em li xwe bipirsîn û di vê pirsê de veşartiyê rewîşt û kirina leheng.”⁶ Pênaseya ku Campbell derbarê leheng de dide ne tenê tekûz û berfireh e, lê di heman demê de wek kurtebêja teoriya monomîtê jî dikare bê dîtîn. Ji nêrînên Campbell ên berfireh derdikeve holê ku, leheng ew mirov e ku terka jiyana xwe (cîhana xwe) ya edetî dide û ber bi cîhaneke taybet dest bi rêwîtiyeke taybet dike, rastî hebûnên efsaneyî tê û serketinên hêja bi dest dixê.⁷ Di vê cîhana taybet de ji bo bidestxistina xelateke biqîmet gelek zehmetî û tirs tînin tîkbirin û ew destketiya biqîmet bi tevahiya civakê re tê parvekirin.

Vêca diyar e ku serpêhatiya esasî ya ku Campbell terfî dike bi gavavêtina leheng a nav cîhana taybet digihîje rewşa herî aloz, diwariyên ku leheng rast lê tê piranî di vê cîhana taybet de pêk tînin. Di vê beşa terfî de xala din ku hatiye kirpandin ew e ku dawîya ceribandînan diwar xelatek bi dest dikeve û ew xelat jî ne tenê ji bo qenciya leheng e, lê li ber para tevahiya civakê jî dikeve.

2.2. Leheng Wek Arketîp (Kevnemînak)

Di ferhenga oxfordê de ji bo peyva *Archetype (Arketîp)* pênaseyek wek “mînaka herî kifşe ya tiştê an jî mirovekê” hatiye kirin.⁸ Dîsa di heman ferhengê de wateya wê ya di qada psîkanalîzmê de jî, wateya ku Jung lê bar kiriye, wiha tê pênasekirin;

⁵ Donna Rosenberg, **Dünya Mitolojisi**, İmge Kitabevi yayınları, 2003. r. 20

⁶ Joseph Campbell, **Hero With A Thousand Faces**, Princeton University Press, 1949. r. 15

⁷ **h.b.**, rr. 45-180

⁸ (bnr. archetype 1, <http://www.oxforddictionaries.com>)25.10.2017

“îmajeke hişmendî ya seretayî ku ji kalûbavan hatiye wergirtin, û wisa tê ferzkirin ku di binhişiya kolektîf de cih digire.”⁹

Arketîp ji peyva Yewnanî *archetypon* tê û wateya model, qalib an jî cureya yekem dide.¹⁰ Ev têgeh di xebatên çandî du bi du awayan tê nasîn: Di nav xebatên Ekola Fînlandî ya dîrokî-erdnîgarî de wek *forma yekem a vesazkirî ya berhema ku wek a resen tê pêjirandin*, derbas dibe. Di psîkolojiya analîtîk a Jung de jî wek *îmajên seretayî ku di binhişa hemû takekesan de bi awayekî hevpar û bi formên cur bi cur peyde dibin* cih digire.¹¹

Di nirxandina me ya derbarê leheng û serpêhatiya wê de têgeha *arketîp* li ciheke navendî disekine. Arketîp, ku di eslê xwe de ji hin qalib û kiryarên teqez pêk tên, ji bo me îmajên xurt ên sembolîk dabîn dikin ku em bi wan îmajan dikarin hin senifandinên karakterî bikin û li gor taybetmendiyên hevpar bigihîjin encamên gelemper. Lê arketîp ne tenê ji karakteran pêk tên, her wisa fikr, îmaj, tema an jî şeweyeke taybet a çîroksaziyê jî dikare bibe arketîpek. Em di mîtoloji, dîn, folklor û wêjeyê de bi zêdehî rastî arketîpên cur bi cur tên.

Arketîp dibe ku sakar xuya bikin lê di rastiyê de xwedî xasyetên aloz in. Her wiha bandora arketîpan li ser kesayeta mirov dikare pir zêde be, û dibe ku hin mirov bikevin bin bandora arketîpekê û bi vê yekê jî tevbigerin. Arketîp kolektîf in û bi şikleke hevpar malê tevahiya civakê ne. Her wekî Mircea Eliade destnîşan dike, di civakên kevneşopî de hemû kirinên jiyanê yên girîng bi awayê resen ji hêla leheng û yezdanan tên diyarkirin. Mirov bi tenê wan mînakên dubare dikin.¹² Eliade wan mînakên wek modelên arkakîk rave dike: “Em dibînin ku şervan, her kî be jî, lehengekî teqlîd dike û hindî jê tê hewl dide ku xwe nêzikî vê modela arketîp bike.”¹³

⁹ (bnr. archetype 2, <http://www.oxforddictionaries.com>).25.10.2017

¹⁰ Charlie T. McCormick And Kim Kennedy, **h.b.**, r.132

¹¹ h.

¹² Mircea Eliade, **Cosmos And History**, Harper Torchbooks, New York, 1959. r. 32

¹³ **h.b.**, r. 37

Eliade qala guherîna figurên dîrokî a ber bi lehengê mîtê dike, û pêvajoya çêbûna lehngê mîtê yê navborî jî wiha rave dike: “ Ev pêvajo bi hin standartên nimûneyî çêdibe; leheng bi formên lehengên mîtên qedîm ên beriya xwe tên avakirin, formên wek awayê jidayîkbûnê, pêkanîna sefera ber bi bihuştê an jî dogehê.”¹⁴ Lê guherîna figurê dîrokî yekcar çênabe, lewre Eliade derbasbûna heyamekê û jibîrkirina bûyerên yekser pêwîst dibîne. Piştî ku bîrdanka gelêrî piştî du sed sê sed salan lawaz dibe, li şûna kesayetên dîrokî arketîpên lehengan digire û kirinên wan jî dikevin qalibên mîtîk.¹⁵

Ekola psîkanalîst mohra xwe li şîroveya têgeha arketîpê daye. Li gor psîkanalîstan arketîp bi xwe îmajên seretayî ne û qismêke giyanê me û sîstema me ya cîvakî ne. Arketîp, îmaj, qalib û motîfên gerdûnî û dubarekirî ne ku tecribeyên binas ên mirov temsîl dikin. Her wekî gelek xalên din, di mijara arketîpê de jî xewn navgîneke girîng e ji bo ravekirina meselê. Li gor psîkanalîstan dema ku em xewnan dibînin em bi awayekî bêhişî şikl didin îmajan û ew îmajên xewnê jî têkildarî hin çîrok, mît û îmajên pîroz ên mirovên seretayî ne. Axiriyê jî ew dibin îmaj û arketîpên seretayî.¹⁶

C. G. Jung têkiliya psîkanalîzmê û ya mîtê –bi saya serê nêrîna xwe ya resen a psîkanalîzmê– di asteke dîtir de dinirxîne. Ew di fikra xwe ya vê mijarê de bi awayekî berbiçav ji Freud vediqete. Jung giyanê mirov bi sê beşan parve dike, ku beriyê wek hiş û bin hiş, û binhişê jî wek binhişa takekesî û binhişa girohî (kolektîf) ji hev cuda dike. Jung gelek arketîpan destnîşan dike lê çar arketîp di sîstema wî de yê bingehîn in. Ew jî yê li jêr in: Persona (maskeya derveyî ya kesayetiyê), Sîber (hêla tarî ya kesayetiyê û taybetmendiya kesayetiyê ya heywanî), Anîmus (nêrbûna di hundirê ya mê de) û Anîma (mêbûna di hundirê yê nêr de).¹⁷

Jung di nav sîstema xwe de binhişê bi awayekî cuda dikirpîne û arketîpê jî bi vê peywendê tê de bi cih dike. “Tebeqeyeke rûxarkî ya binhişê bê guman takekesî ye. Ez

¹⁴ **h.b.** r. 42

¹⁵ **h.b.** r. 43

¹⁶ Adam Adamski, “Archetypes, collective unconscious and quantum psychology”, **NeuroQuantology**, September 2011, Vol 9, Issue 3. r. 563-566

¹⁷ T. McCormick And Kim Kennedy, **h.b.**, r.132

navê binhişa takekesî lê vê tebeqê dikim. Lê ew binhişa takekesî li ser tebeqeyê kûrtir disekine, ku ji tecribeyên şexsî dernayê û destkeftineke şexsî nîne bes tişteke zikmakî ye. Ez ji vê tebeqeya kûr re dibêjim binhişa kolektîf. Min peyva ‘kolektîf’ bî kar anî jî ber ku ev beşa binhişê ne takekesî ye bes gerdûnî ye”¹⁸

Jung têgeha arketîp wek mîrateyeke qedîm destnîşan dike: “Têgeha arketîp hêj li heyama yewnana antîk dihat bikaranîn û hemwateya *îdeaya* Platon bû.”¹⁹ Û girîngiyeke mezin dide vê têgehê. “Arketîp yek ji qîmetên hêjatirîn ên giyanê mirov in. Biçûkxistina qîmeta wan û paşguhkirina wan windahiyeke mezin e.”²⁰

Adamski jî di gotara xwe de girîngîdayîna Jung a bi arketîpan destnîşan dike:

*“Lê ew kes Carl Gustav Jung bû ku binhişê takekesan nas kir, lê di heman demê de jî, piştî lêkolînên bi salan, wî nîşan da ku di her takekesî de binhişê kolektîf jî heye. Li gor Jung, ev binhişê kolektîf ji hêla dozîn (instinct) û arketîpan tê teşedayîn ku ew bi xwe jî ji sembol, nîşane, qalib û reftarên ji kal û bavan mîrate mane pêk tên.”*²¹

Jung arketîpan wek mîrasê hevpar ê mirovahiyê dihesibîne. Li gor wî temayên arketîpan ji bo hemû çandan wekî hev in, li ba mirovên her temenê, her çand û nijadê tîn dîtî. Bi nezerê Jung arketîp wek pîreyekê ye ku ber bi giyanê mirov diçe. Di mît û çîrokên gelêrî de motîfên xwedî heman naverokan hene ku li her herêmê peyde dibin. Em heman temayan di fantazî û xewnan de, hem li cem mirovên nexweş û hem jî yên baqil de dibînin.²²

Arketîp di sîstema Jung de û her wisa di teoriya Joseph Campbell ya leheng de xwedî rolên girîng in. Campbell di xebatên xwe de hin arketîpên ku ji nêzik ve bi

¹⁸ C. G. Jung, **The Archetypes And The Collective Unconscious**, trans. by R. F. C. HULL, Princeton University Press, New York, 1968, r.3

¹⁹ Jung, **Dört Arketip**, çev. Zehra Aksu Yılmaz, Metis Yayınları, İstanbul, 2003, r. 17.

²⁰ C. G. Jung, **Dört Arketip**, r. 24

²¹ Adam Adamski, “Archetypes, collective unconscious and quantum psychology”, **NeuroQuantology**, September 2011, Vol 9, Issue 3. r. 563

²² Adam Adamski, **h.g.**, rr. 564-565

rêwîtiya leheng re têkildar in dest nîşan dike, ku Jung jî di xebatên xwe de rola wan kirpandine. Ji wan arketîpan yê ku bêtir bi teşeyê karakteran an jî têkildarî tevgerên karakteran xuya dibin li jêr di çarçoveya pênasînên Campbell û Jung de hatine pêşkêşkirin.

Leheng (Hero): Leheng ew kesê baş û navendî ye. Armanca wî ya sereke terikandina cîhana edetî ye û xwe-fedakirin e ji bo peywîrên rêwîtiya pêş xwe; an ku bersivdana erkan, timamkirina serboriyê û avakirina hevsenga cîhana edetî.²³ Arketîpa leheng bi du taybetmendiyan sereke û lêkdayî xwe nîşan dide; astengiyan ji holê radike û digihîje armanc(ên)a xwe. Jung armanca leheng wiha datîne holê: “Armanca sereke ya leheng têkbirina cinawirê tarîtiyê ye. Serkeftina wî serkeftineke hêvîkirî ye ku tê de hişmendî binhişê têk dibe.”²⁴

Arketîpa leheng ji nêzik ve têkildarî arketîpên jiyan û mirinê ye. Ew bi rêya mirin û vejînê, bi rêya kuştinê û bi şahidiya mirin/kuştina hezkiriyên xwe timî li ser sînorê mirin û jiyane ye. Leheng wek arketîp li şûna daxwaz û azweriyên mirov ên tarî jî digire.

Hebûna taybetmendiyan cuda yê lehengan dibetiya arketîpbûna wî ji holê ranake. Ev arketîp li gel cîyawaziyên lehengan –û heta bi rêya wan cîyawaziyên– çêbûye û pê re dewlemend bûye. Campbell vê yekê wiha rave dike: “Leheng çi pêkenokî be çi jî yekî hêja be, çi yekî Grek an jî barbar be, çi jî yekî pûtperest an jî Cihû be, esasê serpêhatiya wî pir kêr diguhere. Çîrokên gel temsîla çalakiya leheng a fîzîkî dikin: dîn pêkanîne wek tişteke exlaqî nîşan didin; dîsa jî di morfolojiya serpêhatiyê de, di rola karakteran de û di serkeftinan de pir kêr diguherin.”²⁵

Aqilmend (Mentor): Aqilmend ji leheng re motîvasyonê çêdike, fikr û perwerdehiyê didê. Ew di lîteratura Jung de wek *mirovê kal* tê pênasekirin. “Her ku leheng ji ber sedemên hundirîn an jî derveyî nikare tiştê pêwîst bike, zanyariya jê re lazim e wek fikreke şexs-girtî, an ku bi teşeyê mirovê kal ê ku şîretan dide û dibe alîkar

²³ bnr. Joseph Campbell, **h.b.**, r. 28

²⁴ C. G. Jung, **The Archetypes And The Collective Unconscious**, r. 167

²⁵ Joseph Campbell, **h.b.**, r. 35

derdikeve holê.”²⁶ Aqilmendî ne tenê di şiklê mirovê kal de xuya dibe. Carinan wek pirejinekê an jî ajalekê jî xuya dibe. Jung vê wek *arketîpa giyan* bi nav dike ku bi şiklê mirov an jî ajalekê derdikeve pêş leheng dema ku pêwîstiya wî bi pêhisîn, têgihîştin, biryar an jî pîlanekê çêdibe.²⁷

Campbell jî her wekî Jung arketîpa aqilmend bi şiklê xuyabûna wî ya wek mirovê kal destnîşan dike û rola wî wiha dikirpîne: “Li heyama ceribandinan û pêkanînen dijwar gotinên wî ji leheng re dibin alîkar. Ew e yê ku gavişkî xuya dibe û şûrê ku dê cinawir bikuje dabîn dike, agahiya derbarê keçika li benda leheng dide, cihê gencîneyan dide kifşê, dermanê qenckirinê li birînên xedar dide û axiriyê jî piştî serpêhatiya mezin berê leheng dide ber bi cîhana wî ya edetî.”²⁸

Parastvanê Dergehê (Threshold Guardian): Ev arketîp li ber dergehê yekem li benda leheng e. Astengiya yekem e ku divê leheng pê re li hev were an jî wê têk bibe. Ne pêwîst e ku her tim temsîla xirab be. Parastvanê dergehê cîhana taybet û nepeniyên wê ji leheng vedişêre, û ezmûnên sereke datîne holê da ku pê wan şiyar û qîmeta leheng kifşe bibe.²⁹

Peyamnêr (Herald): Karakterên ku peyamnêriyê dikin agahiya peywîrê didin û pêkhatina guherînekê aşkera dikin. Piranî di destpêka rêwîtiyê de xuya dibin da ku banga serpêhatiyê bidin. Dibe ku karakterek nav çîrokê bikeve sûretê peyamnêr û agahiyek an jî biryarekê aşkera bike, qala bûyereke nû bike, an jî hema peyamekê bîne. Carinan li şûna mirov, ajalek an jî xewnek jî dikare rola peyamnêriyê wergire ser xwe.

Campbell destnîşan dike ku naveroka bangewaziya peyamnêr dibe biguhere. Vexwendina wî (peyamnêr) dibe ku ji bo jiyînê be, an jî ji bo mirinê. Dibe ku gaziya ji bo pêkanîneke girîng a dîrokî be. An jî dibe ku bangewaziya ji bo ronîbûneke dînî be. Ev peyam her çî yeka girîng an jî basît be, û li kîjan qonaxa temen be jî, axiriyê ew

²⁶ C. G. Jung, *Dört Arketip*, r. 87

²⁷ Jung, *h.b.*, r. 86

²⁸ Joseph Campbell, *h.b.*, r. 8

²⁹ *h.b.*, rr. 71-75

rîtuelekê, heyamekê an jî derbasbûneke giyanî diyar dike ku dema timam bû bi xwe re mirinekê an jî jidayîkbûnekê tîne.³⁰ Her tim heyirîneke mezin bi vî figurê peyamnêr re çêdibe, vêca ew ji nişkê ve wek rêber derdikeve holê û pardemekê, pileyeke nû destnîşan dike.³¹

Sîber (Shadow): Sîber azweriyên me yên tarî, çavkaniyên neaşkera, heta taybetmendiyên înkarkirî temsîl dike. Çawa ku Roj ronahiya giyan be, sîber jî heman tişt e ji bo gewde, an ku îmajê aliyê wê ya xirab e.³² Ew dikare bibe sembola tirs û fikarên me yên sereke jî. Sîber her tim ne derbarê tiştên xirab in, dikarin taybetmendiyên qenc jî binimînin. Her çiqas wateya sîberê li şûna figureke neyînî bigire jî, xwedî hêlên erênî ne ku paşxaneyên ciyawaz nîşan didin.³³ Neyarên leheng û kesên xirab gelek caran maskeya Sîberê didin ber xwe.

Hîlekar (Trickster): Hîlekar dixwazin pergala statukoyê ser û bin bibe, û bi gotin û kirinên xwe yên sosret cîhana edetî dixin nav kaosê. Her çiqas seranserê rêwîtiya xwe neguherin jî, dinyaya wan û niştecihên wan bi kirinên wan ên sosret diguherin. Hîlekar ken û henekê bi kar tînin da ku sosretiya rewşê nîşanî karakteran bidin, û belkû jî zorê bidin bo guherînekê. Hîlekar figurê sîberê yê hevpar e. Ew yekûna taybetmendiyên sivik ên karakterê takekes e.³⁴

2.3. Teoriyên Li Ser Têgeha Leheng

Di nav teoriyên têkildarî mîten leheng de *mîta jidayîkbûna leheng* a Otto Rank'ê psîkanalîst, têgeha *lehengê kevneşopiyê* ya folklorîstê îngilîz Lord Raglan û monomîta Joseph Campbell ên herî esasî û naskirî ne. Her ku Rank li gor sîstema xwe ya psîkanalîstî bîngeha teoriya xwe çêkiriye, Raglan besta xwe ji Frazer girtiye, û Campbell jî ji nêrînên Jung sûd wergirtiye.³⁵ Di vê beşê de em ê bi awayekî giştî behsa teoriyên

³⁰ Joseph Campbell, **h.b.**, r. 47

³¹ Campbell, **h.b.**, r. 51

³² **Dictionary of Symbols**, r. 291

³³ C. G. Jung, **Dört Arketip**, r. 135

³⁴ h.

³⁵ Robert A. Segal, **Myth, A Very Short Introduction**, r. 87

leheng ên Rank û Raglan bikin. Teoriya Campbell jî bi awayekî berfireh dê di beşeke cuda de bê nixandin.

Otto Rank li gel Sigmund Freud, Carl Jung û Karl Abraham kesayetekî girîng e ku xebatên wî ji qada psîkolojiyê bigire ta antropolojî û çandnasiyê berbelav bûne. Teoriya Rank di nav ekola psîkanalîst de derbarê têgeha leheng nêzikbûna herî şênber û berbiçav e. Ev ekol ji bo xebatên mîtolojiyê jî çarçoveyeke fikrî pêşkêş dike, bes ev çarçove her çiqas li gor esasê ramanên esasî yê psîkanalîzmê bin jî, di nav xwe de yekpare nînin û xwedî cîyawaziyên berbiçav in.³⁶

Rank çîrokan (tales) wek berhemên pevbestî (fiction) dibîne û wan bi rêya dervehiştina hiş wek hilberînen binhiş rave dike³⁷; û dibêje ku paranoya ku lehengan motîve dike dibe ku di rastiyê de aîdî lehengan nebe. Lewre leheng di nav çîrokan de karakter in û fikrên binhişî yê nav çîrokan aîdî çîrokbêjan in.³⁸ Di teoriya Rank de problematîka sereke girêdayî jidayîkbûna leheng e. Ew li ser jidayîkbûna Keysar Sargonê Babilonyayê, Mûsa û Îbrahîm pêxember, jidayîkbûna lehengê hindî Karna, Keysar Darabê Îranî, Parisê kurê Qral Priamê Troyê, çîroka Kîrûsê neviyê Astyagesê Medî û yê din disekine û arîşeyên hevpar ên têkildarî jidayîkbûna wan diyar dike.³⁹

Rank wan motîfên hevpar ên lehengên navborî destnîşan dike: Leheng zarokên kesên bijarte ne, piranî jî kurên keysaran in. Hêj di zikên dayîkên xwe de ji bo desthilatiya keysêr wek zarokên (kurikên) xeternak tên pêşbînîkirin, an ku ew ê pergala heyî serûbin bikin. Ev pêşbînî jî bi rêya şîroveya xewnê çêdibe. Dema jidayîkbûnê nîşaneyên xirab bi dêûbavan xuya dibin. Ji bo ku ji kuştinê bên rizgarkirin/an jî hema bên kuştin, dema tînin wan bi dûr dixin, gelek caran jî di nav qotiyekê de bi ro de berdidin. Ji hêla ajalekê an jî mirovên ji rêzê ve tînin û xudankirin. Piştî ku mezin

³⁶ Ji bo tîkiliya mîte û nêrinên psîkanalîstan bnr. Dan Merkur, **Psychoanalytic Approaches to Myth**, Routledge, 2005, rr. 1-29

³⁷ **h.b.**, r. 21

³⁸ **h.b.**, r. 23

³⁹ bnr. Otto Rank, **The Myth of The Birth of The Hero**, translated by Drs. F. Robbins and Smith Ely Jelliffe, The Journal of Nervous and Mental Disease Publishing Company, New York, 1914, rr 14-64

dibin dêûbavên xwe peyde dikin, tola xwe distînin, û axiriyê jî rêz û payeyeke bilind bi dest dixin.⁴⁰

Rank mînakên xudankirina zarokê, an ku leheng/qralê pêşerojê, ya ji hêla ajalekê ve jî dide. Bo nimûne, Romulus û Remus ji hêla dêlegurekê, Zal ji hêla teyrê sîmurx, Ferîdûn ji hêla çêlekê ve tê xudankirin. Rank her wiha avêtina zarokê ya nav avê jî wek semboleke têkildarî hatina dinê rave dike: “Diyarbûna nav avê ji derbirîna sembolîk a jidayîkbûnê wêdetir çî tişt nîne. Nexwe zarok ji nav avê derdikeve, û selik, qotî an jî navgîn her çî be, ew jî li şûna malzarokê digire.”⁴¹

Veqetîna kurê gihîştî ya ji desthilatiya dêûbavê xwe rastiyeke herî pêwîst û her wiha herî bijan a perisînê ye. Pir pêwîst e ku ew veqetîn çêbe, mirov dikare bibêje ku takekesên gihîştî tev ev yek heya radeyekê pêk anîne. Pêşdeçûna civakî jî li ser esasê vê nakokiya du nifşan ava bûye.⁴²

Li gor Rank ew dijberî û nakokiya bav û kur a ku hêj beriya jidayîkbûna kur destpê dike, li nav çarçoveya romansa malbatê bes bi şikleke berovajîkirî tê temsîlkirin. Di romansa malbatê de kur dixwaze bavê xwe yê ku li pêş azweriya wî asteng e ji holê rake; di mîtê de jî vêca bav dixwaze kurê xwe –yê ku ji bo wî astengiyê pêşerojê ye– têk bibe.⁴³

Rank egoya zarokê bi egoya leheng têkildar dike. Çawa ku zarok hewl dide azadiya xwe ya takekesî bi dest bixe, bi heman awayî lehengê mîtê jî hewl dide ji dêûbavan xwe rizgar bike. Lewma jî egoya zarok û ya leheng bi heman awayî tevdiqere, û egoya leheng di esasê xwe de egoye kolektîf e.⁴⁴

Rank mîtan wek hilberînên mezinan destnîşan dike. Mezin bi çêkirina çîrokên bi vî rengî berê xwe didin zarokatiya xwe, xwe li vê dema lehengiyê ya heyama zaroktiyê

⁴⁰ Otto Rank **h.b.**, r. 66

⁴¹ **h.b.**, r. 74

⁴² **h.b.**, rr. 67-68

⁴³ **h.b.**, rr. 77-79

⁴⁴ Otto Rank **h.b.**, 71-72

disêwirin, û bi şîyan û destketiyên mezintiyê lehengiya xwe ava dîkin. Ev helwesta mezinan jî aliyekê ve şermezariya dijderketina li gel bav û jî aliyê din jî motîvasyonê serkêşîya li hember bav nîşan dide.⁴⁵

Teoriyeke girîng a derbarê leheng de jî *Lehengê Kevneşopiyê* ya Lord Raglan e. Dema ku li ser çîroka Oedipus dixebite dibîne ku hin bûyerên wê çîrokê gelekî dişibin çîrokên Theseus û Romulus. Piştî ku li ser çendîn çîrokên din ên grekî dixebite û analîzên berfirehtir dike, Raglan digihîje encamên balkêştir ku tev dibin palpişt ji bo hin şibandînan wî yê tekûz. “Ez li ser çîrokên lehengên kevneşopî yê grekî xebitîm, û min dît ku her çiqas ew çîrok bi bûyerên cuda jî hev vediqetiyên jî hin bûyerên kifşe hebûn ku hema hema di tevahiya çîrokan de xuya dibûn.”⁴⁶

Raglan di xebata xwe de çîrokên 12 lehengan bi awayekî bi hûrgilî hildide dest û hewl dide ku bûyerên di hemûyan de hevpar in dest nîşan bike. “Hin jî wan şibandînan pir balkêş in, hin jî zêde ne girîng in lê ew şibandînan tev bi min wetrê wek nîşaneyên hebûna qalibekê bûn.”⁴⁷ Raglan di encama analîzên xwe de jî bo serpêhatiyên lehengan bîst û du qalibên hevpar kifşe dike. Li jêr qalibên ku Raglan tespît kirine û wek taybetmendiyên lehengan û serpêhatiyên wan dest nîşan kirine hatine rêzkirin:

1. Dayîka wî bakîreyek jî malbata keysaran e.
2. Bavê wî keysar e.
3. Carinan bavê wî xizmê malbata dayîkê ye.
4. Şert û mercên ku ew dikeve nav malzaroka dayîka xwe deredetî ne.
5. Car hene ku ew kurê yezdanekî ye.
6. Dema jidayîkbûnê hewldanek çêdibe jî bo kuştina wî, piranî jî hêla bavê wî ve.

⁴⁵ h.b., rr. 84-85

⁴⁶ Lord Raglan, *The Hero, A Study in Myth, Tradition and Drama*, Vintage Books, New York, 1956, r. 173

⁴⁷ h.b., rr. 173-174

7. Lê ew ji wê qesta-can difilite.
8. Û li welatekî dûr ji hêla malbateke xudanker tê mezinkirin.
9. Derbarê zaroktiya wî tişteke nayê aşkerakirin.
10. Lê dema mezin dibe vedigere keyaniya xwe ya pêşerojê.
11. Li dij keysarekî an jî dêwekê, ejdeharek an jî ajalek kovî bi ser dikeve.
12. Ew bi dotmîrekê re dizewice.
13. Dibe keysar.
14. Ji bo heyamekê bêyî teşqele serweriyê dike.
15. Qanûnan bi cih dike.
16. Piştî piştevaniya yezdanan û/an jî ya gelê wî ji dêst diçe.
17. Ji textê xwe tê bidûrxistin.
18. Mirina wî bi awayekî nepend (mysterious) pêk tê.
19. Piranî jî li serê çiyayekê dimire.
20. Zarokên wî, eger zarokek hebe, nadin pey rêça wî.
21. Termê wî nayê çalkirin.
22. Lê dîsa jî li cihekê an jî li çend cihan goristana wî heye.

Piştî ku di bîst û du xalan de qalibên serpêhatiya lehengê kevneşopî rayêdixîne pêş çavan, Raglan vêca ji bo bûyerên ku di serpêhatiya lehengê kevneşopî de pêk tên pênaseyeke balkêş dide. Raglan cîyawaziyekê dixê nav bûyerên nav wan çîrokan û çîrokên di jiyana rasteqîn de diqewimin, û vê yekê wiha dest nîşan dike: "... çîroka ku di

nav çîroka lehengê kevneşopî de derbas dibe ji bûyerên jiyana mirovekî rasteqîn bêtir, ji bûyerên rîtuelfî çêdibin ku di karîyera kesayetek rîtuelfî de pêk tên.”⁴⁸

Raglan bûyerên nav çîroka lehengê kevneşopî bi sê qonaxan ve parve dike û wan wek pîrozbahiyên gihîştinê (*rites de passage*) bi nav dike. Ew her sê qonax jî, an ku *bûyîn/hatina dinê, hewldana jiyane* û *mirin*, bi dorê serdemên jiyana leheng dinimînin.

Di qonaxa yekem de bûyer têkildarî bûyîna leheng e. Ji nêzikbûna Raglan em dikarin tê derxin ku du taybetmendiyên sereke yên wê qonaxê hene:

a) Şêweya sosret a bûyîna wî; ku di gelek çîrokan de bavê leheng yezdanek e û bi awayekî dersirûştî têkilî bi dayîka leheng re datîne. Di encama wê têkiliya deredetî de jî leheng tê dinê.

b) Xetereya kuştinê; leheng gava ku tê dinê bi sedemên cuda, piranî jî ji hêla bavê xwe ve, tûşî xetereya kuştinê tê. Lê bi bextê qenc ji kuştinê rizgar dibe û li warekî dûr ji hêla xudanên din ve tê mezinkirin.

Di serpêhatiya lehengê kevneşopî de valahiyeke bûyeran bala mirov dikişîne, ku ev valahiya navborî jî ji heyama bûyînê ta dema xortaniyê çêdibe. Di piraniya çîrokan de em derbarê biçûktiya leheng bê agahî dimînin, an ku piştî bûyerên sosret ên jidayîkbûnê û hin hûrgiliyên xetereya kuştinê û xudankirina li devereke dûr vegotin diguheze ser xortaniya leheng. Raglan derbarê vê yekê de wiha dibêje: “ Eger ku em, her wekî ez dest nîşan dikim, lehengê xwe wek figureke dîrokî na, lê berovajî vê, wek figureke rîtuelfî bipejirînin, vê çaxê nebûna agahiyên derbarê biçûktiyê dibe tişteke normal, ji ber ku zarok di navbeyna biçûktî û xortaniyê de beşdarî çî rîtuelfî nabin.”⁴⁹

Raglan lehengê kevneşopî ji lehengê dîrokî bi du xalên din ji hev vediqetîne. Yek ji wan têkildarî qonaxa serkeftina wan e. Wiha rave dike Raglan: “...serketinên lehengê kevneşopî, berovajî lehengê keysar ê dîrokî, timî beriya ku ew desthilatiyê bidestbixîne

⁴⁸ Raglan, **h.b.**, rr. 174-175

⁴⁹ **h.b.**, r. 189

pêk tên.”⁵⁰ Ji vê ravekirinê em têderdixînin ku di qehremaniyên lehengê keysar de mohra keysariyê heye, an ku ew li gel derfet û şîyanên qraltiyekê pêk tên û xwedî xasyeteke kolektîf in. Lê lehengê kevneşopî her çî dike beriya bidestxistina desthilatiyê pêk tîne.

Xala din a ku li gor Raglan lehengê kevneşopî û lehengê dîrokî ji hev vediqetin têkildarî şerkariya wan e. Raglan dest nîşan dike ku lehengê kevneşopî çî car serketiyê şerekê nîn e. Kêm caran wek yekî ku xwedî artêşekê derdikeve pêş, eger xwedî artêşekê be jî nayê dîtin ku li pêş wan e û berê wan bide hedefekê. Di gel ku lehengê dîrokî wek fermanzarekî li pêş artêşa xwe şer dike, lehengê kevneşopî çî car wek fermanzare artêşekî nîn e. Şerê wan wek şerên takekesî yên li dijî keysarekî din, an jî li dijî ejdehar û ajalên dirrinde ne.

Raglan di berawirdkirina xwe ya lehengê kevneşopî û lehengê dîrokî de cîyawaziyekê jî di dawiya wan de dibîne. Li gor wî dawiya lehengê kevneşopî bi awayekî berbiçav ji dawiya lehengê çêrûngên periyan û lehengê dîrokî cudatir e. Di vê babetê de wiha dibêje: “Em vê rastiya girîng dibînin ku, berovajî lehengê dîrokî, serpêhatiya lehengê kevneşopî bi jêderxistina keyaniya xwe, û bi mirina bi awayekî nepend digihîje encamekê.”⁵¹ Di dîrokê de pirî caran keysarên mezin piştî ku serkeftinên hêja bi dest dixin û keysarekî xurt têk dibin, dibin desthilatdar û desthilatdariyê jî piştî têkçûneke bi heman awayî mezin winda dikin. Lê di rewşa lehengê kevneşopî de ji windakirinekê bêtir qedereke çarenîn derdikeve pêş me. Ew hema ji keyaniya xwe tê defdan û bi şikleke sosret dimire an jî winda dibe.

Di encama xebata xwe de Raglan dest nîşan dike ku di çîrokên lehengên kevneşopî yên cur bi cur de ewqas şibandin û xalên hevpar hene ku mirov nikare wan wek tiştên rasthatinî bi nav bike. Ew wan xalên hevpar wek bûyerên rîtuêlî rave dike, an ku ji bûyerên rastî bêtir wan wek bûyerên sembolîk dibîne ku bi kêrî ravekirina serpêhatiya jiyana mirov tên.

⁵⁰ h.

⁵¹ h.b., rr. 189-190

2.4. Joseph Campbell û Teoriya Monomîtê

Têgeha *monomîtê* yekemcar di romana bi navê *Finnegans Wake* a James Joyce de wek : “*And his monomyth!*” derbas dibe⁵², bes wateya wê aşkera nîne û kontekst jî fikreke berbiçav nade dest. Piştî ev têgeh ji hêla Joseph Campbell ve careke din tê pêşkêşkirin, naveroka wê tê tijîkirin, û di nav teoriyên mîtolojî û vegotinnasiyê de cihekî taybet digire.

Digel ku monomît ji hêla fikrî ve xwedî bergeheke firehtir be jî, zêdetir bi şîroveya xwe ya têkildarî rêwîtiya leheng tê nasîn. Teoriya monomîtê serpêhatiya leheng wek çerxekê ku bi awayekî bazneyî digere, her wekî gera çerxa saetê, pênase dike û çîrokên lehengan jî wek vegotinên xwedî heman arketîpan şîrove dike.

Campbell monomîtê wek daxwaz û azweriya xurt a pêşdeçûna giyanê mirov rave dike û mît û rîtulên jî her wekî navgînên vê pêşdeçûna giyanê mirov dibîne. “Her tim fonksîyona sereke ya mît û rîtelan ew bû ye, an ku ew sembolên giyanê mirov bi pêş de dibin dabîn bike.”⁵³

Serpêhatiya ku di monomîtê de tê qalkirin di şexsê leheng de serpêhatiya giyanê mirov e. Her çiqas cihê û resen xuya bike jî, wek diyardeyeke hevpar a giyanê mirov di şexsê her takekesî de dibe çîroka manend a tevahiyê. “Û, dema em piştî xwe didin paşeroja xwe û li serpêhatiya xwe ya yekta, pêşnebîn û xeternak dinihêrin, tev tiştî em dibînin hema rêzeke metamorfozên pîvane ne ku me wek jin û mêr li çar aliyên cîhanê, li hemû sedsalan û bi sûretê sosret ê şaristaniyê jiyaye.”⁵⁴

Rêwîtiya leheng a ku Campbell bi qalibên wê yên hevpar û dubareyî di piraniya çîrokên mîtolojîk de dest nîşan dike beşeke girîng a monomîtê ye. Ew serpêhatiya ku ji sê beşên sereke û hevdeh qonaxan pêk tê qerqodeya monomîtê pêk tîne. Di berdewama xebatê de dê qala wê rêwîtiya leheng a navborî bê kirin.

⁵² bnr. James Joyce, **Finnegans Wake**, published by Faber and Faber, London, 1939, r. 581

⁵³ Joseph Campbell, **h.b.**, , r. 10

⁵⁴ **h.b.**, r. 12

Derbarê pênaseya têgeha *monomît* de şîroveya David Adams jî wek nêrîneke balkêş dikare bê qalkirin: “Monomît hem derbirîneke rêwîtiya figurê leheng bi xwe ye, hem derbirîneke rêwîtiya me bi xwe ye ku bi rêya jiyana fîzîkî û giyanê pêk tê, û hem jî derbirîna rêça perisînî ya mirovahiyê ya ber bi hişdariya yekser e.”⁵⁵

Monomît bi têkiliya mîtê û motîfên xwemalî re eleqedar dibe û hewl dide wan ji hev û din veqetîne. Lê wisa diyar e ku ew veqetîna ji hev ne ji bo diyarkirina sînoran e, bes bêtir ji bo timamkirina serpêhatiya giyanê mirov a ji asta niştecihî ta ber bi asta gerdûnî ye. Wek rêbazek zanistî mîtolojiya berawirdî ji bo vê ji-hev-veqetîn û timamirinê tê kardarkirin. Bi rêya berawirdkirinê jî mirov dikare li gor çarçoveya giştî dêna xwe bide çîroka lokal, an ku ji asta gelemper dakeve asta taybet û bi vî awayî jî şopa qalib û motîfên lokal di asta gelemper de bigere. Di encama nêrîneke bi vî rengî de jî pirî caran tiştta ku di heman demê de armanca navxweyî ya monomîtê ye derdikeve holê; kompozîsyoneke kemilî ya jiyana takekes û giyanê gerdişî, ya çîroka jiyana/lehengê lokal û ya cîhanî.

Derheqê dijderketinên ku vê kompozîsyona li jor paşguh dikin Leeming bersiveke wiha dide:

*“Bêguman hê jî hin kês hene ku dê bipirsin bê ka çi eleqeya me bi vê yekê heye. Bersiva vê jî ev e ku ew bi her tiştê me re eleqedar e. Rêwîtiya jiyana lêgerîna ji bo xwe ye—jixwe mîta şexsî ya ku bi nimûneya lokal û rasterast tê maskekirin, di asteke kûrtir de hema derbirîneke mîta cîhanê ye. Kesên wek James Joyce, Joseph Campbell û yên din ev mît wek monomît bi nav dikin.”*⁵⁶

Di vê niqteyê de mirov dikare pirsek wiha bike. Rêwîtiya leheng a ku Campbell di çarçoveya monomîtê de bi çendîn qonaxan ve dabeş dike gelo bi awayekî lîner û li pey hev pêk tê? Ji bo bersiveke yekser û têrtijî lazim e li ser gelek çîrokên lehengên mîtolojîk û hûngiliyên serpêhatiyên wan dahûrîn bîn kirin. Dîsa jî tê dîtîn ku her çiqas

⁵⁵ David Adams Leeming, *The Voyage of the Hero*, Oxford University Press, New York Oxford, 1998. r.

6

⁵⁶ h.

qonaxên Campbell destnîşan dike di nav çîrokan de hebin jî, rêza wan timî ne bi heman awayî ye, an ku digel peydebûna qalib û motîfên hevpar ne pewîst e ku ew di hemû çîrokan de bêyî kêmasî hebin û rêza wan jî mîna hev be. Di vê xalê de em dikarin cih bidin nêrîna Yarcan ku dibêjê:

“Monomît timî li gor rêza ku Campbell dest nîşan dike wan qonaxên qalkirî naşopîne. Hin qonax bi derbasbûnên nav hev û din re tîn behskirin, û dibe ku behsa hin qonaxan jî qet neyê kirin. Lê qonaxên wek parastvanên dergehê, zikê masiya hût, mirin û vejîn, ezmûn, rasthatina li gel xwedawendê, xweşkirina dilê bav gelek caran derdikevin pêş me. Rêwîtiya Bêdawî ya Leheng di heyameke bi dawî de diherike û diçe.”⁵⁷

Rexneyeke giştî ya derbarê teoriya mîtê ya Campbell ji hêla Segal ve hatiye kirin. Ew bala xwe dide ser nêzîkbûn û nirxandina Campbell a mîtê û wan rexne dike. Her wisa Segal jî tevî vê rexneyê dibe ku kêmasiya monomîtê di mînakên bisînor û encamên zû bi zû bidestxistî de dibîne. Nexwe ew dest nîşan dike ku Campbell ji mînakên lokal dixwaze encamên unîversal derxîne.⁵⁸

Segal nêrînên Campbell ên wek: *“Civaka modern di nav aloziyekê de ye ji ber ku mirovê modern jiyane bêwate dibîne; sebebê wê bêwatebûnê jî ew e ku mirovê modern ji bela zanistê jî mîtê bêpar maye, nexwe tiştên ku wateyê didin jiyane mît in; mît dikare bi zanistê re bigunce,”* hildide dest û wan li gor şîroveyan Campbell dinirxîne û dawiyê jî digihîje wê encamê ku Campbell, bêyî hewce bi çespendinê bibîne, nêrînên xwe wek rastiyên jixweber dipejirîne û ji xwendevanên xwe jî dixwaze wan wek rastiyên teqez qebûl bikin.⁵⁹

Segal rexneyekê jî li nêrîna Campbell a derbarê arketîpan dike:

⁵⁷ Dilek Yarcan, **Joseph Campbell’a göre monomitlerin yapısı**, Anadolu Aydınlanma Vakfı Yayınları, 1996.(www.anadoluyayinlanma.org/Yazilar/monomitler.pdf) r. 4

⁵⁸ Segal, **h.b.**, rr. 257-268

⁵⁹ **h.b.**, rr. 257-260

“Campbell dibêje ku xebatên wî yê tevahiya emrê wî ew qanî kirin ku arketîp hene. Lê xebata wî ya li ser mîtan hebûna manendiyên unîversal bi tenê di asta gotinkî û vegotinî de nîşan dide. Ew xebat xwezaya wan a sembolîk, psîkolojîk û giyanî nîşan nade.”⁶⁰

Segal ji aliyekî din ve jî balê dikişîne ser nakokiyên fikrî yê Campbell, her ku têkiliya mîtê ya bi psîkolojî, dîrok û antropolojiyê şîrove dike. Li gor Segal, Campbell carinan wateya mîtê bi psîkolojiyê rave dike û dîrok û antropolojiyê li derve dihêle, lê hin caran jî di şîroveyên xwe de li gel psîkolojiyê dîrok û antropolojiyê jî bi kar tîne.⁶¹

Bi kurtasî em dikarin bibêjin ku digel rexneyên heyî ku teoriya monomîtê bi gelemperkirina mîtosan û bi paşguhkirina cîyawaziyên lokal rexne dikin û wê wek nêrînek nêr-navend dibînin⁶², monomît hîna jî ji bo şîrovekirina çîrok û lehengên mîtolojîk –bê guman bi alîkariya rêbaz û zanînên psîkanalîst– yek ji teoriyên herî girîng û naskirî ye.

2.5. Rêwîtiya Leheng û Hevdeh Qonaxên Wê

Joseph Campbell di encama xebatên berfireh de, ku mîtên gerdûnî û niştecihî yê ji gelek welatên li cîhanê analîz dike, rêwîtiya leheng bi hevdeh qonaxan ve dabeş dike. Di wan her yek qonaxê de leheng ji asteke serpêhatiyê derbasî asteke din dibe. Ew hevdeh qonax wek perçeyên sê beşên sereke yê rîtuela gihîştinê ne, û ew her sê beş jî bi dorê *veqetîna ji malê, pêkanîn û vegera ji bo malê* ne ku bi hev re kakilê monomîtê pêk tînin. Vêca leheng ji cîhana xwe ya edetî derdikeve û diçe devereke bûyerên dermirovî; hêzên efsaneyî derdikevin pêş û ew serkeftinên girîng bi dest dixê; axiriyê jî leheng ji vê serpêhatiya nepend bi xelatên biqîmet vedigere cem dostên xwe.⁶³

⁶⁰ **h.b.**, r. 264

⁶¹ **h.b.**, r. 266

⁶² Ji bo rexneya nêr-navendbûna Campbell bnr. Maureen Murdock, **The Heroine's Journey**, Shambhala Publications, Boston & London, 1990. rr. 2-3

⁶³ Joseph Campbell, **h.b.**, r. 28

Di beşa veqetînê de pênc qonax hene: *gaziya ji bo serpêhatiyê, redkirina gaziye, alîkariya dersiruştî, derbasbûna ji dergêhê yekem, û zikê nehengê*. Beşa pêkanînê ku tê de ceribandinên leheng çêdibin ji wan şeş qonaxan pêk tê: *rêya ceribandinan, rasthatina li gel xwedawendê, jina fêtkar, lihevhatina bi bav re, perestobûn, û xelata dawîn*. Beşa dawî ya bi navê veqerê ber bi malê jî wan şeş qonaxên jêr digire nav xwe: *redkirina veqerê, bazdana sêrdar, rizgariya ji derve, derbasbûna ji dergêhê veqerê, pisporê du cîhanan, û azadiya jiyînê*.⁶⁴

Qonaxa yekem, *gaziya ji bo serpêhatiyê*: Leheng li destpêkê di cîhana edetî de, an ku li mala xwe tê pêşkêşkirin. Ew der mekanê destpêkê ye, û ji wir rêwîtiya ber bi cîhana taybet pêk tê. Dawiya dawîn jî cihê ku leheng dizivirê ew der e. Vêca leheng li wir ji bo serpêhatiyekê tê gazîkirin. Ew gazîkirin bi gelek awayan, bi navgîn û navinciyên cur bi cur û li warên dûrî çawan û sosret dibe pêk were. Piştî vê gazîkirinê êdî fikr, hest û daxwazên berê bêwate dibin ji bo leheng; êdî dema derbasbûna ji dergêhê hatiye.⁶⁵

Ev qonaxa yekemîn a rêwîtiya mîtolojîk –ku me wek *gaziya ji bo serpêhatiyê* bi nav kir– dest nîşan dike ku felekê leheng gazî kiriye û giyanê wî ji civaka wî hilgirtiye û biriye daniye devereke nenas. Ev warê ku hem cihê xezîneyan û hem jî yê xetereyan e dikare bi cureyên cihê bê nîşandan; wek welatek dûr, daristanek, keyaniyeke binerdê, binê deryayê an jî jora asîmanê.⁶⁶ Bi vê gazîkirinê ji bo leheng peywîrek tê destnîşankirin, û divê ew peywîr jî li vê warê nenas pêk were.

Qonaxa duyem, *redkirina gaziye*: Leheng destpêkê li hember vê gaziye dudil e, an jî bêdil e. Di çîrokan de pirî caran tê dîtin ku leheng ji bo serpêhatiyê bêdil dixuye û destpêkê wê red dike. Ev jî ji ber tirsê û bêewlebûnê çêdibe. Dibe ku leheng nexwaze guherînekê pêk bîne û ji bo xwe hema rehetiya li cîhana edetî bi têrê bibîne. Di vê qonaxê de xetereyên ku dê seranserê serpêhatiyê rastî leheng bînin tînin kifşekirin.

⁶⁴ h.b., rr. 33-35

⁶⁵ h.b., r. 47

⁶⁶ h.b., r. 53

Di vê niqteyê de encameke balkêş ku Campbell dest nîşan dike derdikeve holê: Redkirina gaziye serpehatiyê vediguhezîne hêla wê ya negatîf. Kiryarê ku bi canbêzarî, şixulê giran û bi ‘çandê’ dorpêçkirî hêza xwe ya pêkanîna tiştan erênî winda dike û dibe qurbanîyekî li benda rizgarkirinê.⁶⁷ Dîsa jî, her çiqas li destpêkê dudil bin û ji bo demekê gaziye red bikin jî, leheng li hember rakêşandina serpehatiyê ta dawiyê nikarin li ber xwe bidin. Çendek nîşaneyên hêzeke xurt dê xwe bêtir bidin xuyakirin ta ku redkirina gaziye êdî mimkun nebe.⁶⁸

Qonaxa sêyem, *alîkariya dersiruştî*: Ji bo yên (lehengên) ku dawiya dawî gazi red nekiribin rasthatina yekemîn a di rêwîtiya leheng de li gel figureke parastvan çêdibe (piranî jî pirejineke hûrik an jî mirovekî kal) ku ew kes jî tilsiman dide lehengê ku dê derkeve pêşberî hêzên cinawirî.⁶⁹ Vêca çî pîrejî û çî jî mirovekî kal be ew kesayet rola aqilmend dileyize. Arketîpa aqilmend dema ku wek jin derkeve pêşberî leheng, vê çaxê temsîla dayîka kozmîk e û lehengê ku ji hêla dayîka kozmîk ve tê parastin zirarê ji tiştêkê nabîne.⁷⁰

Leheng bi aqilmend re dikeve danûstandinekê, û di encama wê danûstandinê de hin şîretan werdigire, hin tiştan jê hîn dibe û carinan jî diyariyek jê distîne. Bi alîkariya tevahiya wan tiştên ku ji aqilmend wergirtiye, leheng tirsan xwe dişkêne, baweriya wî qewî dibe û ji dergehê yekem derbas dibe. Lehengê ku guh daye bangewaziye û bi verekî dest bi rêwîtiyê kiriye, êdî xwedî yarmetiya hemû hêzên binhişê ye. Dayîka kozmîk bi xwe jî piştgiriya vê rêwîtiya mîtk dike.⁷¹ Parastvaniya dersiruştî, ku hem bi awayekî dayîkî û hem jî bavîkî ye, hemû hêzên binhişê di xwe de dike.⁷²

Qonaxa çarem, *derbasbûna ji dergehê yekem*: Leheng ji *dergeha yekem* derbas dibe û dikeve cîhaneke taybet. Rêwîtiya leheng a tijî serpehatî li wir dest pê dike. Ew li

⁶⁷ h.b., r. 54

⁶⁸ h.b., r. 51

⁶⁹ h.b., r. 63

⁷⁰ h.b., r. 65

⁷¹ h.b., r. 66

⁷² h.b., r. 67

ser sînorekê ye, sînorek wisa ku li pey wî welatê wî yê ewle û binas, li pêş wî jî warên xeternak û nenas hene.

Lehengê ku qedera wî bûye rêberê wî û alîkariyê didê, di serpêhatiya xwe de didomîne ta ku rastî parastvanê dergehê tê. Parastvanê dergehê li ber deriyê têtetinê yê warê hêza mezintirîn e.⁷³ Leheng, her wekî dûkela qurbanîyê ya ku di nav deriyê rojê re bilind dibe jor, û ji egoya xwe rizgarbûyî, di rêka xwe de diçe.⁷⁴

Qonaxa pêncem, *zikê nehengê*: Di vê qonaxê de şopa dawî ya cîhana edetî li pey leheng winda dibe û ew êdî amade ye ku bikeve şiklekî nû, ji halê xwe yê berê derbikeve û bi her awayî biguhere. Fikra ku derbasbûna ji dergeha bisêr wek gihîştina nav kureya vejînê dibîne bi îmajê malzaroka cîhanê ya wek zikê nehengê tê sembolîzekirin.

Leheng, li şûna ku hêza ber dergehê têk bibe an jî pê re li hev were, ji hêla cîhaneke nenas ve tê daqurtandin, û wisa dixuye ku dê bimire.⁷⁵ Windabûna leheng her wekî ketina bawermend a nav perestgehê ye ku tê de ew ê derbarê xwe mijûl be bê ka kî ye û çî ye. Tiştê ku leheng dikevê, çî hundirê perestgehê çî jî zikê nehengê, çî warê dûr çî jî li serê dinê an jî binê dinê be, tev yek û heman tişt in.⁷⁶

Qonaxa şeşem, *rêya ceribandinan*: Vêca ew êdî li cîhaneke taybet e, û di vê cîhana taybet de tûşî ceribandinan, hevalbendan, û neyaran dibe. Li wir rastî ezmûnan tê, neyarên xwe dibîne, dostên xwe dizane û qaydeyên wê cîhana taybet hîn dibe. Lazim e ku leheng bizane ka baweriya xwe bi kê bîne. Hevalbend jê re çêdibin. Leheng xwe ji bo peywîra giran amade dike, hêz û şiyana xwe vedinêre û ger pêwîst bike serî li aqilmend dide û bêtir tiştan jê hîn dibe.

Piştî ku ji dergehê derbasbû leheng êdî dikeve nav wargehek xeyalî ku tê de teşeyên nekifşe û guherbar hene, û divê ji ezmûnên li wê derê jî derbas bibe. Ew qonax

⁷³ h.b., r. 71

⁷⁴ h.b., r. 82

⁷⁵ h.b., r. 83

⁷⁶ h.b., r. 84

di serpehatiya mîtolojiyê de qonaxeke hezkirî ye. Ji wê qonaxê gelek azmûn û ceribandînên mûcîzeyî diyarî wêjeya cîhanê bûne.⁷⁷

Qonaxa heftem, *rasthatina li gel xwedawendê*: Dawiya serpehatiyê, piştî ku astengî û xetere tev li dû man, bi zewaceke mîfik a leheng û keybanûya cîhanê tê temsîlkirin.⁷⁸ Di vê qonaxê de leheng rastî temsîla evîn û hesta herî xurt û saf tê ku di şexsê jin-dayîk-xwedawendê de şênber dibe. Jin di zimanê wêneyî yê mîtolojiyê de temsîla yekseriya tiştên ku dikarin bên zanîn dike. Leheng jî ew kes e ku hewl dide wan bizane.⁷⁹

Jin, çî xwedawend çî jî dayîk an jî hezkirî, bi şeweyên cur bi cur derdikevin pêşberî leheng û li gor şeweyê nêrîn û pêhisînê jî wateyên cîyawaz werdigirin. Jin rêber e ji bo lûtkeya serpehatiya hestî. Bi çavê kêmas mirov lê binêre jin di radeyeke nizm de xuya dike; bi çavên xirab ê cahiltiyê jin kirêt û pespaye ye. Lê bi çavê fambar ew qîmeta xwe dibîne. Leheng dema ku wê *her çawa be wisa* bibîne, bêyî weswese bes bi camêrî û dilsozî, ew ê bibe keysar û xwedayê cismanî yê cîhana wê ya afirandî.⁸⁰ Rasthatina bi xwedawendê ji bo leheng ceribandîna dawî ya ji bo bidestxistina evînê ye.⁸¹

Qonaxa heştem, *jina fêtkar*: Di vê qonaxê de leheng rastî jineke fêtkar tê û pê re hewesek cinsî çêdibe. Ji ber vê hewesê xetereyek wisa derdikeve holê ku leheng ji rêya xwe, ji armanca xwe vegere û serpehatiyê nîvco bihêle. Lehengê ku li jiyana wêdetir digere divê jina fêtkar bi wê de bide û xwe ji xapandinên wê biparêze.⁸² Jina fêtkar temsîla xwedawenda bedenê ye, lewma leheng nikare bi awayekî dilpak pê re bimîne.⁸³

Qonaxa nehem, *lihevhatina bi bav re*: Leheng tê hemberî jêderka hêzê. Ew jêderk jî piranî bi sembola bav derdikeve pêş me. Rasthatineke bijan e, leheng divê

⁷⁷ h.b., r. 89

⁷⁸ h.b., r. 100

⁷⁹ h.b., r. 106

⁸⁰ h.

⁸¹ h.b., r. 109

⁸² h.b., r. 112

⁸³ h.b., r. 113

têbikoşe û serketî be da ku bikare çawaniya hêzê fêm bike û lihevhatinê pê re bike. Di vê qonaxê de leheng ji bo ku xwe ji egoya şikîner a bav biparêze dibe ku xwe bispêre arketîpa mê. Dîsa jî, li axiriyê dê bibîne ku nêr û mê, an ku bav û dê hev û din vedibeyînin û heman tişt in.⁸⁴

Pirsgirêka lehengê ku dê derbikeve pêşberî bav ev e; divê giyanê xwe heya radeyeke wisa vebike ku bikare bi têrê bigihîje da ku pê bizane ka çawa trajediyên vê gerdûnê yên qerase û xedar di heybeta *Hebûnê* de tîn rastandin. Leheng di xala tarî ya jiyanê derbas dibe û ji bo demekê serê xwe radike da ku li jêderka wê binêre. Sûretê bav dibîne, fêm dike –û her du li hev tîn.⁸⁵

Qonaxa dehem, *perestobûn*: Lehengê mîtolojiyê, ku bi awayekî fizîkî ji holê rabûye, beriya ku ji nû ve jîndar be di vê heyama serpêhatiyê de ji hêla giyanî ve û bi zanîn û hestên xwe hêjatir dibe, an ku bilindî asta îlahekî dibe. Di vê maweyê de tûşî tiştê ku herî zêde jê ditirse dibe, berawirdî erka herî dijwar dibe, û serpêhatiya wî digihîje ber devê mirinê. Û heta mirinê jî tecrîbe dike û di pey re vedije da ku dawiya serpêhatiya xwe bibîne.⁸⁶

Qonaxa yanzdehem, *xelata dawîn*: Lehengê ku ji mirinê difilite û tirsê xwe ya herî dijwar têk dibe, vêca xelatekê bi dest dixê. Ev xelat bi gelek awayan dibe. Bidestxistina zanînekê an jî gihîştina bi evîndarê dibe bibe xelata leheng. Her wisa îksîrek an jî şûreke bisêr jî dibe bibe xelata wî.

Di vir de xala girîng ev e ku xelat wek berdêla şiyar û pêkanînen leheng, mîna tişteke heqkirî, li holê ye.⁸⁷ Xelata dawîn dikare wek tiştê ku nemirbûnê bide leheng jî bê nirxandin; wek ava heyatê, dara jiyanê an jî gihayê nemirbûnê. Ev xelat ji bo leheng, her wekî Campbell bi nav dike, tiştêk wek *bedena saxlem* pêkan dike, nexwe ev tirsê

⁸⁴ h.b., r. 120

⁸⁵ h.b., r. 135

⁸⁶ h.b., rr. 150-154

⁸⁷ h.b., rr. 171-176

têkçûna bedenê fikareke sereke ya mirov e ku bingeha wê heyama biçûktiyê ye, dema zarok ji şîrê dayîkê vediqete hest dike.⁸⁸

Qonaxa duwanzdehem, *redkirina vegeerê*: Leheng çawa dest bi serpêhatiyê kiribe vêca divê peywîra vegeerê jî bîne cih. Çerxa yekser, an ku norma monomîtê, pêwîst dibîne ku leheng zanînan, Postê Zêrîn (Golden Fleece), an jî bedewa xwe şûnde bîne keyaniya mirovahiyê. Lê ew peywîr gelek caran ji hêla leheng ve tê redandin.⁸⁹ Di nav çîrokên mîtkî de çawa ku destpêkê leheng gaziya ji bo serpêhatiyê red bikin, bi heman awayî piştî ku digihîjin armanca xwe hin lehengên mîtê dil nakin vegeerin cîhana xwe ya edetî. Wek keysarek li bin çiyê dikevin xewa abadîn, an jî li giraveke bihuştî li gel xwedawendê heta hetayê dimînin.

Qonaxa sêzdehem, *bazdana sêrdar*: Leheng serpêhatiya xwe diqedîne û êdî divê vegere mala xwe, û ji bo vê yekê jî berê xwe dide rêya vegeerê. Leheng piranî li şûna ku vegeerê red bike, şiyana vegeera cîhana edetî pê re çêdebe. Gelek caran bûyerek di vê rêwîtiya ber bi şûn de diqewime ku leheng lazim e xwe jê rizgar bike.

Carinan jî leheng yezdanan an jî hêzeke dermîrovî hêrs dike û divê jê bireve da ku bikare vegere malê. Ev qonax dibe ku bûyerên kenokî û biheyecan jî bihewîne. Di vê bazdanê de hem ji hêla astengiyên derdikevin pêş leheng û hem jî ji hêla alîkariyên jê re çêdibin, em rastî tiştên bisêr tîn. Axiriyê ev serpêhatiya pileya dawîn, her wekî ji navlêkirina Campbell a wek bazdana sêrdar jî diyar dibe, bi rewşên sêrdar û nakok ên alîkarî û astengiyên digihîje encamê.⁹⁰

Qonaxa çardehem, *rizgariya ji derve*: Leheng di rewşa xirab a dawiya serpêhatiyê de ji çavkaniyeke nediyar alîkariyê werdigire. Ew çavkanî dibe ku kesekî beriyê terka leheng dabe be, an jî dibe ku yezdanek be jî. Heta daxwaza xurt a ji cîhana edetî ya ku leheng aîdî wê ye dibe ku bibe egera rizgarbûna leheng. Civak hesûdiya

⁸⁸ h.b., r. 162

⁸⁹ h.b., r. 179

⁹⁰ h.b., r. 182

kesên ku ji wê bi dûr mane dike, û ew civak dê were û li dêriyê wî bixe.⁹¹ Vêca divê leheng vegere da ku çîroka xwe ji civakê re qal bike.

Alîkariya ku di vê qonaxê de leheng werdigire, mînaka dawî ya wan alîkariyan e ku seranserê rêwîtiyê ji hêzên dersiruştî tê standin. Çi bi alîkariya ji derve, çi bi hêza hundirê xwe û çi jî bi rêbertiya xwedawendan, leheng divê vegere nav cîhana xwe ya edetî û bi îksîra xwe ya ego-şikîner û berdêla jiyânê wan pêşwazî bike.⁹²

Qonaxa panzdehem, *derbasbûna ji dergehê vegeerê*: Leheng bi derbasbûna ji dergehê vegeerê careke din daxilî nav cîhana edetî dibe, lê bi şiklekî nûbûyî, bi xelatekê û bi zanîn û tecribeyên kêrhatî beşdarî civaka xwe dibe. Axiriyê leheng serpêhatiyêke dijwar bi dawî aniye, di gel ezmûnên dijwar dîsa kariye ku şûnde bizivire û bi xwe re qezenceke şênber aniye ku dê bi şênîyên cîhana edetî parve bike.

Derbasbûna ji dergehê vegeerê her çiqas cudatiya cîhana edetî û ya deredetî, dualîteya mirin û jiyânê bipeyitîne jî, ji hêleke din ve bi leheng dide zanîn ku ew her du cîhan, mirin û jiyân jî, di esasê xwe de yek in. Vêca ew bi vê serpêhatiyê çûye nav warê cîhaneke din, çûye warê mirinê, û piştî dîsa ji dergehê vegeerê re şûnde hatiye, bes bi zanîneke qîmetbuha.⁹³

Qonaxa şanzdehem, *pisporê du cîhanan*: Lehengê ku xwedî tecibe û zanînen her du cîhanan e dibe pisporê wan her du cîhanan. Ew di şexsê xwe de jiyana fîzîkî û ya giyanî dike yek. Leheng paqij bûye û di ser de jî bi saya serê serpêhatiya xwe û bi tecribeya ku ji kesayet û hebûnen pêrgî bûyî wergirtiye, ew ji vir û pê de xwedî kasyetên dîtir e. Êdî ev ji sînorên şexsî filitî ye, ji hêvî û fikaran rizgar bûye, û ji tîrsa jiholêrabûnê azad bûye ku dizane bi rabûna ji holê ew dîsa vedije.⁹⁴

Qonaxa hevdehem *azadiya jiyînê*: Leheng piştî tevahiya serpêhatiyê êdî bêyî poşmaniya ji paşerojê û bêyî fikarên derbarê pêşerojê dikare tama azadiya jiyânê hilde.

⁹¹ h.b., r. 192

⁹² h.b., r. 201

⁹³ h.b., r. 201

⁹⁴ h.b., r. 220

Daxwazên leheng ên kesatî bi rêgezên gerdûnî re bûne yek. Wî di şexsê xwe de lihevhatina hişmendiya takekesî û daxwaza gerdûnê pêk aniye.⁹⁵

⁹⁵ h.b., r. 221

BEŞA SÊYEM

LEHENGÊ KURD

Di vê beşê de em ê li çarçoveya nêrînên Joseph Campbell serpehatiya du lehengên kurd, Rustemê Zal û Memê Alan analîz bikin û tîpolojîya wan lehengan diyar bikin. Analîza me dê di peywenda destanên Rustemê Zal û Memê Alan de pêk were. Li gel wan her du lehengan, em ê bala xwe cih bi cih bidin kesayetên din ên nav wan her du destanan, danûstandina wan a li gel leheng diyar bikin, û hewl bidin ku li gor teoriya monomîtê û formulasyona wê ya serpehatiya leheng hin encaman derxînin holê. Her wiha di vê beşê de em ê bidin pey şopên karakterên arketîp û taybetmendiyên wan derpêş bikin.

Destpêkê em ê bi giştî qala her du destanan û lehengên wan bikin, cih bidin şîroveyên lêkolîneran. Di pey re em ê serpehatiya Rustemê Zal û Memê Alan li gor hevdeh qonaxên *serpehatiya leheng* a Campbell dahûrînin. Dawiyê jî em ê wan her du lehengan li gel karakterên din ên berbiçav ên nav her du destanan li gor arketîpên ku di beşa duyem de hatine qalkirin şîrove bikin.

Me ew her du destan ji ber cihêrengiya temsîldariya lehengên wan û tekûziya metnên wan bijart. Bê guman gelek cîyawaziyên din jî dikarin bên dariştin û ji bo berawirdkirina wan bê bikaranîn –wek cîyawaziyên dîrokî û erdnîgarî, reseniya hêmanên çîrokî û hwd. Lê bala me dê li ser lehengan û bandora wan a li ser çîroksaziyê û hawirdora metnê be. Me Rustem bêtir wek temsîla lehengê nav kevneşopiyê bijart, ku li nav bîrdanka mîtê cihdar bûye û ji heft bavan leheng e. Mem jî bêtir wek mînakê lehengê evîndar e, lewma jî arîşeyên wî û bertekên wî jî cudatir û xweser in.

3.1. Rustemê Zal

Destana Rustemê Zal ji gelek beşên cuda pêk tê. Di wan beşan de qala serpehatiyên Sam, Zal û Rustem –heta kurên Rustem û endamên din ên malbata wî jî– tê kirin û bûyerên cur bi cur dibin mijarên her yek epîsodê. Di vê xebatê de em ê bêtir guhartoyên ku Heciyê Cindî di nav xebata xwe ya bi alfabeya kirilî ya bi navê *Şaxêd Eposa Rustema Zalê Kurdî* de tomar kirine bi kar bînin.⁹⁶ Her wiha berhevkarîya Nezîr Ocek ku ji herêma Şaxa Wanê ji çîrokbêj Muazê Ermuşatî guhdarî kiriye û li gor pîvanên zimanê nivîskî redakte kiriye jî çavkaniyeke dîke ye. Ev berhem li ber çapê ye. Çavkaniya me ya sêyem jî berhevoka neçapkirî ya Shahab Vali ya bi navê ‘Heft Xanê Rustem’ e.⁹⁷

Heciyê Cindî ji destana Rustemê Zal bîst û çar guhartoyan pêşkêşî lêkolîneran dike. Her yek ji wan qala beşeke serpehatiya Rustem û malbata wî dike. Her beş di nav xwe de hûrgiliyên zengîn rayêdixe pêş çavan, bêyî ku ji çarçoveya giştî ya destanê biqete. Mîrov dikare bibêje ku guhartoyên Cindî berhev kirine di nav xwe de xweser in û bi tevahî jî yekser in. Vêbêjên wan epîsodên çîrokan kurdên êzdî û çîrokbêjên ermenî ne ku ji deverên wek Şaxa Wanê, Qersê, Surmeliyê û cihên din koç kirine welatê Ermenistanê. Bi hostatiya zimanê vebêjan û ahenga vegotinê ew guhartoyên ku Cindî li jêr bi nav dike wek nimûneyên tekûz di folklorê kurdî de cihê xwe digirin.

“Niha ji bîstî zêdetir şaxên destana “Rustemê Zal” bin destê me da hene, ku me di nava gelek sala da bernivîsiye: “Çîroka Zal”, “Rûdeve”, “Şerê Rustem û Mişrîh”, “Zarotî û şerê Rustem”, “Çûyîna Rustem ber bi Çînistanê”, Rustemê Zal û kurê wî Birzo”, “Rustem û kurê wî Feremez”, “Şerê dêwê sipî û Rustemê Zal”, Şerê Rustem û Efresyab”, “Mirina Rustem” û yên mayîn.”⁹⁸

⁹⁶ Ew xebat li ser malpera <http://krd.riataza.com/2015/11/14/saxen-destana-Rosteme-zal/> bi tîpên latînî hatiye bidestxistin, û karên tîpguhezî û redaksiyonê ji hêla Têmûrê Xelîl ve hatiye kirin.

⁹⁷ Vali, Shahab, *Şahnameya Kurdî 1*, Weşanên Avesta, 2017, (li ber çapê ye.)

⁹⁸ bnr. beşa pêşgotinê ya Şaxên Destana Rostemê Zal, <http://krd.riataza.com/2015/11/14/saxen-destana-rosteme-zal/>

Rustemê Zal ji bo lêkolîna li ser mijara leheng derfetên zengîn pêşkêş dike, lewre ew bi her awayî xasyetên lehengan nîşan dide. Berî her tiştî Rustem ji malbateke lehengan tê. Kal û bavên wî tev lehengên navdar in. Heciyê Cindî secereya malbatê wiha rêz dike:

“Rustemê Zal, ku gelê kurd wî kirîye wek ewledekî xwe, di folklorê da hevt govek bavê xwe va tê bîranînê û erf-edetên wan dema heta îro jî di nav gel da hatine parastinê:

Rustem kurê Zal,

Zal kurê Dal,

Dal kurê Kam,

Kam kurê Sam,

Sam kurê Narîman,

Narîman kurê Qereman.

an jî:

Rustemê Zal,

Zalê Dal,

Dalê Kam,

Kamê Sam,

Samê Narîman,

Narîmanê Qereman ”⁹⁹

Yek ji xalên ku derbarê destana Rustemê Zal de herî zêde tê nîqaşkirin têkiliya wê destanê ya bi çand û nasnameya kurdî ye. Di nav vegotinên kurdî de destana Rustemê Zal pir naskirî ye û gelek guhartoyên vê berhemê li deverên cihê û bi motif û honakên rengîn tînin vegotin. Dîsa jî divê bê gotin ku çend niqte hene ku wê çîrokê bi awayekî ji kurdan bi dûr dixin, an jî wisa dikare bê ravekirin. Ew jî; yek, ew destan wek Memê Alan, Zembîlfroş, Xanê Lepzêrîn bi serê xwe nebûye mijara helbestên şairên klasîk ên kurd –ji bilî kelimên yarsanan; her wisa serpêhatiyên Rustem bêtir wek çîrokek di nav Şahnameya Firdewsî de hatiye zanîn, lê berovajî vê Şahnameya Kurdî zêde nehatiye zanîn ku çîrokên derbarê Rustem bi awayekî berfireh tê de cih digirin; erdnîgariya ku serpêhatî lê diqewimin, wek Îran, Hindistan û deverên nêzikî Afxanistana îro ji welatê kurdan dûr in. Lê Heciyê Cindî di vê meselê de pir qanih xuya dike:

*“Rustemê Zal ber dilê kurda ewqasî ezîz û navdar e, ku çend qebilên kurda niha jî xwe wek zureta (peyhatîyên) ewî mêrxasê navdar dihesibînin. Rustemê Zal û endamên malbata wî Zal, Bêjen, Gêvo, Guhderz û yên mayîn di efrandinên kurda yên sedsalên navîn û dema nû da wek mêrxasên milletîyê tene bîranîne.”*¹⁰⁰

Kurdên yarsan girîngiyeke dîtir dane Rustem û li ser wî gelek kelimên ristine. Wan Rustem ji asta lehengiyê bilind kirine ta asteke pîrozwer. Di mîtolojiya îranî de jî Rustem wek hemrazê padişahan tê dîtin, lê di kevneşopiya yarsanan de bi girtina nasnameya Pîr Binyamîn, ew Rêber e, hemraz e û alîkarê Hezkirî ye, ango yê Xwedê ye.¹⁰¹

Vali di heman demê de balê dikişîne ser pirrengiya şayesandina Rustem a li nav berhemên yarsanan : “Şer û aliyên lehengî yên kesayeta Rustem di edebiyata yarsanan de nehatiye jibîrkirin. Kelambêj di gelek kelimên xwe de behsa Rustem dikin ku

⁹⁹ bnr. <http://krd.riataza.com/2015/11/14/saxen-destana-rosteme-zal/>

¹⁰⁰ bnr. beşa pêşgotinê ya Şaxên Destana Rostemê Zal, <http://krd.riataza.com/2015/11/14/saxen-destana-rosteme-zal/>

¹⁰¹ Vali, **h.b.**

lehengek tenê ye, bêhempa ye û nayê têkbirin, sahibê Zulfiqar e di şerê pîroz de, li dijî yên xirab û bê dînan e.”¹⁰²

Gelo cihgirtina destanê ya di Şahnameya Firdewsî de dikare wek diyardeyek ku kurdbûna wê lawaz dike bê nirxandin? Ji bo ku derfetên bersivêkê çêbin divê mirov çend gotinan li ser destana Rustemê Zal û Şahnameya Firdewsî bibêje. Her wekî Cindî jî destnîşan dike çend şaxên destana Rustemê Zal di *Şahnameya Firdewsîyê fars-tacik* de hene ku qala qehremaniyên Rustemê dikin. Firdewsî ji zargotina gelê îranî gelek tiştan werdigire her ku wê şahesera xwe diafirîne. Ew ji mîrateya hemû gelên îranî, heta ji yên ne îranî jî, sûd werdigire.¹⁰³ Ji wan nêrînên Cindî diyar dibe ku fars-tacikbûna Firdewsî bê guman nirxeke kulturî bispêre wê destana navborî jî, axiriyê bi serê xwe nabe îspata nasnameya wê.

Ji hêla din ve Şahnameya Firdewsî ne tekane çavkanî ye ku destana Rustemê Zal tê de derbas dibe. Shahab Vali di ‘Nêrîneke Giştî li Şahnameya Firdewsî û Şahnameya Kurdî’ de her du Şahnameyan berawirdî hev dike. Valî cihê bijarte yê Şahnameya Firdewsî dikirpîne, her ku wê wek pirtûka herî navdar a li ser çanda cîhana îranî dinirxîne.¹⁰⁴ Valî jî her wekî Cindî balê dikişîne ser mirateya hemû gelên îranî ku Firdewsî sûd jê wergirtiye.

Firdewsî li ser destan û mîtolojiya gelên îranî xebitiye, guhdariya çîrokên pîr û kalên Xorasanê kiriye, destnivîsên kevn ên pehlewî kom kirine. Û çavkaniyên wî jî Edebiyata Avestayî, Edebiyata Madî, Edebiyata Farisî ya Kevn û Navîn e.¹⁰⁵ Di Şahnameya Firdewsî de çîrokên destankî, mîtolojîk û dîrokî hene û pirtûk bi sê beşan parve dibe; beşa mîtolojîk, beşa lehengî, û beşa dîrokî.¹⁰⁶

¹⁰² **h.b.**

¹⁰³ bnr. beşa pêşgotinê ya Şaxên Destana Rostemê Zal, <http://krd.riataza.com/2015/11/14/saxen-destana-rosteme-zal/>

¹⁰⁴ Shahab Vali, “Nêrîneke Giştî li Şahnameya Firdewsî û Şahnameya Kurdî”, di nav Pertev Ramazan (amadekar), *Edebiyata Kurdî ya Gelêrî*, Avesta, 2015, İstanbul, r. 276

¹⁰⁵ **h.g.**, rr. 276-279

¹⁰⁶ **h.g.**, r. 284

“Divê em vê niqteyê diyar bikin ku gotegota Şahnameya Firdewsî, gotegota taybet a Firdewsî ye ku ji çîrokên destanî û mîtolojîkî yê qewmên curbicur ên erdnîgariya Îranî pêk tê. Ji ber vê ye ku gotegota cuda û cihêwazî yê çîrokên destanî di nav qewmên îranî de gelek in. Yanî her qewm, versiyona xwe ya taybet a van çîrokan heye. Wek mînak Şahnameya Lekî yan Şahnameya Bextiyarî û Şahnameya Kurdî.”¹⁰⁷

Her çî Şahnameya Kurdî ye, ew berhem yek ji çavkaniyên herî girîng a çanda kurdî ye, lê nivîskarên wê piranî ne diyar in û lewma jî wek tekstên anonîm tî qebûl kirin. Çavkaniyên wê edebiyata îranî ya berî û piştî îslamê –bi taybetî jî metnên edebiyata avestayî– edebiyata devkî û edebiyata dînî ya kurdên yarsan û êzdî ne.¹⁰⁸ Şahnameya Kurdî li gor naveroka xwe bi sê beşan ve parve dibe.

Beşa yekem beşa mîtolojîk-lehengî ye ku tê de qala serpêhatiyên padîşah û lehengan tê kirin. Padîşah û leheng wek du karakterên sereke tê de cih digirin. Padîşah û lehengên terefê başiyê û yê terefê nebaşiyê hene, her wekî peywenda gerdûnî ya dîne zerdeştîyê li ser wan ferz dike, ew timî li dijî hev di şer û tekoşînê de ne. Beşa duyem a Şahnameya Kurdî derbarê kesayetên dînî ne. Ê beşa sêyem jî ji destanan pêk tê ku mijarên wan cengawerî, egîdî û evîndariya pelewên eşîrên kurdan e.¹⁰⁹

Çîrokên di nav Şahnameya Kurdî de cih digirin piranî derbarê serpêhatiyên Rustem in, wek Rustem û Şegad, Rustem û Dewê Spî, Seqlab Dêw û Rustemê Zal, Rustem û Keyê Kuzad û hwd. Her wiha çîrokên leheng û padîşahên din ên ku di dîroka gelên îranî de navdar in jî tê de derbas dibin. Di Şahnameya Kurdî de çîrokên ku di Şahnameya Firdewsî de cih nagirin jî hene, ku ew jî resenbûna Şahnameya Kurdî nîşan dide.¹¹⁰

¹⁰⁷ **h.**

¹⁰⁸ **h.g.**, rr. 286-287

¹⁰⁹ **h.g.**, rr. 289-291

¹¹⁰ **h.g.**, rr. 292-293

Heciyê Cindî derheqê têkiliya Firdewsî û destana Rustemê Zal de qenaeta xwe ya dawî wiha têne ziman:

“Lê di nav kurda da serpêhatîyên derheqa Rustem da yên usa rast tîn, ku bi xusûsîyetên xweva ji “Şahname”yê gelekî dûr in. Di van şerta da em nikarin tesdîq bikin, ku ew perçên şaxa ji erfandinên Fîrdoûsî hatine hildan. Lê tişteke ji sedî sed e, ku hinek ji wana paşdemê da ser da hatine zêdekirinê, hinek ji wana jî dibe berî nivîsara “Şahname”yê hebûne. Dibe jî çend malûmatîyên derheqa Rustemê Zal da, ku berê da di nav kurda da hebûne, Fîrdoûsî bi kar anîye, an jî şair bi xwe dikaribû derheqa wan da bizanibûya û dema nivîsara perçên derheqa Rustem da, şaxên kurdî jî bi kar anîye, hela dibe ew şax bi zmanê kurdî jî bihîstibe, ji ber ku kurdî nêzîkî farisî ye.”¹¹¹

Rustem şexsiyetê herî girîng û hêja yê Şahnameya Firdewsî ye. Şahnamê navê Rustem wek pehlewane herî mezin û bihêz ê cihanê bi tevahiya cihanê re da naskirin. Serpêhatiyên Rustem ên li Şahnamê ji wan bûyeran pêk tîn: Şerê bi Efrasiyab, Şerê Mazenderanê, Şerê Hamaveranê, Nêçîra li nav daristana Efrasiyab, Çîroka Rustem û Sohrab, Tolhildana Siyavuş, Rizgarkirina Bîjen, Kuştina Dêw Ekvan.¹¹²

Valî, berovajî cudakirina Raglan a wek lehenge kevneşopiyê û lehenge dîrokî, Rustem bi wesfên guherbar dinimîne, bes pêşekiyê dide xasyeta wî ya mîtik.

“Bi gelemperî di cihana îranî de, Rustem semboleke mîtolojîk e û ne kesayetekî dîrokî ye. Digel vê fikrê ku di nav Sekkayan de, wextekî lehengekî bi navê Rustem hebûye, ku bi demê re bûye kesekî derxwezayî û modelekî nuwaze di cihana pir sirrî ya mîtolojiyê de. Di vê rewşê de, mirov dikare bêje ku ew kesayetekî dîrokî

¹¹¹ bnr. beşa pêşgotinê ya Şaxên Destana Rostemê Zal, <http://krd.riataza.com/2015/11/14/saxen-destana-rosteme-zal/>

¹¹² Seccat Aydınlu, **Firdevsi'nin Şahname'sinde Kürtler**, Avesta, Stembol, 2011, r. 87

ye, lê belê wexta ku di nav çîrokên netewî de cih digre, wê çaxê dibe figurekî epîk."¹¹³

Piştî wan nirxandinan tev reng e ku hin tişt derbarê nasname û aîdbûna destana Rustemê Zal de bêtir zelal bûn. Hem Heciyê Cindî û hem jî Shahab Valî vê çîrokê li gel nîşandekên vegotinî/metnî, dîrokî û mîtk, di nav kelepura kurdî de bi cih dikin. Rast e ku Şahnameya Kurdî li gor ya Farsî kêmtir tê zanîn û ew jî derbarê mijarê de dibe sedemê şîrovevên yekalî û netimam.

Heciyê Cindî di pêşgotina xwe de her wiha balê dikişîne ser çend xalên balkêş ên destanê. Yek ji wan xewa heft rojan e ku lehengên dikevin wê xewê hem rehet dibin û hem jî birînên wan qenc dibin û ji bo şer û cengê zindî dibin. Vêca xewa heft rojan wek diyardeyeke vejînê dikare bê şîrovekirin. Xewn jî derbarê bûyerên pêşerojê pêşbîniyan didin leheng.¹¹⁴

Dîsa du heyberên din, rexşê belek û teyrê sîmirx, hene ku Heciyê Cindî fonksiyona wan a alîkar dikirpîne û wan têkildarî dîne êzdayetiyê şîrove dike. Rexşê Belek alîkarê sereke yê Rustem e û hespekî pir şareza ye. Teyrê sîmirx jî wek teyrê hawariyê miraz û hêwiyên qencan tîne cih. Bi wan angaştan û hin nimûneyên din jî destanê bi hêmanên beriya îslamê ve girê dide.

Her wiha kuştina Rustem a kurê wî jî xaleke balkêş a wê destanê ye. Wêjeya cîhanê bêtir bi çîrokên kuştina kur a bavê xwe mijûl bûye. Ev jî bêtir bi bandora xebatên Freud ên li ser Qral Oedîpus çêbûye ku wek kompleksa Oedîpus di termînolojiya Psîkanalîzmê de cih girtiye. Di Destana Rustemê Zal de em rastî rewşeke berovajî, an ku kuştina kur a bi destê bav tîne. Di piraniya guhartoyan de bav û kur hev nas nakin, jixwe bûyer û armanca hin şexsiyetên bibandor ên nav çîrokê jî li ser vê nenaskirinê ava bûye. Dîsa jî mijara ji hev beledbûnê tê niqaşkirin. Aydinlu radigîne ku hin lêkolîner di vê

¹¹³ Valî, **Şahnameya Kurdî 1**, h.

¹¹⁴ bnr. beşa pêşgotinê ya Şaxên Destana Rostemê Zal, <http://krd.riataza.com/2015/11/14/saxen-destana-rosteme-zal/>

baweriyê de ne ku Rustem bi zanetî kurê xwe kuştiye. Wî hezkirina ewladê xwe kiriye qurbanê armanca xwe.¹¹⁵

Mînakên kuştina bav a kurê xwe, bi qasî Oedîpus naskirî nebin jî, di wêjeya cîhanê de cih digirin. Yek ji wan Hildebrandslied'a çîroka Almanî ye¹¹⁶, ku tê de Hildebrand ji kurê xwe Hadubrand re xwe aşkera dike û lê kurê wî jê bawer nake û vê yekê wek hîle difikire. Di dawiyê de Hildebrand kurê xwe di meydana şer de dikuje.

Derbarê mirin/kuştina Rustem bi xwe de jî Vali agahiyên li jêr neql dike:

“Li gorî rivayeta Şahnameyê, Rustem gelek dirêj jiya û di vê jiyana xwe de bi gelek leheng û dêwan re şer kir. Wî ne Erjeng, ne Dêwê Spî, ne Sence, ne Owladê kurê Qendî ne jî Bîd li vê cîhanê hişt. Di şehsed salan de, ew siwariyê herî hêzdar ê cîhanê bû. Dîsa jî jiyana wî wekî kesan bi dawî bû. Gelek çîrok hene li ser mirina Rustem. Li gorî Dîneverî, piştî ku Rustem Îsfendiyar kuşt, vegeriya mala xwe û piştî demeke kurt mir. Mes’ûdî dibêje, Rustem û Zal gelek caran şer kir hemberî Behmenê kurê Îsfendiyar û piştî her du jî hatin kuştin. Di Şahnameyê de, Şeqadê birayê Rustem ku ji cariyeyekê hatiye dinyayê, çalekê amade kiriye û Rustem li wir hatiye kuştin.”¹¹⁷

Giranbûna qîmeta vê berhemê ne tene ji ber xasyetên li jor e, bes ew berhem di heman demê de xwedî estetîkek bilind e jî, her wekî Heciyê Cindî destnîşan dike:

“Şaxên kurdî yên “Rustemê Zal” di hêla bedewîya lîteratûrîyê da gelek dagirtî ne. Fikirên aqilmend, helbestvaniya sade û xurt, hevokên lihevhatî, dewlemendîya zimên, gotinên pêşîyan yên kûrfikir, rewşeke kaw û xemleke bedew didine evê destanê.”¹¹⁸

¹¹⁵ Aydınlu, **h.b.** r. 33

¹¹⁶ <https://quatr.us/northern-europe/hildebrandsleid-tragic-story.htm/12/09/2017/>

¹¹⁷ Vali, Shahab, **h.b.**

¹¹⁸ bnr. beşa pêşgotinê ya Şaxên Destana Rostemê Zal, <http://krd.riataza.com/2015/11/14/saxen-destana-rosteme-zal/>

3.1.1. Di Çarçoveya Qonaxên Joseph Campbell De Serpêhatiya Rustemê Zal

Qonaxa yekem, *gaziya ji bo serpêhatiyê*: Ji bo pehlewaneke wêk Rustem, her wisa ji bo kal û bavên wî Zal, Sam û yên beriya wan, gaziya bo serpêhatiyê bi çend awayan pêk tê. An bi bûyereke ku dema derdikeve nêçire diqewime, û bi rûdanên bi vê bûyerê re têkildar; an bi hawara ku ji paytextê keyaniyê tê, ku çî carî serê padîşahê îraniyan bi dijminan re bikeve belayê zûka xwe davêjin ber bextê mala Zal; an jî hesabeke kevn ê wek tolhildan an jî şereke taloqdayî wê fonksiyona gaziya serpêhatiyê tîne cih.

Di epîsoda bi navê *Zarotî û Şerê Rustem* a Cindî de Rustemê xort ê nûgihîştî gava ku nêçîrê dike peywîrek jê re tê spartin.

“Zal go: -Dewatê bikin, dewat bê zeva nabe, go, yekî verêkin padşê me bînin, bira rûnî ser textê xwe, emê jî şer bikin. Go, lê em kê pey padşê verêkin?”

Mêhrabê Qabilê go: -Tu destûra min bide, yek heye, ezê bişînim.

Zal go: -Tuyê kê bişînî?

Go: -Ezê Rustemê xwarzîyê xwe bişînim.

Go, Rustem jî tîr-kevanê xwe hildabû, çûbû bo xwe çivîk dikuşt. Go, gazî Rustem kirin, anîn dîwanê.”¹¹⁹

Ji vê jêgirtinê diyar dibe ku Mêhrab wek peyamnêr gaziya serpêhatiyê digihîne Rustem. Rustemê ku li nêçîrê dema xwe bi dilxweşî derbas dike wek li cîhana xwe ya edetî be û bi şixulên xwe yê binas tê pêşkêşkirin. Bi gavavêtina nav dîwanê re jî peywîr jê re tê ragihandin. Rustem di vê epîsodê de ji bo anîna padişah ber bi wareke bixetere û nenas tê birêkirin.

¹¹⁹ bnr. <http://krd.riataza.com/2016/06/12/zaroti-u-sere-rostem/>

Qonaxa duyem, *redkirina serpêhatiyê*: Rustem lehengê gel û parastvanê keysariyê ye. Serboriyên wî, wek lehengê gel, timî ji bo peywîrên miletî ye. Lewma di vê peywendê de redkirin gengaz nîne. Ew gelek caran ji bo sererastkirina xeletiyên Keykavus gurzê xwe hildide, li Rexşê Belek suwar dibe û dide meydanê. Jixwe ew xeletiyên Keykavus ku bi xwe re bobelatan tîne serê welatê îranê pir in, bo nimûne ew diçe şerê dêwan lê axiriyê dîl dikeve destê wan, Siyawuş dişîne şerê tûraniyan û dibe bayîsê wî û hwd.¹²⁰ Vêca ji ber xudanê xeletiyên û girîngiya wan redkirina wan mimkun nabe.

Lê carinan Rustem ji ber sedemên cihê biryara xwe ya derketina serpêhatiyê bi derengî dide, heta piştî dilsarbûna xwe ya li hember keysar sond dixwe ku careke din neçe hawariya wî, bes dawiyê dîsa erka ser milê xwe bi cih tîne. Di epîsoda *Zarotî û Şerê Rustem* de Rustem sê caran peywîrê red dike. Cara yekem cilûbergê xwe yê kevn dike hincet. Piştî ku cilûbergên nû lê dikin, vê carê jî hespekî dixwaze, û axiriyê jî çûna destvala qebûl nake û lewma gurzê kalê wî Sam didinê.

“Go: -Hela vê ecêbê, hûn qe darekî nadine min, ku ez bigirme destê xwe, herim? Zal go: -Herin, gurzê Samê nîşanî wî din: eger hilanî, ew kêrî şera tê, heger hilnanî, ew kêrî şera nayê. Go, eva çil sale Sam mirîye, ji pelewana kes nikare gurzê wî hilîne.

Gurzê Sam biribûn avêtibûn mxazê. Go, dema nîşanî Rustem dan, Rustem destek avêt, hilanî, go:

-Maşela, xweş gurze, lê pênsid xundkar jê kême.”¹²¹

Qonaxa sêyem, *alîkariya dersiruştî*: Di heman epîsodê de, diyar dibe ku textê padişahiye ketiye destê tûraniyan. Rustem ji bo ku peyama Zal û dostên wî bigihîne padişahê wan tê peywîrdarkirin. Di vê epîsodê de behsa çîroka hespê wî Rexşê Belek jî

¹²⁰ Aydınlu, **h.b.**, r. 87

¹²¹ bnr. <http://krd.riataza.com/2016/06/12/zaroti-u-sere-rostem/>

derbas dibe. Vêca Rustem li Rexşê belek suwar dibe û di rê de rastî nalbendekî tê û jê dixwaze ku simên Rexşê Belek nal bike.

“Go: -Wekî usane, were em herine mal, hespê min nalke.

Go: -Yê malêye nayêm, lê bîne hespê xwe liha nalkim.

Go: -Bapîr, xwadê ji te razî, hespê min hespekî hure, em nikarin liha nalkin.

Go: -Ne, Rustem, tu pelewanekî jêhatîyî, tu pîyê hespê xwe hilîne, ezê nalkim.

Go, Rustem herdu destê avît pîyê Rexşê-Belek, kir û nekir, xûdanêda unda bû, nikaribû pîyê Rexşê-Belek rakira. Ranekir, go:

-Mamo, sed pelewan nikarin lingê Rexşê-Belek rakin, ez tenê nikarim rakim.

Kalê got: -Sergema hespê xwe bigire, ezê ji tera nalkim.

Go, Rustem gema hespê xwe girt, kalê dema dest da pîya, hema pîyê xwe hilanî ber wî. Li wê nalkir. ”¹²²

Ji îtaeta Rexşê Belek –her wekî Bozê Rewan ew jî hespekî pîroz e û ji binê deryayê derhatiye– xuya dibe ku ew mirov ji nalbendekî bêtir e. Xwedî hêzên dersuriştî ye. Lewma nalê Rexşê Belek ê heta hetayê di siman de bimînin. Her wisa ew nalbend pêşbîniya temenê Rustem û nîşaneyên mirina wî jî dike:

“Çi dema nal û bizmarê hespê min bikevin, me banîya, te ji minra nal bikira.

Nalbend go: -Çi dema nal û bizmarê hespê te bikeve, xwadê tiala emenetê xwe wê ji te bistîne, wextê te tamam dibe.

Dema wa go, Rustem enirî, dest gema Rexşê-Belek berda, enirî.

Nalbend go: -Te çima berda?

¹²² bnr. <http://krd.riataza.com/2016/06/12/zaroti-u-sere-rostem/>

Go: -Xwadê ji te razî, nal-bizmarê hespê pelewanan, çiqê bimîne du hîva, sê hîva, ez pelewaneke xurtim, hespê min jî hespekî hure, wekî usane, ezê herim mala xwe, heta xwadê tiala emanetê xwe distîne.

Dema wa go, nalbend go:

*-Rustem, tuyê hezar pêncsid salî emir bikî, nal-bizmarê hespê te nakevin.*¹²³

Bi vî awayî kalê nalbend hem Rexşê Belek amade dike da ku di tevahiya serpêhatiyên Rustem de jê re bibe alîkar û hem jî ji Rustem re dirêjîya temenê wî dibêje, ku temenek dût î dirêj e, û baweriyeke nemirbûnê ya bi sedan salan didê. Dîsa di heman epîsodê de Zal ji teyrê Sîmirx dixwaze ku Rexşê Belek bidedilîne, û ew jî lê suwar dibe, sê roj û sê şevan li çiyên digêrîne ta ku heywan diedile. Ew jî dikare wek nimûneyeke alîkariya dersirûştî bê nixandin.

Rustem di çîroka Heft Xanê Rustem de agahî û pêşniyarên girîng ji kalikê xwe Zal werdigire. Zal, wek Xocê Xidir û Zîna keça Beko yê di Mem û Zîn de, pêşbîniya bûyerên pêşerojê dike û rêya serpêhatiya wî ronî dike. Ev alîkarî yekser ji çavkaniyeke dersirûştî neyê jî –lewre Zal bi xwe jî karakterek binas e– xwedî xasyetên dersirûştî ne. Li jêr Zal pênasêya du rêyên cuda dide Rustem ku her du ber bi Mazenderanê diçin:

“Zal vat ey ferzend ta Mazenderan

Du rê hen perî gozer ne Heftxan

Yek rê îmênin ce xof û xeter

Çil şevane ro tûlkişî sefer

Rê duyem rage yê cadugeran hen

Mawayê ejdeha û şêr û dêwan hen

¹²³ bnr. <http://krd.riataza.com/2016/06/12/zaroti-u-sere-rostem/>

Ne min xastirin ne î rê pir xeter

Tu ve yêk hefte bikerî gozer

Er Yezdanê pak firset bidû pêyet

Ce ejdeha û şêr û her çi han ne rê yet”¹²⁴

Qonaxa çarem, *derbasbûna ji dergehê yekem*: Di epîsoda *Rustemê Zal û Feremezê Kurê Wî* de qonaxa derbasbûnê wek:

“Rabûn çûn, tûle xwera birin. Hatine topraxa dêwê Sor: kevirê topraxê gişkî sore, ava wê sore.”¹²⁵

Di epîsoda *Rustemê Zal Diçe Çînistanê* de:

“Rustem ew pelewan hilda, terkeselî dinê bû. Çûn. Pir çûn, hindik çûn, çûne bajarekî...”¹²⁶

Di epîsoda *Zal, Êşengî Şa û Rustem* de jî ew qonax wiha hatiye pênasekirin:

“Rustem xwarzîyê xwe hilda, kete rê û çû. Pir çû, hindik çû, wextekê nihêrî erdekî rastî dûze, zozaneke blinde xweşe.”¹²⁷

Di qonaxa derbasbûna ji dergehê yekem de piştî ku leheng derbasî nav cîhana deredetî dibe, di pey re rastî parastvanê dergehê tê ku ji bo domandina serpêhatiyê divê bi wî parastvanî re li hev bê. Ev qonax peyvenda bûyera sereke jî ava dike. Li jêr nimûneyek ji bo rasthatina leheng a bi dergehê û parastvanê dergehê hatiye pêşkêşkirin:

“Rustem berê xwe da çiyê, çû. Pir çû, hindik çû-derket serê çiyê, nihêrî rê serê çiyê berjêr diçe: rê çû kete hundurê gelîkî kûr-dengê evd, însan têda naê, zef-zef

¹²⁴ Valî, **h.b.**

¹²⁵ bnr. <http://krd.riataza.com/2017/05/07/rostone-zal-u-feremeze-kure-wi-1/>

¹²⁶ bnr. <http://krd.riataza.com/2016/08/14/rostem-dice-cinistane/>

¹²⁷ bnr. <http://krd.riataza.com/2016/03/17/zal-usengi-sa-u-rostem/>

kûre. Lênihêrî ji mixarekê dû hildikişe. Çû ber derê mixarê, lê nihêrî zare-zarek, dengê girî ji hundur tê. Rustem çû hundur, lê nihêrî keçik girêdaye. Keçik çev bi Rustem ket, kire qîrîn, got:

-Dibe tu merîyê mala bavê min bî, li dû min hatî?

Rustem got: -hilbet, ez merîyê mala weme, li dû te hatime, seva te.

Keçikê hilda got: -Zef qalim xeber mede, dêw razaye, wê rabe min bikûje, te jî serda.

Rustem go: -Mexsûs ez bona kuştina dêw hatime: yan ezê dêw bikujim, yan ewê min bikuje, de cî nîşanî minde, çika li kederêye?

Keçikê go: -Ha li wî dergê handaye, derê han veke, xwera têda razaye. ”¹²⁸

Qonaxa pêncem, *zikê nehengê*: Rustem, û heta di epîsodekê de kurê wî Feramez, ji bo kuştina ejderhayê qefesekê çêdikin û dikevin hundirê wê. Li bendê dimînin ku ejderha wê qefesê daqurtîne û bi vî awayî jî ew bikevin nav zikê wê û pê re jî wê bikujin.

Ew bûyer di çîrokên din ên îranî de jî tîn dîtin. Bi awayekî ew rewş qonaxa zikê nehengê ya Campbell tîne hişê mirov. Lehengê ku bi awayekî zindî dikeve ciheke wisa ku ancax yekî ku ji hêla cinawirekê bê kuştin têkevê. Bi daqurtandinê re her wekî mirî tê ravekirin, lê piştî lehengê serketî çermê cinawirê didirîne û bi şiklekî zindî jê derdikeve, her wekî vejyabe. Ev motîf di çarçoveya daxwaza vegera nav malzarokê jî dikare bê nirxandin.

Qonaxa şeşem, *rêya ceribandinan*: Ceribandinên sereke ji bo Rustem şerê li dijî pehlewaniyê din û şerê li dijî dêw û ejderhayan e. Efrasiyab reqîbê herî bihêz e. Hem li Avestayê û hem jî li edebiyata pehlewî ew wek şexsiyetekî efsaneyî û ji zumreya dêw û

¹²⁸ bnr. <http://krd.riataza.com/2016/03/17/zal-usengi-sa-u-rostem/>

ejderhayan tê qebûlkin. Zal pesnê wî wek pehlewaneke mezin dide kurê xwe Rustem û derbarê hêz û şiyânên wî kurê xwe hişyar dike.¹²⁹ Şerê li dijî Efrasiyab ne tenê ji bo Rustem bes bo piraniya lehengên îranî peywîr/mecburiyeta sereke ye. Bi domana demê re navên lehengên îranî yên nav çîrokên piranî diguherin, lê Efrasiyab tim li cihê xwe ye, her wekî dijberê abadîn tim amadeyê şer e. Li jêr sehneyek şerê Rustem û Efrasiyab hatiye pênasekirin:

“Rustem gote Zalê, go; -Ezê herim ser padşê wan.

Go, -Rustem, Rexşê-Belek siyar bû, gurz û kelbend avête milê xwe, ajot, teng û şîrît qetand, çû guhê piştê çadira padşê wan girt. Elfesîyab girt anî. Elfesîyab kire gazî, go:

-Hinan, ez birim. Weysî, were, ez birim, Qereman, ez birim.

Heyşt pelewane bijare dora Rustem hatine hev. Rustem ji dest hilanî, ket. Milekî Elfesîyabê da ber gurzê wan, milek gurzê xwe da ber gurzê wan, go, haqa gurz li Elfesîyab dan, laşê Elfesîyabê reşe hêşîn kirin. Elfesîyab go:

-Hinan, Weysî, we ez ber derba kuştim.

Pelewane xurt Hinan û Weysî bûn. Rustem yek destî bû, wana bada Elfesîyab ji destê Rustem derxist.”¹³⁰

Her çi ejderha û mar in; li gor baweriyên rojhilata navîn mar ber bi dawiya emrê xwe dibin ejderha. Ejderha jî temsîldariya Ehrîmen dikan. Ehrîmen di şerê xwe yê li dijî Ronahiyê de dikeve şiklê maran û êrîşê dike.¹³¹ Yek ji ceribandînan herî dijwar ê ji bo Rustem şerê wî yê li hember Dêwê Mazenderanê ye. Ew dêw jî wek dêwên din ên nav çîrokên îranî xwedî xasyetên mirovan e. Dêwên di serpêhatiyên Rustem de derdikevin

¹²⁹ Aydınlu, **h.b.**, rr. 92-93

¹³⁰ bnr. <http://krd.riataza.com/2016/06/12/zaroti-u-sere-rostem/>

¹³¹ Aydınlu, **h.b.**, r. 110

pêş wî û yê di çîrokên din de wek mirovan xwedî nav in, dipeyivin, pîlanan çêdikin û ji hunerên şer beled in.¹³²

Di çîroka Heft Xanê Rustem de heft qonaxên serpêhatiya Rustem a ber bi Mazenderanê dikare wek bûyerên di *rêya ceribandinan* de bîn nirxandin. Heft xan (qonax) bi dorê ew in: xanê yekem *hespê Rustem rexş şerê şêr dike*; xanê duyem *Rustem avê peyde dike*; xanê sêyem *Rustem ejdehêr dikuje*; xanê çarem *Rustem cadûgerê dikuje*; xanê pêncem *Rustem Ovlad zeft dike*; xanê şeşem *Rustem êrîşî Erjeng Dêw dike û wî dikuje*; û xanê heftem *Rustem Dêwê Spî dikuje*.¹³³

Efrasiyab, li gel dêw, cinawir, mar û heyberên din, wek temsîla binhişê, hêza tarî û mirinê li hember hewldana Rustem disekinin. Rasthatina bi wan û tekoşîn û ceribandinên dijî wan tev hêmanên pêwîst in ji bo timamkirina serpêhatiyê. Bêyî rasthatin û tekoşîna li dijî wan têkalaviya ronahî û tarîtiyê, mirin û jiyane, hiş û binhişê çênabe.

Qonaxa heftem, *rasthatina li gel xwedawendê*: Yek ji epîsodên berhevkarîyên Heciyê Cindî bi navê *Rûdeve* hatiye tomarkirin. Rûdabe şexsiyetek sereke ya vê beşê ye. Ev beş bi çîroka navê Rûdabê û bi pesnê wê dest pê dike:

*“Qîzeke Selmîyanî Sindî hebû, ku pelewana pê nikaribû. Ew rojekê çû mêşe, dar çinî, danî ser şirîta xwe. Çîqekî dara li sûretê wê ket. Zef xirab lê ket, sûretê wê qelaşt. Sûretê xwe pêça, darê xwe hilgirt anî malê. Ji şerma du-sê roja rû bi bavê xwe ne ket.”*¹³⁴

Piştî ku ji gotinên bavê xwe dixeyide, Rûdabe cilûbergên pehlewaniyê li xwe dike û diçe şerê Zal. Çîrok bi bûyerên wek rasthatin û şerê dijwar ê navbera Zal û Rûdabê, sedema têkçûna Rûdabê, encama şerê wan, zewaca wan û şêweya zarokanîna Rûdabê, ku parxanê rastê diqelişînin da ku zaroka wê derkeve, û hwd didomîne.

¹³² **h.b.**, r. 71

¹³³ Vali, **h.b.**

¹³⁴ bnr. <http://krd.riataza.com/2017/04/16/berhemeke-folklor-a-kurmanciye-rudeve/>

Di vê beşê de xaleke balkêş ew e ku lawaziya ji ber hebûna memikan wek lawaziyeke siruştî hatiye destnîşankirin:

“Heta berîya êvarê şer kirin. Zal dîna xwe dayê zor dayê, wê Zal bavêje. Qewata çil fêrizî li Zal zêde bû. Dest avîte çîçikê wê. Ew ji çîçikê xweda qels bû. Zal ew li erdê xist. Şûr kişand serê wê lêxe.”¹³⁵

Rûdabe wek jina Zal û dayîka Rustem a pehlewana xisleteke girîng a çavkaniya hêza wan her du bav û kurên pehlewana e. Rûdabe, ku di pehlewaniyê de ne kêmtir Zal e, jêderka hêza Rustem e. Hêza Rustem bi pehlewana bav û pehlewana dê dupat dibe. Ew, her wekî gotina Campbell, Dayîka Kozmîk e, an ku parastvanê kurê xwe yê leheng e.

Qonaxa heştem, *jina fêtkar*: Beşa sêyan a berhema Nezîr Ocek, *Tayê Sêyan a Destana Rustemê Zal*, bi çîroka Siyawuş dest pê dike. Di çîroka Siyawuş de, ku Rustem ji bo tolhildanê têkilî nav bûyeran dibe, em rastî du jinên fêtkar tên.

“Li welatê Îranê şahekî bi navê Keykawîs hebû. Temenê şahî pê de çûbû û pîr bibû. Keykawîs Şah di wî temenê xwe yê pîrbûniyê de jineke ciwan ji xwe re tîne. Şahî Kurek ji jina xwe ya mezin hebû. Navê kurê wî Siyawîş bû. Siyawîş lawekî pîr jîr, jêhatî, çeleng, spehî û zana bû. Dilê jinabava Siyawîşî dikeviyê. Jinbava wî li keysekî digeriya ka dê bi çi awayî xwe bigihîjine Siyawîşî da ku merema dil xwe bi cih bîne.”¹³⁶

Jina fêtkar a din jî jina Efrasiyab e, ku ew jî ji ber bedewbûna wî dibe dilketiyê Siyawuş. Her du jin jî, her ku nagihîjin armanca xwe, Siyawuş tawanbar dikin û dibin bayîsê bûyerên xirab û dawiyê jî Siyawuş tê kuştin. Di hin guhartoyan de rola ku ew jinên fêtkar dileyizin li şûna karakterên mêr tê bicihanîn. Ew motîf di gelek çîrokên din de, wek çîroka Yûsif û Zelîxayê, tê dîtin. Ji bilî vê jî behsa çend jinên din derbas dibe (jinên bêyî nav) ku mêrên xwe qanî dikin da ku keça xwe bi Rustem re bizewicînin.

¹³⁵ bnr. <http://krd.riataza.com/2017/04/16/berhemeke-folklor-kurmanciye-rudeve/>

¹³⁶ Nezîr Ocek, **Destana Rostemê Zal**, (berhema neçapkirî).

Mirov dikare vê niyeta wan jî wek kareke fêtkarî binirxîne ku pê dixwazin leheng ji rêka wî bizivirînin.

Qonaxa nehem, *lihevhatina bi bav re*: Di epîsoda *Rustemê Zal û Feremezê Kurê Wî* de Feremez ji bo demeke dirêj bapîrê xwe Zal wek bavê xwe dizane.

“Kurekî Rustem hebû, navê wî Feremez. Wexta Perwande Rustem bir, Feremez çûk bû. Zalê gote mala xwe: -Feremez neyî başere, nefehme, nevêjin-tu kurê Rustemî, bêjin tu kurê Zalêyî. Hê zaroye, hûn bêjin-tu kurê Rustemî, wê pey qaçaxa bavê xwe keve. Qewata wî nagihîje gurza, gurzê dehwê. Perwandeyê wê Feremez bikujin: bizane koka mala Zalê wê ji dinyayê biqe. ”¹³⁷

Feremez rastiya ku jê hatiye veşartin hîn dibe û doza serpêhatiyê dike. Zalê kalikê wî şertek pê re daniye ku divê bikaribe gurzê giran ji erdê derxîne. Bi vê şiyana xwe di destpêka serpêhatiya de xwe bi jêderka hêzê dide qebûlkirin. Şertê kalikê wî zal û gurzê li erdê çik-bûyî sembola hêzê ne ku di bin taserufa bav de ne.

Her wiha lêgerîna Sohrab a li bavê xwe, mereqa wî û her wiha tirsê wî ya ji bavê xwe Rustem tev azweriya xurt a ku hêza bav armanc dike dide diyarkirin. Feremez dide pey rêça bavê xwe ta welatê Hindistanê û bi rêya ceribandineke bi hêzê wî dinase. Kurên Rustem di serpêhatiyên xwe ya lêgerina bav de hestên nakok ên ku kur ji bo bav hîs dikin, an ku nakokiya pêbaweriyê û tirsê dihewînin.

Qonaxa dehem, *perestobûn*: Rewşa Rustem a ku li jêr hatiye qalkirin wek haleke perestobûyî dikare bê nirxandin:

“Maşoqê go: -Feremez, ez qurbana teme, îro bû heft roj, Perwande Rustem alt kirîye, hema mixenêti nekuştîye. Erd hanîye kolaye, Rustem piştostan kirîye erdê: îro şeş rojê wîye, heft qat bez li ser zikê Rustemin. Were ez dermana bidime te, tu bive here ber pozê Rustem. Agir li ser zikê Rustem bide alîkî. Te agir da alîkî, agir vênase. Dêwê Perwande kêderê heve wê dûyê agirê Rustem pêva bixwênbe,

¹³⁷ bnr. <http://krd.riataza.com/2017/05/07/rostone-zal-u-feremeze-kure-wi-1/>

ah ji tera vî dermanî, bide ber pozê Rustem. Rustem wekî saxbe, dermanê bihele, bikeve pozê wî. Derman kete pozê wî – were cabê bide min.”¹³⁸

Rustem ne mirî ye ne sax e, an jî hem mirî ye û hem jî sax e. Lehengekî îlahî ye, qehremantiyên mezin kirine û miriye; lê di nav vê peywenda lehengiyê de jî amade ye ku şiyar be. Jixwe di çîrokê de jî bi bêhnkirina dûkeleke efsûnî şiyar dibe.

Qonaxa yanzdehem, *xelata dawîn*: Xelatên ku Rustem bi dest dixê piranî ji objeyên şenber bêtir encamên giştî ne wek rizgarkirina welêt an jî keyaniyê, ji nû ve sazkirina yekîtiyê, an jî rizgarkirina şexsiyeteke girîng ê nav çîrokê. Ji bilî navûdengiyê qezenca Rustem a madî çênabe, an ku sûdwerger malbata wî, gelê wî an jî padişahê wî ye.

Lê ji hêla giyanî ve Rustem rêwîtiya giyanî timam kiriye. Ji sînorê cîhana edetî derbas kiriye û ketiye nav sînorê cîhana deredetî; ezmûnên dijwar derbas kirine; bûye şahidê kuştina Sîyawêş, kurê xwe Sohrab kuştîye, û axiriyê jî tecribeyên giran pê re çêbûne û vegeyriyaye malê. Wî, ronahî û tarîfî, mirin û jiyana, hiş û binhiş tev bi hev re nas kiriye, û bi vî awayî jî xelata herî biqîmet, têgihîştina yekser bi dest xistiye.

Qonaxa duwanzdehem, *redkirina vegeerê*: Di şaxên destana Rustemê Zal de leheng vegeerê red nakin. Piştî ku peywîra wan diqede, leheng vedigerin welatê xwe. Carinan peywîr ji hêla leheng ve tê redkirin –ew jî ji bo demekê– lê vegeer perçeyeke armanca serpehatiya leheng e, lewma jî dudilî tê de çênabe.

Qonaxa sêzdehem, *bazdana sêrdar*: Di epîsoda *Rustem û Bêcanê Kurê Wî* de şert û mercên bazdana Rustem û kurê wî li jêr hatiye pênasekirin. Reva ji dêvan bi şikleki sêrdar pêk nayê, lê ji ber ku yên jê direvin dêw in ev bazdan xasyeteke bisêr werdigire.

¹³⁸ bnr. <http://krd.riataza.com/2017/05/14/rosteme-zal-u-feremeze-kure-wi-2/>

*“Qirêl kire hewar û gazî, esker û leşkerê xwe hilda şêher derket, pey Rustem ket: toz û dûxan bi erdê ket. Rustem lênihêrî, alîyê şêherê Xurêmanêda toz û dûman li erdê ketîye.”*¹³⁹

Qonaxa çardehem, *rizgariya ji derve*: Di epîsoda *Rustem û Bêcanê Kurê Wî* de Bêcan direvînin û dibin li bajarê dêwan diavêjin zindanê. Keça Qralê Dêwan a bi navê Serzengazer dibe dilketiyê Bêcan û ji dizî ve li zindanê wî dide xudankirin. Rustem li pey kurê xwe dikeve ta ku li bajarê Xurêmanê rastî şopa wî tê. Rastî pîrejinekê tê, ku dema keçek biçûk bûye bi xwe jî ji hêla dêwan hatiye rewandin, û ew pîrejin hem agahiyan didê û hem jî bi alîkariya Serzengazerê derfetên rizgarbûna Bêcan çêdike. Heta dergevan jî daxilî nav şixulê revandina Bêcan dibe.

Pîrejînen alîkar, pihewanên ku Rustem wan têk dibe bes nakuje û lewma jî dibin alîkarên dilsoz ên Rustem, û heta dêwên ku Rustem jiyana wan dibexşîne tev di qonaxa rizgariyê de wek kirdeyên derveyî rolekê dileyizin.

Qonaxa panzdehem, *derbasbûna ji dergehê vegeerê*: Rustem di epîsoda *Zal, Êşengî Şa û Rustem* de piştî ku li hember Êşengî Şa bi ser dikeve, beriya ku vegere şixulê li jêr timam dike:

*“Qîza Êşengî Şa hilda bi qeyde-qanûn, usa hilda bir xwarzîyê xwera, hate wî sitendibû, çendek li wêderê sekinî. Mezinê şêher gelekî êlîkî pêra kiribû, rokê Rustem, Bêjingo, qîza Êşengî Şa-jina Bêjingo bû, hilda, berê xwe da şêherê Îranê, hate nava şêher.”*¹⁴⁰

Di gelek epîsodan de timamkirina şixuleke nîvcomayî wek qonaxa li pêş vegeerê derdikeve pêş me. Bi timambûna vê şixulê miraz tam hasil dibe, lewma jî dergehê vegeerê teqez vedibe.

¹³⁹ bnr. <http://krd.riataza.com/2016/10/30/rostem-u-becane-kure-wi/>

¹⁴⁰ bnr. <http://krd.riataza.com/2016/03/17/zal-usengi-sa-u-rostem/>

Qonaxa şanzdehem, *pisporê du cîhanan*: Rustem wek lehengekî ku çendîn caran ji warê mirinê dizivire, li dijî her cure hebûnên hêzdar şerên dijwar dike, rastî bextê çê û yê neçê tê û axiriyê jî ji çerxa felekê derbas dibe. Ew êdî bûye pisporê du cîhanan.

Qonaxa hevdehem, *azadiya jiyînê*: Rustem piştî serpêhatiyê dijwar daxwaza xwe ya jiyaneke aram li jêr destnîşan dike, ku mînakên wê kirpandina rehetiya jiyane di gelek şaxên çîrokên Rustem de derdikeve pêş me.

“Rustem berdayê şehere Xurêmanê jê sitend. Ew dergevanê ber girtîya kir mezinê şehere û bûka xwe hilda, çadir-xêbetê xwe hilda, çil pelewane xwe hilda, Gurgîn pelewane pêra bû, berê xwe da şehere Îranê-hat. Rustem emir kir ser hevalêd xwe, go: -Barê deve-delûl, qantira daynin, em hinekî xwera rehet bin.”¹⁴¹

3.1.2. Karakterên Arketîp Di Rustemê Zal De:

Leheng: Lehengê mezin ê destanê bê guman Rustem e. Diçe welatên bê ser û bin, şerê dêwan, ejderhayan, keysar û pehlewane mezin dike, welatên dagirkirî û mirovên hêşîr rizgar dike. Ew lehengekî wisa ye ku ji avakirina pergaleke nû bêtir tiştê heyî û ji dest çûyî diparêze an jî ji nû ve bi dest dixê. Rustem lûtkeyê lehengiyê ye bes ne bi serê xwe ye, lewre şîrikên serpêhatiyên wî hene, wek pehlewane din ên îranî û kurên wî yên wek wî pehlewane.

Rustem her wekî rêwîtiya bazneyî ya lehengê Campbell serpêhatiya xwe timam dike. Li destpêkê azweriya giyanî ya ji bo pêşdeçûnê jê re çêdibe. Di rê de hemû hêzan, yên baş û nebaş, dinase û ezmûnên pêwîst tev derdikevin pêş. Axiriyê jî xelat(ên) xwe dîsa vedigere cîhana xwe ya edetî. Bi xelat û deskeftiyên xwe, û bi xasyeta hebûna xwe ya dawî temsîla arketîpa leheng a yekser dike.

¹⁴¹ bnr. <http://krd.riataza.com/2016/10/30/rostem-u-becane-kure-wi/>

Aqilmend: Kalê Rustem Sam aqilmendê sereke ye. Her çiqas di dema bûyeran de pê re nebe jî, Rustem bi saya serê beledbûna ji pîlan û çareseriyên kalê xwe dibe lehengekî şareza. Di Şahnameya Firdewsî de jî behsa wan xasyetên Sam tê kirin. Di vê berhemê de jê re ‘yek birîn’ û ‘xwedî pîvan’ tê gotin. Çimkî wî ejderha bi yek derbê kuştiye û her wiha yekî zana, an ku bi pîvan bûye.¹⁴²

Rustem dema diçe devereke nenas, an jî dikeve pey şopa yekê beriyê diçe û ji pirejinekê dişêwire. Carinan jî pirejin bi awayekî nenas derdikeve pêşberî wî. Ev yek wek *arketîpa giyan* e ku bi şiklê mirov an jî ajalekê derdikeve pêş leheng dema ku pêwîstiya wî bi pêhisîn, têgihîştin, biryar an jî pîlanekê çêdibe.

Parastvanê Dergehê: Di destana Rustemê Zal de parastvanên dergehê bêtir wek dêw û ejderha derdikevin pêş me. Ew ji hêla hêzên tarî û nebaş ve hatine peywîrdarkirin da ku li pêş şiyana leheng bibin asteng. Piranî an tîn kuştin, an jî piştî têkçûnê mecbûr dimînin ku bi leheng re hevkarîyê bikin.

Peyamnêr: Pîrejîn, qerwaşên xaniman, birazê an jî xwarziyên Rustem rola peyamnêriyê tînin cih. Ew ne bi tenê agahiyan dibin û tînin bes di heman demê de bi wergirtina hin peywîran dibin alîkarê leheng jî. Dêw jî carinan peyamnêriya hêzên nebaş dikin. Rustem di şaxeke destanê de guhê dêwekî peyamnêr diqetîne û wî bi şûn de dişîne da ku bi vê kirinê peyameke tund bide dijberên xwe.

Sîber: Di destanê de gelek bûyer hene ku mirov wek nîşaneyên azweriyên xurt ên nepend şîrove bike. Keykavus dermanê ku Sohrab pê qenc be nade Rustem. Di bingeha vê kirina wî de xuya ye ku daxwaza birandina qurmê Rustem heye. Daxwaza pehlewaniyê kur a têkbirina bavan, terkirina Rustem a kurê xwe, terkeserbûna wî, xwesteka xurt a ji bo nêçîrê û hwd. tev dikarin wek diyardeyên tiştên nepend bîn şîrovekirin.

¹⁴² Aydınlu, **h.b.**, r. 71

Hîlekar: Di şaxên destanê de keysar ji ber armancên cihê serî li hîleyan didin. Her wiha dêw û cinawir jî xwedî rêbazên hîlekar in û di şerên xwe yên li hember leheng de rêbazên bi vî rengî bi kar tînin. Hîle wek hêmayek aîdî binhişê temsîla xwe di hebûnên tarî de dibîne, lewma jî di serpêhatiya Rustem de ew heyber pîrî caran serî li rêbazên hîleyî didin. Keysar û şewirmendên keysaran jî wek dijberên leheng qîma xwe bi hêz an jî rêbazên aîdî tarîbûn/xirabûnê tînin.

3.2. Memê Alan

Memê Alan wek tekst cara pêşîn ji hêla A. Socin ve di sala 1890'an de li Petersburg'ê hatiye çapkirin. Piştî A. Von Le Coq sala 1903'an li Almanya'yê, Oscar Mann 1909'an li Berlîn'ê û Roger Lescot jî 1942'yan bi alîkariya Mîr Celadet li gel wergera fransî li Bêrût'ê çap kir.¹⁴³ Di nirxandina li ser Memê Alan de em ê guhartoya ku Lescot bi guhdarîkirina ji 20'î zêdetir dengbêjan tekstek pêk aniye wek berhema çavkanî bi kar bînin.

Memê Alan piştî ku Kurd dibin misilman gelek motîfên îslamî werdigire lê gelek dirûvên tekstî û çandî tê de hene ku vê baweriyê didine me ku ew çîrok wek vegotîneke mîftîk xwedî dîrokeke qedîm e. Nuredîn Zaza radigihîne ku li gor dîroknasê Danîmarkî A. Christensen çîrokek wek ya Memê Alan hezar sal berî Îsa pêxember di nav miletên Arî de hebû, bi navê çîroka “ Odatîs û Zariyadrês”.¹⁴⁴ Li ser navê lehengê çîrokê Mem, Zaza dibêje ku ew nav –Mem– kurtkirina navê Mihemed e. Ev çîrok ji rojhilat gihîştîye nav gelên rojava û hêdî hêdî hêmanên îslamî jî ketinê tê de.¹⁴⁵

Niqaşa li ser navê Mem belkû niqaşek bêtir tîkildarî qada onomastîk e, lê mimkun e ku bibe daneyeke girîng ji bo tîgihîştina bi erka civakî-dîrokî û bingeha serweriyê ya nav civaka Kurd. Memê Alan, ê ku li gor vebêjên çîrokê ji eslê xwe

¹⁴³ Nuredîn Zaza, **Memê Alan**, Weşanxana Orfeus, Swêd, 1996, r.40

¹⁴⁴ **h.b.**, r. 42

¹⁴⁵ **h.b.**, r. 45

digihîje Qureyşîyan, di nav vegotinê de wek *sultanê kurdan* tê pêşkêşkirin. Kurd-bûna Mem wek qalibeke aprîorî ye ji bo sultaniya Kurdan, û ji hêla din ve jî ereb-bûn jî egerek rewabûna desthilatiyê ye, an ku wek nirxeke kartêker eqrebetiya bi ereban re û çêbûna li axa pîroz divê bi sultanê kurdan re bê raspartin da ku desthilatiya wî bê pejirandin an jî qewî be. Lewma di vê babetê de pêwîstî bi xebatên kûrtir hene.

M. L. Chyet di xebata xwe ya li ser Mem û Zînê de beşek veqetandiye ji bo nîqaşa derbarê lehengbûna Mem. Ew vê nirxandinê, bi bikaranîna gelek guhartoyên Memê Alan û Mem û Zînê pêk tîne. Em ê di vê beşê de cih bidin wan nirxandinên wî yên derbarê figurê Mem. Beşa ku Chyet navê “Mem leheng e?” lê kiriye hin xalên balkêş rayêdixîne pêş çavan.

*“Bi giştî tê pejirandin ku Mem lehengê çîrokê ye. Di rastiye de jî, nêrîneke ji nêzîk ve nîşan dide ku gelek tevgerên Mem, nevêrekî nebe jî, nelehengî (unheroic) ne.”*¹⁴⁶

Û Chyet wan tevgerên navborî wiha rêz dike: Gava ku Al-Paşa, bavê wî, li ber wî digere ku terka wan nede, bertek û gotinên bêhurmetî ji dêv derdikevin. Li gor edetên Rojhilata Navîn bînpêkirina gotina bav û mezinên din ê malbat û civakê nayê qebûl kirin.

Dîsa, Mem acizbûna hespê xwe Bor/Boz a ji ber zincîrên ku Al-Paşa pê alandibû nahese û Bor tê ziman û bêfamiya wî rexne dike. Ew jî kêmasiyeke lehengî ye ku leheng di her şertê de rewşa hespên xwe li pêş çav digirin.¹⁴⁷

Bi hatina Mem a Cizîra Botan bêtir mînakên tevgerên wî yên nelehengî tên dîtin. Mîrê Cizîrê ji bo xatirê Mem gazîya çûna nêçîrê dike, lê Mem ji bo ku bi Zînê re tenê

¹⁴⁶ Chyet, Michael Lewisohn, **And A Thornbush Sprang Up Between Them: Studies On Mem û Zîn, A Kurdish Romance**, (Volumes I and II, Ph.d dissertation), University of California, Berkeley, 1991, r. 354

¹⁴⁷ **h.b.**, r. 356

bimîne hinceta nexweşbûnê dide pêş. Nexwe leheng ji çalakiyek wek nêçîrê ku ceribandineke girîng a mêraniyê ye bi paş de namînin.¹⁴⁸

Gava ku Mem li nav baxê Mîr e û Zîn jî di bin ebayê xwe de veşartî ye, li ber Mîr nikare rabe ser piyan û ew tevger jî wek kêmasiya kesayeta lehengî dikare bê hesabandin.¹⁴⁹ Di leyîza setrencê de li hember Mîr ancax ji bo demekê yê serketî ye, ta ku berê wî dizivire û çavên wî li Zînê dikevin, piştê têk diçe û wî diavêjin zindanê.¹⁵⁰ Heta yên ji wî hez dikin jî –bavê wî, hespê wî, Zîn û destebirakê wî Qeretajdîn– dibînîn ku Mem ji hin xasyetên mêrane bê par e. Dîsa jî li gel hemû xeletiyên xwe Mem wek lehengê çîrokê tê hesabandin.¹⁵¹

Chyet pirseke wiha jî datîne holê? “Çawa dibe kesekî ku wek Mem bêhurmetî tevdigere, di heman demê de jî wek bîhna gulê ya xweş bê şayesandin?”¹⁵² Chyet ji bo bersiva wê pirsê serî bi referansên William R. Bascom dide ku vê rewşê bi nakokiyeke folklorê şîrove dike. An ku folklor ji aliyekê ve saziyên civakî bi takekesan dide pejirandin û ji aliyê din ve jî ji bo takekesan rêya xwe rizgarkirina ji wan zoradariyên nirx û saziyan vedike.¹⁵³

Bi gotineke din, civak tiştên ku di jiyana rastî de derfeta pêkanîna wan tune bi rêya folklorê bi destê lehengan dide kirin. An ku bi rêya folklorê pirsgirêkên gel jî tîn nirxandin. Vêca nerabûna ser piyan a Mem a li ber Mîr wek pêkanîna daxwaza gundiyan a dijî otorîteya serdestan dikare bê nirxandin. Heta bi paşguhkirina gotinên bavê xwe Mem wek erka dijderketina desthilatiya bav tîne cih.¹⁵⁴ Hindî ku protagonistê ciwan şiyana xwe bi pêş de dibe bêtir wek lehengek tê pejirandin. Ev yek dikare nakokiya tevgerên wî yên bêhurmetî bi statuya wî ya lehengbûnê li hev bîne.¹⁵⁵

¹⁴⁸ h.b., r. 359

¹⁴⁹ h.b., rr. 360-61

¹⁵⁰ h.b., r. 362

¹⁵¹ h.b., r. 363

¹⁵² h.

¹⁵³ h.

¹⁵⁴ h.b., r. 363-64

¹⁵⁵ h.b., r. 365

Chyet derbarê fonksîyonên çîrokî yên karakterên Mem û Qeretajdîn nêrîneke balkêş derdixîne pêş. Ew dixwaze Mem wek protagonîstê çîrokê û Qeretajdîn jî wek lehengê rastî yê çîrokê bibîne.

*“Di gel ku Mem bi tevgerên xwe yên nelehengî dîsa jî wek leheng bê pêşwazîkirin jî, karakterekî din di çîrokê de heye ku tevgerên wî bi her awayî hêja ne. Bi min wisa ye ku Mem bê nîqaş protagonîstê çîrokê be jî, lehengê rasteqîn ê çîroka Mem û Zînê Qeretajdîn e.”*¹⁵⁶

Chyet xasyetên karakterê Qeretajdîn bi xasyetên pejirandî yên mêraniyê, bi nirxên hêja yên mêraniyê yên erebên bedewî amaje dike ku Yohanan Friedman vê yekê bi peyva erebî *murrah* rave dike, yên wek; di şer de mêranî, di dema qeyranê de nefsbîçûkî, comerdî û mêvanperwerî, parastina feqîran, tolhildana kuştinê, dilsozî. Vêca tê dîtîn ku ew xasyet tev di şexsê Qeretajdîn de xwe didin kifşê. Li şûna ku Mem bi kirinên xwe tê rexnekirin, Qeretajdîn rûmetê ji civata xwe dibîne û Mîrê Cizîra Botan jî hem wî diəcibîne û hem jî jê ditirse.¹⁵⁷

Ew xasyetên Qeretajdîn ên li jor tî destnîşankirin di çîrokê de wek parastin û xudankirina Mem, dilsoziya ji bo wî, fedakariya bi şewitandina mala xwe, bi bûyerên nêçîrvaniyê û axiriyê jî ji bo tolhildanê bi kuştina Beko, derdikeve pêş me.

Memê Alan bi pênaseya bajarê mixribê dest pê dike:

“Bajarê Mixribê bajarekî pir giran e,

Li ser heft çîyan e

Li ser sê sed û şêst û şeş qapiyan e

Her qapîke li ser sê sed û şêst û şeş walîlixan e

¹⁵⁶ h.

¹⁵⁷ h.b., r. 366

Her walîlikê li ser sê sed û şêst û şeş midirlixan e

Timam di destê Elî begê, Emer begê, Elmaz begê de ye,

*sê biran e.*¹⁵⁸

Di vê pênaseyê de, her çiqas pênase bi têgehên îdarî yên serdemî li gor xwe rojane bûbe jî, şopa vegotina mîtîk xwe dide der. Bajar wek dewama desthilatiya esmanî/yezdanî bi awayekî çikane (vertical) wek wargehek navbera erd û esmên, û hem jî navenda serweriyeke cîhanî hatiye şayesandin. Hêj di çêbûna Mem de peywenda lehengî xwe dide nîşan. Her wekî me di beşên pêş de diyar kiribû Lord Raglan dest nîşan dike ku şert û mercên ku lehengê kevneşopiyê dikeve nav malzaroka dayîka xwe deredetî ne. Di rewşa her sê birayan de, Elî beg, Emer beg û Elmaz beg de girifteke binas heye, ku ew bi awayê li jêr rewşa xwe aşkera dikin:

“....

Digotin: “Gelî birano, em sê birane.

Emrê me şêst in, dikevin şêst û pêncane.

Rebê Alemê daye me malê girane.

*Emê warocax ê kordûndan e.*¹⁵⁹

Û çareserîya vê girîfta binas, an ku hebûna mal û milk û hêz, û xetereya şikestina zincîra nîfî ya ji ber nebûna zarokekî, bi awayekî mucîzeyî pêk tê. Bi diyarbûna Xocaê Xidir, ku arketîpekî dînî yê karên mucîzeyî ye, pêvajoya ketina nav malzarokê dest pê dike.

“Rebê Alemê Xocaê Xidir li wan kir beyane.

¹⁵⁸ Roger lescot, **Memê Alan**, Weşanxana Orfeus, Swêd, 1996, r. 73

¹⁵⁹ **h.b.**, r. 74

Carekê, nêrî ko Elî begê Emer begê û Elmaz begê

ji xwe re rûniştine û giriyanê.

Dilê wî li wan şewitî, sêvekê ji paşila xwe derdixê,

dide destê Elî begê, mezinê birane.”¹⁶⁰

Xocaê Xidir, ê ku hişyariyekê dide her du birayan ku navê kurik bêyî wî nedeynin, careke din diyar dibe û vê carê jî arîşeya nav û nasnameyî çareser dike.

“Go: “Hûn çî ji vî kurikî dixwazin. Navê wî deynin Memê Alan, xwarziyê şêxê Qureyşan, braziyê Emer begê û Elmaz begê, Sultanê Kurda!”¹⁶¹

Xocaê Xidir bi hêza xwe ya mûcîzeyî destpêkê xetereya têkçûna nişî ji holê radike û derfetê çêbûna lehengekî datîne holê û piştê jî arîşeya nasnameya leheng çareser dike. Wisa dixuye ku bi xwarzîbûna şêxê Qureyşan îcazeta desthilatiya dînî, bi birazîbûna Emer begê û Elmaz begê rewabûna erka navxweyî tê selmandin û ji vê hevgerêdanê jî nasnameya Sultanê Kurda dikemile. Mît di vê babetê de wer dixuye ku fonksîyoneke îdeolojîk dileyize. Di vê konteksta çîrokî de meseleya nasname û desthilatiyê çareser dibe.

Mem hêj ku terka bajarê Mixribê nedaye bûye padişahê vê bajarê û Beglîyê xwarziyê Emer begê jî kiriye serokê xortan. Vê çaxê çend bûyer çêdibin ku ew dikare lehengbûna xwe pê nîşan bide, lê ew ji lehengekî bêtir wek keysarekî şareza tevdigere. Bo nimûne dema peydabûn/derketina hespekekî ji bin avê (hespê wî yê pêşerojê yê bi navê Bozê Revan) fersendekî bi vî rengî derdikeve holê. Ew derketina hespê bi bask ê ji bin deryayê hem xwedî temsîleke mîtolojîk û hem jî temsîleke dînî ye, wek Pegasus an jî Boraqê hespê pêxemberê îslamê.

Dema ku masîvan hewl didin ku tora nav avê asêbûyî bikişînin wiha dibêjin:

¹⁶⁰ h.b., r. 74

¹⁶¹ h.b., r. 76

“Ko çavê torvanan ket li Memê Alan e,

Gotin: “Padişahim, em çito bikin, Van peyana hemû vestiyane,

Bi der nakeve merata torane,

Ne jî ben diqetin ko hêviya me were birîn ji torane.

Qene, tu yariya me bike, belkî em bi nîfûsa te biderxin van torane.”¹⁶²

Di konteksteke wiha de ji leheng tê hêvîkirin ku bi hêza xwe ya der-edetî ben bikişîne û torê derbixîne. Her wekî Rustemê Zal gelek caran –dema ku şixulekî ku pêkanîna wê zor e û kesekî dîtir jî pê nikare– kevirekî giran radike an jî devê şikeftêkî qahîm bi hêza xwe vedike. Lê Mem li şûna nîşandana wesfekî lehengane tişteki dîtir dike, an ku li dewsa ku bi xwe bike, vê şixulê dide kirin:

“Memî bi Beglî re xeber şande ji xalê xwe emer begî ra,

hat tevî kalane.

Beglî hat tevî hezar û pênc sed xortê Kurdan xwe dane berane.

Ben kişandin, bû hufe hufa pêlan û çîrkeçîrke ben û şîrîtane.

Bi der ket binaniya torane.”¹⁶³

Her wiha di kedîkirina hespê de jî Mem li şûna ku bi zora xwe hukmê xwe bixe ser heywên, vî karî jî dispêre kesên din.

Paşê, Mem xeber bela kir li nav bajarê Mixribiyan li peyane.

Ko: “Ki vi heywani ji min re terbiye bike,

¹⁶² **h.b.**, r. 78

¹⁶³ **h.b.**, r. 79

*Ezê çavê wi têrkim li perane.*¹⁶⁴

3.2.1. Di Çarçoveya Qonaxên Joseph Campbell De Serpêhatiya Memê Alan

Qonaxa yekem, *gaziya ji bo serpêhatiyê*: Peywenda gaziya ku bi navgîn û Peyamnêrên cihêreng ava dibe, di destana Memê Alan de bi şiklekî dersiruştî çêdibe. Niqaşeke bedewiyê navbera her sê qîzên Padişahê Periyân, Tavbano, Heyvbano û Stêrbano yê çêdibe. Xwişka biçûk Stêrbano bi bedewiya her du xwişkên xwe diheyire û postê wan ji ser wan radike. Lê her du xwişk jî bedewiya xwe bi ya jin û mêrekî (Mem û Zînê) rûberî hev dikin.

“Gotin: Xweliya dinyayê bibare li serê me her siyane!

Dido hene, yek qîz e, yek xort e, bi çelengiyê kesek nagihê wane.

Yek kurê Mîrê Mixribiyane,

Ew mîr Padişahê Kurdan e,

Ya din, bavê wê waliyê bajarê Cizîra Botan e,

*Keça Mîr Zengîn, Zîna Zêdan e.*¹⁶⁵

Bi ser van gotinan xwişka biçûk bi şertê ku ew wî xortî û keçikê nîşanî wê bidin soza dayîna postê wan dide. Û axiriyê jî her du xwişk bi awayekî efsûnî textê Zînê hildidin dibin daîreya Memê Alan. Ew motîf di Çîrokên Hezar û Yek Şevê de jî derdikeve pêş me. Her wisa çîroka mîfîk a evîndarkirina Parîs û Helenê ya ji hêla her sê xwedawendên Yewnanî xwedî motîfeke bi vî rengî ye.

¹⁶⁴ h.

¹⁶⁵ Lescot, h.b., r. 82

Wê şevê keçperî bi têra xwe li wan temaşe dikin; Mem û Zîn piştî niqaş û axaftinên dût û dirêj soza evîndaran bi hev didin; û dîsa keçperî wan dixin xeweke giran û Zînê şûnde dibin bajarê wê. Sibeya vê şevê jî Mem bi azweriyeke tund şiyar dibe, an ku êdî ne Memê berê ye. Daxwaza evîne, peydekirina xwedawenda xwe û lêgerîna anîmayê tev wek azweriya xurt a binhişî wî zeft dikin. Jiyanî wî û mijûliyên wî yê edetî jê re bêqîmet dibin. Konteksta *gaziya serpêhatiyê* bi niqaş/henekên periyên ava dibe, her wekî mirov pêlîstokên afirideyên payebilind ên wek perî, xwedawend û hwd bin. Her sê perî erka peyamnêriyê tînin cih.

Qonaxa duyem, *redkirina gaziye*: Piştî ku Mem serpêhatiya xwe ya şevê ji Beglî re aşkera dike û jê re biryara xwe ya çûna ber bi Cizîra Botan dibêje, Beglî li gel bavê Mem û apên wî çareya pêşlêgirtinê digerin. Di vê qonaxê de gaziya ji bo serpêhatiyê ji hêla leheng ve nayê redkirin an ku tu dudiliya leheng tune, lê xizm û dostên wî yê astengker in. Lê çî çareyê nabînin. Mem li pêş çavên wan roj bi roj diçilmise, vêca axiriyê qanî dibin ku ew dest bi serpêhatiyê bike. Bi vî awayî jî beşa yekem a serpêhatiyê, an ku derketina ji malê, pêk tê. Û warê ku bi vê derketinê jî tê armanckirin bajarê nenas ê Cizîra Botan e.

Qonaxa sêyem, *alîkariya dersirûştî*: Memê rêwîng di rê de rastî kalo Xizir tê. Kalo Xizir pêşbîniya serpêhatiya Mem dike û çend şîretên girîng lê dike. Em dibînin ku leheng di vê qonaxê de alîkariyê ji kesayetekî dersirûştî werdigire û ev yek jî li şîroveya Campbell a ji bo qonaxa sêyem tê. Kalo Xizir bi Mem re qederekê hespê xwe dajo, hişyarî û şîretan dide wî ku tev jî bi xisletên tilsimî dertên:

“Gava ku nêzik bû ji şetê Cizîra Botane,

Kalo got: Memo, kurê min, tu diçî Cizîrê ji bo Zînê Zêdane,

Di nava we de heye eşqek dilane.

Min divê li te bikim çend şîretane.”¹⁶⁶

Çaxê ku Mem ji aqilmendê xwe Kalo Xizir vediqete û digihîje ser tixubê Cizîra Botan, her wekî pêşbîniya Xizir rastî astengiyeye fîzîkî tê ku em dikarin vê wek dergehê yekem ê cîhana deredetî şîrove bikin:

“Kalo got: Gava darî ber şetê Cizîra Botane,

Şetî pehn î mezin e, li ser nînin kelek û darê gemiyane...”¹⁶⁷

Û rastî astengiyeye zindî, Zîna Bekoyê Awan, tê ku ew jî bi awayekî rola dergevan tîne cih:

“Kelişo daniye qîza Bekoyê Şeytan e,

Dixwaze ko te bixapîne bi navê Zînê Zêdane,

Lê tu bawer meke; ew qîza Beko Awan e.”¹⁶⁸

Qonaxa çarem, *derbasbûna ji dergehê yekem*, û qonaxa heştem, *jina fêtkar*: Rasthatin û pê re jî *derbasbûna ji şetê Cizîra Botan* beramberî qonaxa çarem, *derbasbûna ji dergehê yekem*, dikare bê hesibandin. Ew qonax li gel qonaxa rasthatina bi *jina fêtkar* pêk tê ku Campbell ew qonax di rêza heştan de dest nîşan kiriye. Lê her wekî di rûpelên pêş de jî hatibû şîrovekirin qonaxên ku Campbell dest nîşan dike her tim di heman rêzê de pêk nayên, an ku di rêza wan de guherîn çêdibin.

Jina fêtkar, an ku keça Beko, bi çendîn dek û dolaban hewl dide ku Mem ji rêka wî bizivirîne û bike para xwe, lê piştî ku dibîne ew ne pêkan e vê carê jî soza zewacê ji Mem dixwaze. Mem ji bo ku xwe jê xilas bike sozek wiha didê:

“Gava Xwedê kir min û Zînê, me her diyane,

¹⁶⁶ **h.b.**, r. 103

¹⁶⁷ **h.b.**, r. 103

¹⁶⁸ **h.**

Ezê destê te jî bigirim, bavêjim ser terkiya Bozê Revane.”¹⁶⁹

Qonaxa pêncem, *zikê nehengê*: Bi vê soza li jor Mem hem lihevhatina xwe bi jina fêdkar re çêdike û hem jî şîret û agahiyên derbarê bajarê Cizîrê, derbarê Mîr Ezîn û her sê birayên ku navên wan Hesên, Çeko û Qeretacîn e, û her wiha derbarê bavê wê Bekoyê Awan jê distîne. Memê ku ju dergehê yekem derbas bûyî diherike nav kolanên bajêr, nav cîhaneke nû û bi vê yekê re jî derbasî qonaxa pêncem dibe. Bi gotina Campbell em bibêjin, ew dikeve nav *zikê nehengê*. Wî êdî dinya xwe ya binas bi timamî li dû xwe hiştiye û ketiye nav dinya/bajarekî tijî raz û nepenî.

“Mem ket derê bajarê Cizîra Botane.

Ji bîr kirin şîretê qîza Bekoyê Şeytane.”¹⁷⁰

Qonaxa şeşem, *rêya ceribandinan*: Di vê qonaxê de leheng tûşî hin ceribandin û ezmûnan dibe û hevalbend û neyarên xwe dinase. Mem jî gava ku dikeve nav kolanên Cizîrê destpêkê rastî neyarê xwe yê sereke Beko Awan tê. Ew bêyî ku şexsê xwe yê rastî aşkera bike derdikeve pêş Mem û jê re behsa reşbelekek sexte dike, qaşo bavê Mem ji bo mêvankirina Mem ji wî re şandiye, da ku Mem bibe mala xwe. Bi nêzikbûna malê re Mem ji dûman û ji pênaseya Zîna keça Beko têderdixîne ku ew kes Beko ye û zûka bi çargaviyan xwe jê bi dûr dixîne.

Mem di rathatîna yekem de xwe ji neyarê xwe yê sereke rizgar dike. Ji bilî vê jî, li seranserê serpahatiya xwe Mem rastî hin ceribandinên din jî tê ku piranî bi danûstanîna wî yê bi Mîr re têkildar in û hema bêje di hemiyan de jî têk diçe.

Û piştî demekê jî Mem digihîje cem her sê hevalbendên xwe yê pêşerojê – Hesên, Çeko û Qeretacîn– ku di timamê ceribandin û serpêhatiya Mem de wek hevalên dilsoz û canfîda dê bi wî re bin.

“Mem di nêv xelkê re ajot, giha ber derê Celaliyane.

¹⁶⁹ **h.b.**, r. 108

¹⁷⁰ **h.b.**, r. 112

Nihêrî her sê bira jî hazir in, bi ser xwe da bi dar da kirine çengelê silehane.

Mem peya bû, silav da her sê birane.

*Her sê bira bi hev ra hatin pêşiya mêvanê xerîb, sekinîn li ser lingane.*¹⁷¹

Ji wan birayan Çeko dê dev ji destgirtiya xwe Zînê berde ji bo xatirê Mem. Qeretaçîn jî şevitandina mala xwe jî tê de dê gelek fedakariyan ji bo wî bike. Her sê bira ku dil dikin sedemê hatina Mem hîn bin –ku êdî wî wek birayên xwe yê çaran dihesibînin– ji bo demeke dirêj hewl didin ta ku bi merama wî têdigihîjin, û di vê navê de jî ji ber mereq û tengejeya nezanîna merama Mem sozê mêran didin ku çî pêwîst bike dê ji bo wî bikin. Ew mereq, tengeje û aloziya çîroksaziyê bi xwe re konteksta qayîlbûna Çeko jî diafirîne, her çiqas demê li ber xwe dide û dike ku bi zora şûrê mafê wî yê zewaca bi Zînê re ji dest neçe. Her sê bira bi ser şûr û himêliyê sond dixwin ku bibe bayîsê çî jî ew ê bibin hevalbendên Mem.

“Vê car, dor hate Çeko, rabû ser lingane,

Got: “Bi vî şûrî, bi vê himêliyê...

Eger hatibe ji bo Zînê, qelendiya min ya sê salane,

*... Heya niha, xwestika min bû, û ji niha bi şûn da, xweyînga min e ji dê û bavane.*¹⁷²

Gelo her sê bira çima dilsoziyeke wiha xurt nîşan didin? Sedemên diyar ên wek şexsiyeta Mem, zengînî û navûdengiya welat û textê wî, rêwîtiya wî ya dûr û dirêj an jî hêz û efsûna evîndariyê belkû vê xurtbûna hevalbendî û dilsoziyê rave bikin, lê her sê bira bi awayekî jî li gor qaydeyên mîtê tevdigerin; an ku leheng li şûna yezdan e û mirovên baş jî divê amade bin ku ji bo wî her tiştî bikin.

¹⁷¹ **h.b.**, r. 126

¹⁷² **h.b.**, r. 146

Qonaxa heftem, *rasthatina li gel xwedawendê*: Wek tê zanîn, di vê qonaxê de leheng rastî evîne û hesta herî xurt û saf tê ku di şexsê jin-dayîk-xwedawendê de tê temsîlkirin. Mem, bi alîkariya her sê birayan ku nimayîşeke keçên Cizîrê li pêş çavê Mem pêk tînin, rastî evîndara xwe tê.

“Mem çi dinihêre? Ko li hember wî sekiniye Zîn, xwedîya xewna şevane.

*Bi carê eqil di serî da ne ma, wekî bodelane.”*¹⁷³

Mem ta ku rastî Zîne bê beriya wê demê nade zora dil û xwestekên xwe. Timî kirinên ku li gor civakê rewa ne dide pêş xwe. Ew wek şexsiyetekî baldar û şarezaya xuya dike, û ew rewş piştî bi qewîbûna hevalbendiya bi her sê birayan jî didome. Leheng xwe di nav konteksta aloz a civaka Cizîrê de, ku wek bajarekî di nav sê hêzên desthilatîyê de perçebûyî ye, dibîne û lewma bi baldarî diaxive.

“Ez naxwazim bi çûyîna xwe ya Kaniya Qestelê bibim sebebê tu fitnane.

*Bila di rû min da nebe xişîna şûran û vixîna mêrane.”*¹⁷⁴

Mem li ber Kaniya Qestelê rastî Zîne tê û qisedaneke dirêj di navbera wan de çêdibe, ku tê de gotinên evîndariyê, kelecana û hezkirin heye, tirs û fikarên wan jî pê re. Warê rasthatina her du evîndaran jî ciheke rasthatinî nîne. Li gor baweriyên kevn ên îranî av mê ye û lewma jî jin li ber çavkaniyên avê derdikevin pêş me.¹⁷⁵ Li vê hevdîtîne Zîn rêyekê didanê pêş Mem ku di hin çîrokan de wek tevgereke lehengî xuya dike. Jin di vê kêliyê de xwe wek xelata leheng araste dike û bînpêkirina merceke civakê datîne pêş hezkiriyê xwe.

“Were, destê xwe bavêje destê min, û min çek ke ser piştî Bozê Rewane,

Berê xwe bide welatê xwe, Bajarê Mixribiyane,

¹⁷³ **h.b.**, r. 150

¹⁷⁴ **h.b.**, r. 164

¹⁷⁵ Aydınlu, **h.b.**, r. 64

Bila heywan me her diyan bere, bigihîne xwediyane.

Emê xelas bin, û bifilitin ji şor û gotinane.”¹⁷⁶

Lê gava ku Mem li ber kaniya Qestelê rastî Zînê tê azweriyeke xurt pê re çêdibe û rengê kirin û gotinên wî diguherin. Di vê kêliyê de ji her sê birayan Hesên du rêyan dide ber Mem ku dil bike Zînê birevîne, an jî li bendê be ku zewaca wan li gor rê û risman pêk were.

Qonaxa nehem, *lihevhatina bi bav re*: Hemû cure têkilî, dijberî û pêşbaziyên Mem ên li gel Mîr mimkun e ku di çarçoveya qonaxa nehem de bê nirxandin. Mîr jêderka hêzê ye, lewre danûstandina Mem a bî wî re jî bi şikleke dijwar û bijan çêdibe. Erka li ser Mem tekoşîn e. Di danûstandina Mem û Mîr de bi çend awayan konteksta tekoşînê û derfetên serketinê ava dibe, pîranî jî bi însîyatîfa Mîr ku wî gazî dike bo nêçîrê, tîravêtinê an jî pêşniyara leyîstina setrencê lê dike. Lê lehengê navborî wan şiyanan an red dike an jî di encama hewldanê de têk diçe û axiriyê jî lihevhatina bi bav re encameke xirab ji bo leheng derdixîne holê. Leheng nabe mîrasgirê hêza bav, lê berovajî vê, ew ji ber têkçûna xwe tê cezakirin.

Di vê têkçûnê de rola Beko, neyarê sereke yê leheng, bê guman mezin e. Ew bi angaştê ku Mem ê li şûna wî bigire Mîr dixê nav fikara desthilatîyê û axiriyê jî di hundirê Mîr de *tirsa bav a bi serkêşiya kur* sax dide.

“Gotê: ‘Malava! Tu guh mede şorê jinane.

Ma Hesên dîn ne bûye ko bikuje hesp û dewarane.

Paşê, îro li pêş te rûniştiye mîrê Bajarê Mixribiyane,

Di nava mala te da ji te ra hişk xeber didiye, wek zarokane.”¹⁷⁷

¹⁷⁶ Lescot, **h.b.**, r. 171

¹⁷⁷ **h.b.**, r. 204

Mîr ji ber tirsî jidestçûna desthilatîyê bi her awayî fend û hîleyên Beko dipejirîne û heta daxilî wan dibe. Dawiyê jî di lîstika setrencê de, dîsa bi şêweyeke dexelîker, wî tîk dibin û diavêjin zindanê. Bi vê desteserkirina Mem peywenda jiholêrakirina leheng ava dibe.

Qonaxa dehem, *perestobûn*: Lehengê ku bi awayekî fîzîkî ji holê radibe bilindî asta îlahî dibe. Em dibînin ku Mem di zindanê de peresto dibe. Mem wextê li zindanê ye xewnekê dibîne ku di wê xewnê de li bajarê xwe li cem bav û ap û dostên xwe ye û jê re qedera wî û mirina wî ya nêzik tê gotin. Dîtina leheng a xewneke bi vî rengî jî wek nîşaneyê perestobûnê dikare bê nirxandin. Lewre ew di şikeft/zindanekê de ye û şert û mercên peyamberane jê re ava bûne.

“Di xewna xwe da dît ko dîsa rûniştiye li ser textê xwe yê çarling, bajarê Mixribiyane.

Li dorhêlê rûniştî ne birayê wî Beglî, tevî kurên giregir û begane,

....Hate vê meclîsê Emer beg, kalê Memî, şêxê qureysiyane.

Got: ... Ji mirina te ra maye maye îşê dû saet an sê saetane.

Tuê li vê dinê bar kî, herî axîretê, hizûra Padişahê padişane.”¹⁷⁸

Şikeft di vê babetê de xwedî wateyeke kûr e, her wekî Jung destnîşan dike; şikeft kuneke veşartî ye ku vejîn tê de pêk tê; ew cihê ku mirov dixîne da ku tê de razê û nûjen be.¹⁷⁹

Qonaxa yanzdehem, *xelata dawîn*: Lehengê navborî tişteki berbiçav wek xelatek, iksîrek an jî gihîştina bi evîndarê bi dest naxe. Lê îlahîbûna Mem û pêhesîna wî ya bi

¹⁷⁸ **h.b.**, r. 220

¹⁷⁹ Jung, **Dört Arketip**, r. 66

eşqa îlahî wek bidestxistina zanînekê dikare bê nirxandin. Ev yek li gor Campbell wek xelata esasî ye. Her wiha li gor şroveya gelek vebêjên devkî Mem li bihuştê digihîje evîndara xwe û ew jî dibe xelata wî ya ku wek berdêla cefaya wî ya li zindanê ye.

“Qedera Xwedê hatiye, sekiniye ko tu bimirî bi destê zalimane,

Bigihê merteba şehîd û ewliyane.

Zîn jî wê di pê te ra bimore bi heft rojane.

Xwedê wê li wê dinê mirazê we bike di nav govenda horiyane.

Di nav cenetê da wê bibe dawetê we her diyane.”¹⁸⁰

Qonaxa duwanzdehem, *redkirina vegeerê*: Piştî ku Mem di zindanê de ji Zînê re xewna xwe aşkera dike û bi vî awayî jî tê zanîn ku di nav hinarê de jehr heye, Zîn li ber digere ku wê mêweyê nexwe. Lê Mem biryardar e ku li pêş qedera ku jê re di xewnê de hatibû aşkerakirin neseke. Zîn jê dixwaze ku ta her sê bira bizivirin bajêr ew li ber xwe bide, lê Mem vê yekê red dike û ew jî bi awayekî dikare wek redkirina vegeerê bê nirxandin.

Ji ber ku Mem vegeerê red dike û di zindanê de dimire, em nikarin serpêhatiyê bi qonaxên din ên ku Campbell dest nîşan dike bidin li ber hev. Jixwe Campbell jî diyar dike ku leheng carinan vegeerê red dike û li şûna vegera bo cîhana xwe ya edetî, ew li bin çiya an şikeftekê bi halê perestobûyî, an jî li giraveke wek bihuştê bi awayekî ronahîbûyî û li gel xwedawendê dimîne.

Mem di qonaxa sêzdehem ta qonaxa hevdehem de nîne. Ew *bazdaneke sêrdar* a ji xetereyê pêk nayne; ji bo wî *rizgariya ji derve* çênabe (her çiqas Zîn vê pêşniyarê jê re bike jî ew napejirîne); ji *dergehê vegeerê* derbas nabe û *azadiya jiyînê* ji bo wî pêkan nabe. Lê belkû bi nêrîneke tesewifî hin encamên ku têkildarî demên piştî mirina Mem

¹⁸⁰ h.b., r. 221

bên derxistin. Wê çaxê jî arîşeyên lihevanîna wan encamên tesewifî ya bi wan teoriyên rojavayî ku me qala wan kirine dê, bê guman, mijarê hîn aloztir bikin.

3.2.2. Karakterên Arketîp Di Memê Alan De

Leheng: Mem, her çiqas guman û niqaş li ser kirin û tevgerên wî hebin jî, lehengê destana Memê Alan e. Ew, ji ber redandina veqerê bi hemû awayan qonaxên Campbell timam neke jî, destpêka çîrokê ta dawiyê di piraniya qonaxên sereke re derbas dibe. Serpêhatiya wî bûyera navendî ya çîrokê ye. Hemû kirin û tevgerên karakterên din tev li gor pêkanînen wî teşe digirin, an ku ew hemû wek alîkar an jî astengker li dorhêla wî ne.

Mem wek arketîpa lehengê nêr bi azweriya ji bo rasthatina bi anîmayê kaş dibe. Ji dema ku gaziya serpêhatiyê bi qasidiya her sê periyên jê re diyar dibe, giyanê wî bi daxwazeke xurt a peydakirina xwedawendê û yekbûna giyanî bi pêş de diçe. Rêwîtiya wî ya bêyî şer û pevçûn, xasyetên wî yên pirhêl ên wek leheng-padişah-evîndar temsîleke xurt a serpêhatiya giyanê mirov e. Axiriyê jî piştî gelek ceribandinan, û tecribekirina hêzên nakok, Mem di yekîtiya arketîpa mirin û jiyanê de peresto dibe.

Aqilmend: Aqilmend ji leheng re motîvasyonê çêdike, fikr û perwerdehiyê didê. Li destpêka çîrokê, Beglî heya radeyekê vê fonksiyonê wek kesayetek siruştî tîne cih, lê ew yekser piştgiriya çûna Mem nake, an ku wek endameke malbatê hestiyar dibe lewma jî bi her awayî temsîla aqilmend nîne.

Xizirê ku di çêbûn û navlêkirina Mem de xwedî rol e, bi heman awayî piştî destpêkirina serpêhatiyê jî erkek girîng tîne cih. Di rê de rastî Mem tê û şîretan lê dike, pêşbîniyên wî ji bo ewlehiya Mem pir sûdewer in. Ew teqez erka mirovê kal ê aqilmend tîne cih. Dirûvê alîkarbûna wî jî dersiruştî ye.

Her wisa ji her sê birayan ê mezin (di teksta R. Lescot de Heslen) di motîvasyona leheng de xwedî rol e û hin fikr û pêşniyarên krîtîk dide leheng. Ew, rola Beglîyê ku li bajarê Mixribê alîkar û şewirmendê Mem ê sereke ye, vê carê li bajarê Cizîrê pêk tîne.

Beglî û Hesên aqilmendên civakî û hişmendî ne, bes Xocaê Xidir û ta radeyekê jî pêşbîniyên keça Beko hêzên giyanî û binhişî temsîl dikin.

Parastvanê Dergehê: Zîna keça Beko û Beko bi xwe, li ber dergehê bajarê Cizîrê, li pey hev Mem pêşwazî dikin. Her du jî hewl didin hin tiştan ji leheng veşêrin, wî ji rêka wî bi dûr bixin an jî bergeha wî veguhezin ber bi hêleke din. Lê Mem bi yekê re li hev tê, û ji astengiya yê din jî difilite û dikeve nav zikê bajêr.

Peyamnêr: Karakterên ku peyamnêriyê dikin agahiya peywîrê didin û pêkhatina guherînekê aşkera dikin. Di destpêka çîrokê de rola ku her sê qîzên Padişahê Periyân, Tavbano, Heyvbano û Stêrbano, dileyizin peyamnêrî ye. Ew peyama felekê ji leheng re radigihînin. Memê Alan li welatê xwe, di nav aramiyê de dijî, ta ku ew perî dibin navinciyan daxwaza gerdûnî û leheng pê agahdar dikin.

Her wisa Sitî û Mîr Şem jî di kontekstên cuda de agahiyên girîng digihînin muxataban. Lê ev peyamnêrî ne wek ragihandina gaziya ji bo serpêhatiyê ye ku di motîvasiyona rojane ya leheng de guherînekê çêdike û giyanê wî şiyar dike. Lewma xwedî fonksiyonek navendî nîne, bêtir fonksiyonek wek timamkirina valahiya navbera bûyeran tîne cih.

Sîber: Sîber dikare azweriyên me yê tarî, çavkaniyên neaşkera, heta taybetmendiyên înkarkirî temsîl bike. Daxwaza Çeko ya parastina heqê xwe yê li ser Zînê wek berteka nêr a li dijî reqîbê xwe dikare bê diyarkirin. Di gel ku her sê bira dilsoziya xwe ji bo Mem diyar dikin jî, piştî demekê Çeko ji sozê xwe poşman dibe û hin astengiyên demborî derdixîne.

Daxwaza Mîr a bi têkberina Mem ku bi rengê nêçîr, tîravêtin û leyîza setrencê nixumandiye, nîşaneyên dijberiya navbera kur û bav dikare bê hesibandin. Arketîpa bav timî di bin tahdeya têkberina ji hêla kur de ye. Daxwaza Mîr a parastina serdestiya xwe bi rêya ceribandînan bi rêya leyîzê xwe dide der. Ew nimûneyên li jor destnîşankirî tev dikarin di çarçoveya arketîpa sîber de bînin nirxandin.

Hîlekar: Hîlekar dixwazin pergala statukoyê ser û bin bibe, û bi gotin û kirinên xwe yê sosret cîhanê dixin nav kaosê. Bekoyê Awan ê ku neyarê sereke yê leheng e û bi rêbazên xapînok statuya Mîr diparêze, wek sazkerê çîroksaziya trajîk derdikeve pêş me. Kesê sereke yê li hember daxwaza xurt a leheng e, lewma jî li hember daxwazên leheng rewşeke tevlihev derdixîne holê. Rola wî û hunera wî ya hîlebaziyê di honaka bûyeran de mezin e. Destpêkê hêj Mem nû hatiye bajarê Cizîrê derdikeve pêş û navê xwe yê rastî jê vedişêre û hewl dide wî bixapîne. Ew erka xwe bi hîleyên têvel û bi awayekî domdar û tijî azwerî tîne cih.

Keça Bekoyê Awan a ku bi remlbaziye ji hatina Mem agahdar dibe û nasnavê xwe jê vedişêre da ku daxwazên pê bide kirin, wek temsîla arketîpa hîlekar dikare bê nîşandan. Lê rola wê ya ku bi niyeta xirabiyê destpê dike, bi encameke baş diqede. Zîna keça Beko dema ku soza zewacê ji Mem distîne vediguhere kesayetek alîkar. Pêşbîniyên wê diguherin ber bi başiyê. Her du hîlekar, bav û keç, ji hêla kirinên xwe ve pêkenok xuya nakin. Bi vî awayî taybetiya hîlekar a pêkenokbûnê temsîl nakin.

ENCAM

Ev xebat, li gel arîşeyên sepandina teorîyê ya li ser berhemên bijartî û diwariyên fikrî ku di pêvajoya xebatê de derketin holê, bi hin encamên berbiçav bi dawî bû. Di vê beşê de em ê encamên ku ji nirxandina her du lehengan a bi peywenda teoriya Campbell derketine holê rayêxin pêş çavan.

Di xebata me de diyar bû ku metnên me di nav konteksta wan de tîpolojiya leheng dahûrandin tev li ser çalakiya leheng ava dibin. Ew deqên navborî bi sazûna şert û mercên ku ji bo serpêhatiya leheng pêwîst in dest pê dikin, bi tevgerên leheng û bandora wan tevgeran a li ser hawirdorê berfireh dibin û axiriyê jî bi encama vê serpêhatiyê bi dawî dibin. Çalakiyên lehengan dibin kêliyên esasî yê çîroksaziyê û çîrokê wêdetir dibin.

Lehengên me, bêyî îstisna, wek destnîşankirina Campbell *ji mal derdikevin, pêk tînin*, bes *vegera ber bi malê* li ber para herduyan nakeve. Ew her sê qonaxên jiyane bi hin kirin û rewşên taybet di şexsê her lehengî de bi çalakiyên xweserê wan û bi encamên têvel tîn dîtin. Rustem di hemû serpêhatiyên xwe de –belkû ya dawî ne tê de– ji mal derdikeve, dike û bi ser dikeve, û vedigere malê. Mem nikare serpêhatiyê timam bike, an jî nake, her wekî lehengên ku vegerê red dikin û li bintara çiyayekê peresto dibin.

Hevdeh qonaxên rêwîtiya leheng a Campbell di serpêhatiya her du lehengan de, ji bilî hin qonaxên kifşe, tîn raçavkirin. Her du leheng destpêkê li cîhana xwe ya edetî tîn pêşkêşkirin. Mem li bajarê Mixribê, û Rustem jî li mala kal û bavê xwe li bajarê Zabilê ye. Di pey vê nasandinê jî qeyrana li pêş lehengan tê destnîşankirin. Mem piştî vê şeva sosret dixwaze terka malbata xwe bike û bikeve pey Zînê; Rustem jî di hemû şaxên destanê de li destpêkê tûşî peywîreke dijwar tê ku redkirina wî ne pêkan e.

Hem Rustem û hem jî Mem bi *gaziya ji bo serpêhatiyê* dest bi rêwîtiyê dikin; di rêwîtiya xwe de ji şexsên li terefê başiyê *alîkariya dersiruştî* werdigirin; ji *dergehê*

yekem derbas dibin û dikevin *zikê nehengê*; di *rêya ceribandinan* re diçin û *rastî xwedawendê* tên; ew *lihevhatina bi bav re pêk tînin*, *peresto* dibin û axiriyê jî *xelata dawîn* –di şexsê Mem de niqaşbar e– bi dest dixin. Bê guman pêkhatina wan tiştên me behs kir bi şikleki lîner naqewime û tê de hin nuans jî hene.

Hem Rustem û hem jî Mem di serpêhatiya xwe de kêr zêde rastî ezmûnên wekhev tên, lewre jî ceribandînan wan dişibin hev. Lê berteka wan a li dijî wan ezmûnan bi hin awayan diguhere. Rustem bi hewldanên xwe yê şexsî, li gel hin alîkariyan jî, ji wan ezmûnan derbas dibe, bes Mem bi yarmetî û destega ji kesên derdora xwe ta radeyekê dimeşe, bes nikare xwe ji dawîya trajîk rizgar bike her ku çavkaniyên alîkariyê tev bêbandor dimînin. Ev yek jî helwesta Mem û kirinên wî ji hêla xasyetên lehengiyê ve dike tiştên gumanbar. Lê bê guman ew wek kesê navendî yê çîrokê ye û li gor çîroksaziyê fonksiyona lehengê çîrokê pêk tîne.

Di analîza Memê Alan de bi berawirdkirina hin xasyetên têkildarî şexsiyeta Mem û dirûvên bûyeran xuya dibe ku fîgurê Mem ê destpêkê bêtir dişibe figureki mîtkî, û ber bi qonaxên navîn û dawiyê jî vediguhere lehengeki gelêrî. Di berhema ku Roger Lescot ji çend varyantan lêkdayî de leheng destpêka çîrokê bi ser navê pêkanîna ezmûna gihîştinê û timamkirina sefera li cîhanê tevdigere. Piştî ku tê nav bajarê Cizîrê vêca pîvanên civaka heyî û nixrê gel bêtir xwe didin xuyakirin. Ji vegotinê atmosferê wisa çêdibe ku her weki bûyer û hemû hemanên nav bajarê Mixribê aîdî paşxaneya çîrokê ya dûr û mîtkî in, û bûyerên li bajarê Cizîrê jî rûdanên rojane ne yê çîrokê ne.

Di gel ku her du lehengên me bi motîvasiyoneke şexsî dest bi serpêhatiyê kiribin jî, taybetiya motîvasiyona wan ji hin hêlan ve cîyawaz e. Wisa diyar e ku Mem bi sedemeke şexsî dest bi rêwîtiyê dike, an ku meseleya wî takekesî ye. Di encama tevgera wan de ew ê jî eşîr û malbata wan jî sûd werbigirin. Tiştê ku Rustem motîve dike gelemperî dixuye. Rustem, her çiqas carinan ji bo rizgarkirina endameki malbatê hewl bide jî, piranî ji bo parastina keyaniyê û li dijî dagirkeriyê şer dike û di encama çalakiya wî de jî keyanî tê rizgarkirin û dagirkeriya biyaniyan bi dawî dibe. Dîsa em veguherîna di kesayetên wan de raçav dikin. Mem bi biryara terkirina malbatê, û Rustemê xort jî bi

biryara çûna ber bi welatên dûr ji şexsiyetên beriyê vediguherin yekî nû û ji dest xwe re dibin figurên navendî yên çîrokê. Biryar û tevgera wan teşe dide hemû rûdanên ku di pey re diqewimin.

Şopa karakterên arketîp ên ku Campbell diyar dike di serpêhatiya her du lehengan de tînin. *Leheng* wek şexsê sereke û navendî yê çîrokê di her sê berhemana de aşkera ye, jixwe ew berhem bi navên lehengên xwe tînin nasîn. Dîsa jî tînin ku taybetî û helwestên lehengan ji hev cuda ne. Di hemû şaxên destana Rustemê Zal de Rustem lehengê navendî ye û serpêhatî tev li dora kirinên wî ye, bes hin kirin û taybetiyên lehengî li kesên bi wî re jî tînin parvekirin. Mem wek leheng xwedî xasyetên hevpar ên keysar/padişah û lehengê gel ê evîndariyê ye.

Di her sê berhemana de jî kesên ku fonksiyona *aqilmend* tînin cih peyde dibin. Aqilmend alîkariyêke siruştî an jî dersiruştî didin leheng da ku karê wî pêk were, lewma jî fonksiyona wan bi heman awayî ye. Bes kesên ku vê fonksiyonê tînin cih diguherin. Aqilmendên Rustem kal û bavên wî ne, û carinan jî pîrejin in, heta di şaxeke destanê de nalbend wek aqilmend/pêşbînîker derdikeve pêş me. Carinan şexsek nav çîrokê tenê ji bo vî karî heye –wek Xizirê nav çîroka Memê Alan– carinan jî karakterek çîrokê vê fonksiyonê jî digire ser milê xwe –wek Hesên û Beglî.

Ji hêla astengiyên ku karakterên beramberî arketîpên sîber û hîlekar derdixin holê jî xalên hevpar hene. Her astengî bi çalakiya astengkeran derdikeve holê û ew jî bê sedem wan astengiyan dernaxin. Ew xwedî sedemên xwe yên fêmar in û bi ser navê armançê tevdigerin. Bekoyê di Memê Alan de li gor xwe pergalekê diparêze; bi ser hesabê xwe xirabiyên dike; û pehlewana, ejderha û dêwên ku li hember Rustem astengiyan çêdikin bi peywîra ku ji hêzên nebaş wergirtî tevdigerin. Her wisa dirûvên astengiyan jî dişibin hev, lewre astengker bi rêya dek û dolaban hewl didin ku leheng bixapînin û armanca wî pûç derxînin.

Rustem piştî ku astengiyên li pêş xwe tev ji holê radike, an dizewice, an zewaca birazî an jî xwarziyên wî çêdibe, an jî welat û keyanî ji nû ve ava dibe ku mirov vê yekê jî dikare bi avabûna malbatekê têkildar bike. Lê rewşa Mem teqez li vê dawiyê bextewar

nayê. Ew nikare bigihîje mirazê xwe û jiyana xwe li gel evîndara xwe dest dide. Lê piştî ku termê wan li ba hev tê veşartin, ew bi awayekî simbolîk digihîjin hev. Çalkirina evîndarên ku nikarin bigihîjin hev wek metaforek di çîrokên wek Pîramûs û Tîzbe, Romeo û Julîet û gelekên din de tê dîtin û bi vê jî dawîya nebaş bi şîroveyeke baş transpoze dibe.

Di encamê de me dît ku teoriya Campbell, a ku yekser derbarê konseptê lehengê mîtê ye, di asta gelemper de pêkan e ku li her du mînakên lehengan bê sebandin. Piştî analîzkirina her du lehengan a bi teoriya Campbell ev yek xuya bû ku serpêhatiya wan lehengan, li derweyê reseniya bûyeran û motîfên lokal, di çarçoveyeke gerdûnî de wek daîreyeke pîvane, dubarebar û domdar pêk tê. Di serpêhatiyên wan de ji cîyawaziyan bêtir manendî balê dikişînin. Jixwe Campbell jî xîmê teoriya xwe li ser vê esasê ava dike, her ku bala xwe dide ser qonax û arketîpên manendî hev û ji wan rêçekê gerdûnî ji bo leheng kifşe dike.

Di rêwîtiya leheng de proseya hebûna mirov di çarçoveya qederek/rasthatinek çarenîn de dest pê dike û di çarçoveya qederek/rasthatinek hevpar de jî diqede. Xuya ye ku Campbell hewl daye nexşeya vê rêwîtiya mirov ku bi awayekî hevpar hatiye xêzkirin rayêxine pêş çavan. Di şexsê her du lehengan de em ji serî ta dawiyê hewldanên navbera rewşên diyar û nediyar temaşe dikin.

Rêwîtiya leheng serpêtiya mirovahiyê ye, û leheng hem bi gewdeyê xwe bi awayekî fîzîkî û hem jî bi giyanê xwe dikeve ser rêya vê serpêhatiyê. Hebûna leheng a fîzîkî wek sembola hişê mirov û azweriya giyanî jî wek sembola binhişê mirov di dawîya vê serpêhatiyê de digihîjin hev. Her du lehengên me jî seranserî serpêhatiyên xwe ji warê hiş ber bi warê binhişê kaş dibin, di nav rêçên diyar û nediyar re, li ser sînorên mirin û jiyane dimeşin, ta ku meşa giyanê wan li dor bazneyê timam dibe.

ÇAVKANÎ

- ADAMSKI, Adam, **Archetypes, collective unconscious and quantum psychology**, NeuroQuantology, September 2011, Vol 9, Issue 3.
- AYDINLU, Seccat, **Firdevsi'nin Şahnamesinde Kürtler**, çev. Erkan Çardakçı, Avesta, İstanbul, 2012.
- CAMPBELL, Joseph, **Hero With A Thousand Faces**, Princeton University Press, 1949.
- CHYET, Michael Lewisohn, **And A Thornbush Sprang Up Between Them: Studies On Mem û Zîn, A Kurdish Romance**, (Volumes I and II, Ph.d dissertation), University of California, Berkeley, 1991.
- CINDÎ, Heciyê, li gel Emînê Evdal, **Folklor Kurmanca**, Avesta, 2008.
- CINDÎ, Heciyê, **Şaxêd Destana Rustemê Zal**, <http://krd.riataza.com/2017/04/16/>
- CIRLOT, J. E., **A Dictionary of Symbols**, Translated from Spanish by JACK SAGE, Routledge & Kegan Paul, 1962.
- DUNDES, Alan, **The Meaning of Folklore**, Utah State University Press, Utah, 2007.
- ELIADE, Mircea, **Cosmos and History**, Harper Torchbooks, New York, 1959.
- JUNG, Carl Gustav, **Dört Arketip**, Metis Yayınları, çev. Zehra Aksu Yılmaz, İstanbul, 2003.
- JUNG, Carl Gustav, **The Archetypes And The Collective Unconscious**, trans. by R. F. C. HULL, Princeton University Press, New York, 1968.
- JOYCE, James, **Finnegans Wake**, published by Faber and Faber, London, 1939, r. 581
- LEEMING, David Adams, **The Voyage of the Hero**, Oxford University Press, New York Oxford, 1998.
- LESCOT, Roger, **Memê Alan**, Weşanxana Orfeus, Stembol, 1996.
- MCCORMICK, Charlie T. And Kim Kennedy, **Folklore, An Encyclopedia of Beliefs, Customs, Tales And Art**, ABC-CLIO, Oxford, 2011.
- MERKUR, Dan, **Psychoanalytic Approaches to Myth**, Routledge, New York & London, 2005.
- MURDOCK, Maureen, **The Heroine's Journey**, Shambhala Publications, Boston & London, 1990.

ÖCEK, Nezir, **Destana Rustemê Zal** (Berhema neçapkirî).

PERTEV, Ramazan, **Edebiyata Kurdî ya Gelêrî**, Avesta, Stembol, 2015.

Oxford English Dictionary, Oxford University Press.

RANK, Otto, **The Myth of the Birth of the Hero**, translated by Drs. F. Robbins and Smith Ely Jelliffe, The Journal of Nervous and Mental Disease Publishing Company, New York, 1914.

RAGLAN, Lord, **The Hero, A Study in Myth, Tradition and Drama**, Vintage Books, New York, 1956.

ROSENBERG, Donna, **Dünya Mitolojisi**, İmge Kitabevi yayınları, 2003.

SEGAL, Robert A., **MYTH A Very Short Introduction**, Oxford University Press, 2004.

VALI, Shahab, **Nêrîneke Giştî li Şahnameya Firdewsî û Şahnameya Kurdî**, ed. Pertev Ramazan, Edebiyata Kurdî ya Gelêrî, Avesta, 2015, Stembol.

VALI, Shahab, **Şahnameya Kurdî 1**, wer. Sevda Orak, Weşanên Avesta, 2017, (li ber çapê ye.)

YARCAN, Dilek “**Joseph Campbell’a göre monomitlerin yapısı**”, Anadolu Aydınlanma Vakfı Yayınları, 1996.(www.anadoluyaydinlanma.org/Yazilar/monomitler.pdf)



T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

**JOSEPH CAMPBELL’İN FİKİRLERİ
ÇERÇEVESİNDE KÜRT KAHRAMANI
TİPOLOJİSİ -Rustemê Zal Ve Memê Alan
Örnekleleriyle-**

Sami ÇELİKTAŞ

14711026

Danışman

Yrd. Doç. Shahab VALİ

Mardin – 2018